

NE JI BO Çapkirinê ye.

**VEGER**

**Shahînê Bekirê Soreklî**

**Shahînê Bekirê Soreklî**, sal 1946 li gundê Mezrê yê li rojavayê bajarê Kobaniyê, bajarekî herêmên bin-xetê li aliyê Sûriyeyê, ji day bû. Li dû kutakirina pola 12emîn li Helebê, 19 salîn ji bo xwendina bilind gihîşt *Viyenayê* û li dû sê salên li Otrîşê û Almaniyayê li bajarê australî *Sydney* bi cîh bû. Li dû kutakirina xwendina bilind bi şehadeyên *Bachelor of Arts/ Diploma of Education* li Zanîngeha *Macquarie* ya li Sydney, 26 salan wek mamoste, perwerdekar û serpereşt ligel wezareta perwerdeyê ya herêma australî NSW di kar de bû.

Ji bilî xebata bi karê wî yê fermî ve girêdayî, her weha di xwendegehên TAFE û yên dawîya hefteyan de bi dayîna dersên zimanên Înglîzî, Almanî û Erebi mijûl bûye. Di heman demê de, bo amancên perwerdeyî, niştimanî û komelî têkoşiyaye û li dû damezirandina 1emîn komaleya kurdî li Australyayê, dora 6 salan serok/sekretêriya komeleyê kiriye. Sal 1982 li Sydney dest bi rêvebirina bernameyeke radyo ya heftane, bi înglîzî û kurdî, kiriye ku nêzikî du salan di Radyoya 2SER FM de domand. Ji sal 1984 ta dawîya nivê sal 2015 berpîrs, amadekar û pêşkêşerê bernameya kurdî ya Dezgeha SBS RADIO bû (*Special Broadcasting Service*).

Wek nivîskar, bi sedan gotarên bi mijarên wêjeyî, siyasî, civatî û perwerdeyî bi zimanên kurdî û înglîzî nivîsandine (çend berhemên bi zimanên Erebi û Almanî jî salên 1980yan hatine weşandin). Ji bilî rojname û kovarên kurdî yên salên 80yan û 90an, ku li Ewropayê dihatin weşandin, gellek berhemên wî di malperên kurdî, Facebookê û şûnên din de hatine weşandin. Her weha çîrok, gotar û helbest ji Înglîzî. Almanî û Erebi wergerandine zimanê Kurdî (Kurmançî).

**Hinek ji berhemên Shahînê Bekirê Soreklî yên wek pirtûk hatine weşandin:**

Hinek ji berhemên Shahînê Bekirê Soreklî

NAMEYEK JI BAVÊ MIN RE – Pexşan û kurteçîrok (128 rûpel): DO, Stenbol, 2009.

VEGER – Roman: Chapa 2yemîn: Na, Izmîr, 2014.

Chapa 1emîn: Yeketiya Nivîskarên Kurd, Duhok, 2006.

WENDABÛN – Roman: Roman: Chapa 2yemîn: Na, Izmîr, 2014. Chapa 1emîn: Enstîtuya Kurdî ya Bonn û Verlag für Kultur und Wissenschaft, Bonn, 1985.

ÇÎROKÊN HEJDEH SALAN - Komeke ji kurteçîrokan (296 rûpel): DOZ, Stenbol, 2005.

PISIK JÎ XEWANAN DIBÎNIN - Komeke ji kurteçîrokan (127 rûpel): LÎS, Diyarbekir, 2004.

NAMÛSA ÊMO - Komeke ji çîrokan (112 rûpel): Haykurd, Stockholm, 1994.

Hinek ji chîrokan dikarin wek kurteroman bihên binavkirin, wek Namûsa Êmo, Azadbûna Mehmet Karataş û hinekên din.

ŞEREF A WENDABÛYÎ YA KATHARINA BLUM – Romana nivîskarê almanî yê navdar Heinrich Böll (139 rûpel) – Wergerandina ji almanî bo kurdî: ŞBS – NÛDEM, Stockholm, 1997.

JANA HEFT SALAN – Helbest (155 rûpel): Enstîtuya Kurdî ya Brukselê, Brûksel, 1990.

Mehkemekirina Selaheddînê Eyûbî - Şano (46 rûpel): Haykurde, Stockholm, 1989.

EM Ê PIRSA ME – Gotar (124 rûpel): Weşanên Celadet Bedirxan, Sydney, 1987.

Nivîsandina destana Dewrêşê Evdî, wekî ku Baqî Xido gotiye, û tomarkirina berhemê li ser DVD: SBS, Sydney, 2004.

Wergerandina komeke ji gotaran, kurteçîrokan û helbestan ji înglizî bo kurdî, ku di kovara NÛDEM, malpera NETKURD û şûnên din de hatine weşandin. Bi sedan gotar, kurteçîrok, helbest û berhemên din, ku di pirtûk, kovar, rojname û malpera cuda de hatine weşandin, bi kurdî, înglizî, erebî û hinekên bi almanî. Di van salên dawîn de gellek nivîsarên wî bi rêya Fêsbûkê hatine wêhandin.

Malper:

[www.facebook.com/shahin.sorekli](http://www.facebook.com/shahin.sorekli)

[www.facebook.com/ShahinBekirSorekli](http://www.facebook.com/ShahinBekirSorekli)

[www.youtube.com/shahinsorekli](http://www.youtube.com/shahinsorekli)

# veger

## Shahînê Bekirê Soreklî

*Ji bo bavê min Mihemed-Elî Bekir Soreklî*

Nivîsandina vê berhemê destpêka salên 90an bi rê ketibû. Kes û bûyerên tê de xeyalî ne.

**Xwedîrol** û navên kesan (Bi pirranî wek hatina wan di berhemê de):

**Melle Boyar** (Kurê Melle Rêşan): Melleyê bajarokê Avdarê, dostê Leheng Axa.

**Leheng Axa**, kurê Kaşan Begê, xwediyê gundê Saranê

**Kaşan Beg**: Kesayetiyêke ku berê li herê mêmê xwedan hêz, nav û deng bû. Bavê Leheng Axa.

**Locan Efendî**: Advokatê Leheng Axa li bajarê Tarê.

Kamoyê kurê Çînoyê Deştî: Ciwanekî bi alîkariya Weqfa Kaşan Begê bo Viyanayê hatibû rêkirin ji bo xwendina li Akadêmiya Mûzîkê. Zoro: Wekîlê Leheng li gund.

**Aramo**: Xwediyê çayxaneya mezin li bajarê Tarê.

Rîso: Garsonê pîr li qatê jorîn yê Çayxaneya Aramo.

**Rasîn** (kurê Şemdînê Remdîlî): Mêvanê herî dawîn ji mêvanên ji şûnên din hatinî, yê li Çayxaneya Aramo bûnî mêvan. Li Amerîka cîhwar e.

**Pîran**: Yek ji heft mêvanan. Bêjerekî berhemê, li Berlînê cîhwar e.

Halo: Yek ji heft mêvanên destpêkê, xortekî dora 25 salîn.

Kadirê Rojperest: Yek ji heft mêvanan.

Bêwar Ramanî: Yek heft ji mêvanan.

Perîşan Pêzan: Yek heft mêvanan.

Ronî Kaşanî: Yek ji heft mêvanan.

Çeçanê Remo: Yek ji heft mêvanan.

Efrîto: Berber û karkerê serşoka di Çayxaneya Aramo de.

Dalo: Şarezayekî ku divabû yek ji mêvanan bûya.

Remo û Zekoyê Hado: Du gundiyên ji Bêçarê.

Egîdê Şekarî ji malbata Şekariyan û Nedoyê Reşbextî ji malbata

Reşbextiyan: Du kesên ji gundê Bêçarê.

Şêx M. Olperestekî li Avdarê.

Şêroyê Mêrgî, Heciyê Kaşî, Arî Efendî û Daroyê Fatê: Çar daniştvanên Avdarê.

**Zêrîn**: Jina Nedoyê Reşbextî yê ji Bêçarê.

Jan Bazirganiyan, Ermeniyekî ji Amerîka, kurê Kêvork Bazirganiyan, yê ku berê xiznedarê Kaşan Begê bûye.

General T. Serleşgerê li Avdarê.

Xelloyê kurê Seydoyê Konreşî: Leşgerê Kurd.

Şanî: Brayekî Leheng.

Melle Rayî: Melleyê bajarê Tarê.

Xezalê: Xwişka leheng ya li Saranê.

**Arîna Xatûn**: Jineke ji bajarekî dûr, dosta Leheng.

**Narê**: Jina ji gundê Sîrikê yê di dest CUMiyan de.

**Serkan:** Serdarê rêxistina TST.

Aşiqul-Axîra: Serdarê CUMiyan.

**Muhelliluzzeman:** Serdarê CUMiyan li dû Aşiqul-Axîra.

Melle Nîdal: Dostekî Muhelliluzzeman.

Sarîn, qîza Zêroyê Çelşanî, jina Dr. Roger.

**Dr Roger:** Pijîşkekî li Tarê, mêrê Sarînê.

**Lorîn:** Xwarzêya Sarînê, qîza Moroyê Medo.

Lewend: Kurê Dr. Roger

Karîn: Jina Moroyê Medo, xwişka Sarînê, diya Lorînê.

Salo: Brayê Moroyê Medo, bavê Segvên.

Fato: Jina Locan efendî, xwişka Sarînê, xaltiya Lorînê.

Berhan: Xwarzêyê Dr Roger, xwendekar.

Parêzger Ihsan, bazirgan Rewanê Warî û brayê îmamê Tarê Şêx

Safî dostên Mamoste Locan li Tarê.

Şîrîn: Dotmama Lorînê, ya ku brayê wê Hîvo jê hez dike.

**Pîrê Zanyar** = Pîremêrê li Baxçeyê Ronahiyê gotarekê pêşkêş dike.

### **Navên şûnan di berhemê de:**

**Tar:** Navê welatê ku berê navê xwe War bû. Her weha navê paytextê wî welatî ye.

**Avdar:** Bajarokê Melle Boyar lê cîhwar e. Gundekî li başûrê bajarê Tarê.

**Saran:** Gundê Leheng Axa, li başûrê rojhilatê Avdarê ye.

Gundê **Bêçarê:** Berê gundekî Kaşan Begê bû. Nuha yê endamên du binemalên hevrik e.

Gundê **Sîrikê:** Gundekî di dest CUMiyan de. Gundê jina bi navê Narê lê dima.

War = Tar

Warê Evînê = Bajarê Tarê.

Bजारokê Avdarê yê bi dora 90 kîlometiran li başûrê paytextê Tarê, bajarê ku bi xwe jî wek Tar dihat binavkirin, di hembêza bêdengiyê de raziya bû. Çawa valahiya yekemîn di asîmanê bi ewran dagirtî de carine rê vedike û asîman hêdî-hêdî çiksayî dibe, dengê keleşêrekî jî serî kişand û perdeya bêdengiyê di beşekê de çirrand. Dirêj nekir qîqîniya dîkên Avdarê, zirrîna keran û ewte-ewta segan li nav hev ketin û bi hev re meqamekî xweristî hanîn holê. Li dû vê mêlodiya dengên lawiran kaline dest pê kirin bikuxin, dayine qîriyan û hey li qîzên xwe kirin ku bila ji xew rabin, olperwerine eşhedeya xwe hilanîn, zarokine bang li hev kirin û dû re dengê melleyê gund jî xwe da bihîstin û rojêke kê-m-zêde wek ya ber xwe di jiyana daniştvanên Avdarê de dest pê kir.

Melle Boyar îroj piçekî dereng mabû û dengê wî, her weha şêweya xwendina azanê, ji rojên par der bû. Pirraniya caran wî, wek bûka di sibehên destpêka zewacê de deng li zêve bike, haydariya gundiyan dikişand ser xwe, ku bila bihên nimêja berbangê bikin. Berê bi dengê nerm dihanî bîra wan ku *“esselatû xeyrun mînennewm”* û dû re gav bi gav dengê xwe bilind û zelaltir dikir, lê îroj bêyî bihîne bîra wan ku *“nimêj ji xewê bêtir bi sûd e,”* rasterast bi dengê qebe dest bi *“Ellahû ekber”* kir.

Tevî ku jimara şênîyê Avdarê di çend salên par de zêde bû bû û ew îroj ji gudekî mezin bêtir wek bajarokekî biçûk dihat ber çavan jî, jimara yên nimêja berbangê dikirin, wek ava rûbara di pêş mizgeftê re derbas dibû, her ku diçû kêmtir dibû. Tenê di salên bêbaran de, yan dema pirrbûna bêtaran, jimara beşdarên nimêja berbangê zêde dibû. Demên weha ne tenê mizgeft tiji dibû, lê li derve jî bi dehan mirov li dû melle rêz dibûn. Rojên ku tê de rewşa xelkê ne weqa perîşan bû mizgeft hema-hema vala dima, û ger ne ji çend firoşkarên hecî bûya, heye ku Melle Boyar nimêja berbangê bi serê xwe bikira. Ji ber vê yekê bû ku hindik dima carine li ber Xwedê bigeriya ku bila rewşa van *“bêîmanan”* piçekî aloz bikira, ne ji ber sedemên olî, yan bi encama nerindiyê, lê bêtir ji ber ku nedixwazt di mizgeftê de bi tenê xwe bima. Zêdebûna xelkê di mizgefta wî de li xweşiya wî dihat û rewş şên dikir.



Ji bo nimêja berbanga îroj deh-duanzdeh kes di mizgeftê de gihîştibûn hev. Ji ber ku Melle dereng mabû nimêjkirina îroj bezatir bi dawî hat û yê di mizgeftê de li dû kutabûna wê ji hev belav bûn, her yek çû karê xwe.

Karê melletiyê ji Melle Rêşan derbas kurê wî Boyar bû bû. Dema malbata wan hatibû Avdarê Boyar zarokekî neh-deh salîn bû. Nuha çel û pênc salîn bû, bi kêmasî ligor karta nasnameyê. Tevî ku Boyarê zaro ji melletiyê hez nedikir jî karê bavê wî li ser wî hatibû ferzkirin. Li van deveran kuran rê û şûnên bavan digirtin. Kurên axayan dibûn axa, yek ji kurên muxtaran dibû muxtar, bi kêmasî kurekî şivanan dibû şivan, yekî sunnetçiyên dibû sunnetçî, û wek rewşa Melle Boyê raber dike, kurekî melleyan jî dibû melle. Gotinê naxwaze ku kurên cotkar û azepan, wan jî di rêyên bavên xwe de didomandin. Bêguman hinan ji wan xwe digîhandin bajaran û li wir dibûn palî û karker. Li bajar û bajarokan çendek ji wan dû re dibûn xwediyên firoşgehan, firoşgehên ku bêhna gundîtiyê ji wan dihat.

Ji bo keçan ne weha bû. Heke wan bixwaztana jî, va yeka ne ji mafên wan bû, ji ber ku rêya wan li dû zewacê diket nav rêya mêrên wan, mêrên ku divabû di rêya bavên xwe de bidomandana. Lê ger day kebanîyeke jêhatî bûya, ji heqê dirûnê, tevnê, teşîrêstinê, bêrîvaniyê, şîvamadekirinê û axaftinê derketa, keçên wê jî, yan pîrraniya wan, bi van şanên “jinên çê” dihatin xemilandin.

Melle Boyar ji peyan ne yekî bed bû. Melleyekî “di riya Xwedê de,” lê ne olperestekî rêhişk, bû. Serên guhdarên xwe bi “zîkr” û “senayên” dirêj nediêşandin, ne jî, li bervaciya mellene din, mirîd li dor xwe dicivandin da ku jê re bibin kole. Wek melleyê gund karê xwe bi cîh dihanî: azan dixwend, pêşiya nimêjê dikişand, çend şîret li dû nimêja îniyê dikirin, di meha remezanê û dema civînên olî de ya mirovî ji melleyekî dipa dikir, mehra yê dizewicîn li hev dibirrî, di kombûna binaxkirina miriyan de beşdar dibû, û her weha. Ew berpîrsê mizgefteke biçûk bû, ku xwediyê Avdarê yê

berê, Kaşan Begê, dema ew hîn gundekî biçûk bû, lêkiribû. Wî çi mûçe ji dewletê nedigirt. Bi diravên zekata hinan, diyariyên bo nivîsandina nivîştan û nexê diyariyên ku xêrxwazan didanê, wî endamên malbata xwe xwedî dikirin. Xwarin di mala wî de her dem hebû. Gundiyar, dema nexweşên xwe ji bo nivîsandina nivîştan, yan ji bo serlêdana pişikê Avdarê, dihanîn mala wî, çend hêk, mirîşkek, ger bihar bûya penêr û mast jî, bi xwe re dihanîn. Melle Boyar bi xwe bi nivîştan ne bawer bû, lê gundî ji wan bi hêvî bûn û ji ber ku yên nexweş baweriyê xwe bi wan dihanîn, hinek ji wan rihet jî dibûn û pesna nivîstên wî didan. Kêm-zêde Melle ji rewşa xwe razî bû, lê dilê wî carine melûl dibû. Sedema vê yekê jî ew bû ku karê wî azadiya wî ya kesayetî bi sînor dikir. Bo nimûne, nikaribû biçûya çayxaneya bajarokî, nikaribû di govendan de rabûya dîlanê, û heta bi jina xwe re be jî divabû wek melleyekî ligel wê bida-bistenda. Çiqa dilê wî dixwazt hema salê carekê bûya jî jinek li pêş çavên xwe şîf-tazî bidîta! Carine meraq dikir ku biçûya sînemeya bajarokî ya servekirî, lê nedibû! Tiştine hebûn ku melleyekî nikaribû bikirana. Quranê, hedîsên pêxemberî, civatê û nîfşên par rola melleyan û rêçikên jiyana wan ji wan re danîbûn. Li ku bûya, heta bi jina xwe Helîmê re jî, divabû ji “usûlê” neçûya der. Ji ber ku nikaribû ji “usûlê” derketa, wî di navbera xwe û dilê xwe de carine lome li jina xwe Helîmê dikirin, kesereke kûr dikişand û xwe bi xwe re digot, “Xweziya li şûna vê Helîmê jineke mine çavvekirî hebûya, jineke ku bizanibûya çawa mêrê xwe, heta ku melle bûya jî, razî û dilşad bikira!” Dizanibû, erf û toreyan rê didanê ku hêwiyekê bihîne ser Helîmê, lê puffe çep û rastê xwe dikir û ew ramana ji serê xwe diavêt, bêtir ji ber şerma ji zarokên xwe. Çar ji keç û lawên wî xwedî zaro bûn û wî fedî dikir yeke ji wan biçûktir bo xwe bikira şûya duyemîn.

Melle Boyar peyakî zimanxweş bû, lê carine bêhna wî li mal teng dibû. Di demên weha de wek kesekî titiz û bêhteng xuya dikir. Dermanê vê bêhtengiya wî li nik Helîmê bû, lê bêyî ku jê haydar be. Ma rebenê bi tiştên weha çi dizanibû! Ew jî wek diya neh zaroyan, jê bêtir wek jina melleyekî, bi rola xelkê jê dipa radibû, wek jineke “kamil.” Di kûraniya xewn û xeyalan de jî nedihat pêş çavên wê ku sedema bêdengmayîn û titizbûna mêrê wê bi têkiliya

ligel wê ve peywendîgir bû. Li milê din, Helîmê weha dizanibû ku mêrê wê êdî mirovekî kal bû. Bivêt-nevêt salên wî li jor çelî bûn! Ew li odeyên cuda radizan, mala wan ji mêvanan vala nedibû û keç û lawine wan, yên bi wan re, êdî berbext bûn. Ger wê tew bixwazta jî çi fersendên ji bo tevrazanê di mala wan de hema-hema nebûn. Her çar-pênc hefteyan carê wê di nîvê şevê de xwe bi tirs û lez dixuşand bin lihêfa mêrê xwe, hema tev kirês û sergirtî; û dû re bi tirs û lezeke ji yên hatinê bêtir xwe ji şelta wî digîhand ya xwe. Dilê mêrê wê dixwazt jê re bigota, “Malavayê, weqa dereng memîne;” yan ji wê re aşkere bikira ku bila xwe ber hatinê bişušta, berî têketina bin lihêfê kincên xwe ji xwe danîna,... lê rûyê wî nedigirt.

Wek jineke gundî ya dema xwe, zanîna Helîmê derbarê têkiliyên giyanî de bi sînor bû û wek jina melleyekî wê wisa dizanibû ku razana jin û mêr bi hev re ji bo hanîna zaroyan bû, ligor daxwaza Xwedê û sunneta pêxemberî. Haya wê bi carekê ve ji wê yekê nebû ku têkiliya giyanî peywendî bi “lezzetêke bedenî” û heta bi rewşa derûnî ya mirovan re hebû û dikaribû bandor li xusetê wan yê rojane bikira. Ew bi temenê şanzdeh salî bû bû bûk. Di rojên destpêka zewacê de têkiliya giyanî bi mêr re li xweşiya wê nedihat, bêtir diêşiya. Li dû zaroyê duyem carine li xweşiya wê diçû, bi taybetî dema mala wan ji mêvanan vala bû, lê pirraniya caran mêrê wê tenê li keyfa xwe dinihêrî û hesabê hevala xwe nedikir. Wê jî şerm dikir, yan ditirsiya, xwe wek “jineke bi şehwet” xuya bikira. Li dû neh zaroyan, ger em duyên mirinî nexin jimarê, bi derbasbûna demê re meraqa wê li tevrazanê melûltir bû.

Di nav keç û jinên gundî yên li mala wan dibûn mêvan de hinekên pîrr çeleng hebûn. Dîtina wan gellekî li xweşiya Melle Boyarî dihat, lê ew mirovekî fedok bû, çavên wî li pêş jinên ciwan hema-hema venedibûn. Jê bêtir, ew di rûniştin û rabûna xwe de kesekî gundî bû, rêza wî ji toreyên eşîriyê re hebû û divabû ligor hêviya xelkê jê dikir û rola xwe gavan rane. Carine di beşekî dilê wî de meraqeke germ dikeliya û hindik dima hema piçekî ji “usûlê” bi dûr keta, lê îcar jî tirsê rê lê digirt. Baş dizanibû ku kiryareke ji “usûlê” der, ger di nav xelkê de bêhn bida, dê ne tenê ew şermezar bikira, lê heye

ku tew bêtarên mezin bi ser wî, malbata wî û eşîra wî de bibarandana. Vê ramanê dilê wî dilerizand û ew dibizdand.

Melle ji xwe hez dikir. Kincên wî her pak bûn, rîhên wî ji beşê jorîn yê tiliyekê dirêjtir nedibûn û wî rojê du caran gulav bi ser xwe de direşand. Tevî ku hema-hema tevahiya şênîyê Avdarê û xelkê gundên dorhêlê dinasîn jî, dostên wî dikaribûn bi tiliyên destekî bihatana jimartin. Wî ji gundiyan hez dikir, lê di navbera xwe û wan de perdeyek dihîşt. Navbera wî û şênîyê Avdarê baş bû, lê bû bûn çend heyv ku bala wî mijûl bû. Li beşekî bajarokî şêxekî xwedan terîqet bi cîh bû bû. Dihat gotin ku di beşekî mala wî de ta nivê şevê “zîkrê” cîh digirt.

Ligor hinan, Şêxî Melle wek mirovekî “ne rast di riya Xwedê de” bi nav dikir. Melle hewl dida xwe neêşîne û ji şêx nefretê neke, lê nedikaribû. Bi devekî kenok ji dostên xwe re digot, bila ew bi xirabî behsa Şêx nekin. “Nemîme li xweşiya Xwedê naçe,” digot, lê bi xwe jî baş dizanibû ku ne Şêx ji wî hez dikir, ne jî wî ji Şêx. Ew ji bo vê hestê di dilê xwe de ji xwe ne razî bû, lê ji dest nedihat xwe jê azad bikira.

Melle Boyar mirovekî zanistîyar bû û gellek pirtûkên kevn xwendibûn, her weha xwe bi xwendina rojname û kovaran ve mijûl dikir, lê ji bo xatirê rola melletiyê û dûzanên civatê ew li gellek raman û baweriyên xwe xwedî dernediket, ew ji xelkê re aşkere nedikirin. Di kûraniya hebûna wî de kesayetiyeke serbixwe hebû, kesayetiyeke veşartî ku tenê haya hevalemî wî jê hebû. Bi va kesayetiya xwe ya veşartî ew di kûraniya şevan de, di xewn û xeyalên xwe de, li hemî beşên cîhanê digeriya. Di meyxanyan de bi filosofan re diket gotûbêjê, di baxçeyên bajarên de bi jinên bedew re derdiket seyranan, di civînên ramyarî û siyasî de beşdar dibû û di govendan de radibû dîlanê.

Çakmêrekî dilpak û mebestirind bû Melle. Ji bo xatirê razîkirina yên din û xizmeta ji civata xwe re, wekî ku jê dihat hêvîkirin, wî berjewendiya xwe ya şexsî xistibû gorê û bi kesayetiya melleyê civateke gundî ya bi erf û toreyên eşîrî bawer bi rola xwe radibû.

Heke ne ji fidakariya wî û qurbankirina hestên ezoyî bûya, dê ji mêj ve ne tenê mizgeft, lê her weha Helîm û zarokan jî, li dû xwe hîştibûna û berê xwe dabûya deriyekî din ji deriyên cîhana fireh û balkêş. Heye ku bi encama vê dilpakiya wî bû ku Xwedê li rûyê wî niherî bû û deriyekî nû di jiyana wî de vekiribû. Bi encama vebûna deriyê nû Melle Boyar salê carekê, du caran, yan tew sê caran, fersend bi dest dixist ku bi kesayetiyeke ji ya melletiyê der têteta cîhaneke ji ya bajarokê xwe firehtir û rengîntir. Rola melletiyê dida kurê xwe yê mezin û bi dirêjîya hefteyekê, du hefteyan, û carine tew zêdetir, wenda dibû. Li dû vebûna vî deriyî, jiyana Melle Boyarî bi gellek şeweyan hat guhertin. Bo nimûne, nema êdî bêhteng û titiz dibû. Bi Helîmê re rengêkî ji hevaliya du evîndaran bi rê xist, jê re pêkenok digotin, û ger fersend hebûya dest diavêtê û ew radimûsa. Li dû va guhertina ketî nav kesayetiya wî, şeweya peywendiya giyanî jî di navbera wî û Helîmê de hat guhertin. Wî xelekine sindifa “usûlê” di hinek beşan de şkandin. Hêdî-hêdî va wêrekiya li xweşiya jina wî jî hat. Wê fersend bi dest dixistin û hefteyê bi kêmasî carekê xwe digîhandê; tew ber biçûya nav nivînên wî xwe dişuşt, porê xwe şeh dikir û gulav bi ser de direşand, û ger ne zivistan bûya ber têteta nav nivînan carine xwe şilf-tazî dikir, tevî ku ji ber vê kiryara xwe ve car-caran şerm dikir jî. Şeweya peywendiyên Melleyî ligel kesên din jî hat guhertin. Wek mînak, navbera wî û Şêx weqa baş bû ku ew bûn dost û dest pê kirin biçin malên hev. Di wan demên ku ew ji gund diçû der de, ber biçê ji Şêx re pêşniyaz dikir ku bila tev mirîdên xwe nimêja îniyê di mizgefta wî de bikirana û li kurê xwe tenbe dikir ku bila beşdaran li dû Şêx nimêj bikirana, ger hat.

Gundê Saranê, yekî ji wan gundên bi tenê xwe li aliyekî mayî, bi dora 60 kîlometiran li başûrê rojhilatê Avdarê bû. Ew yê Leheng Axa bû. Bavê wî Kaşan Beg di dema xwe de li vê deverê yek ji serdarên herî navdar û xwedan hêz bû. Li dû mirina wî kurên wî “bêxêr û bêtevêdêr derketin.” Heye ku guhertina demê û rewşê jî rola xwe leyztibin. Wan gundên bavê xwe, Saran ne tê de, yek li dû yekî firotin û çûn li bajarekî dûr û mezin bi cîh bûn. Leheng ciwantiyê kurên Kaşan Begê bû, va gunda bû bû para wî û li ser navê wî hatibû tapîkirin. Dema ciwaniya xwe ew bi pirranî ligel brayên xwe dima û dû re brayan ew ji bo xwendinê rêkiribûn bajarekî ewropayî, lê Leheng xwendin bi serî nekir û li dû çend salan li Saranê vegeya. Ew ne tenê bi encama sernekevîna di xwendinê de vegeya, lê her weha çimkî baş dizanibû heke venegere ew ê jî wek brayên xwe û gellek kesên wek wan wenda bibe. Wisa bawer bû ku bajarên mezin mirov dadiqulandin, kesayetiya wan diguherand û ew dikirin beşekî biçûk ji melaxmeyêke mezin û tevlihev. Wî nedixwazt bibe beşekî ji wê melaxmeyê; dixwazt mirovekî serbixwe û bijarte be, bi bapîrên xwe serbilind be, di nav xelkê xwe de karekî bi sûd bike û bibe xwediye şûneke weha ku bi encamê endamên civatê xwedî lê derkevin. Li dû vegeya li gund destpêk ne hêsan bû, lê hêdî-hêdî xwe fêrî jiyana nû kir. Rojên zarokiya xwe ji xwe re kirin hîm û li ser wî hîmî jiyana xwe ya nû bi rê xist, lê di heman demê de têgihîştina ji xwendinê û ji tecrûbeyên mayîna li derve bi kar hanîn. Leheng ne tenê rewşa tenduristî ya gundiyan ji berê çêtir kir, lê her weha rewşa wan ya aborî bi pêş ve xist. Maf da her cotkarekî ku dora hêktarek erd ji bo zexîreya malbata xwe bi kar bihîne. Di salên barankêm de, li milê din, tenê bi qasî tova hatî çandin ji berhema zeviyan dibir.

Leheng Axa, li bervaciya axane din, ne mirovekî rikxwaz û dilreş bû. Ew aştîhej bû û ji hevrikiyê hej nedikir. Tenê hin babetên mirovan li xweşiya wî nedihatîn: kesên derewîn, kesên diz û yên xasûk û mebestbed. Tevî ku ji wan hej nedikir jî, neyariya wan jî nedixwazt. Tenê dixwazt ne ligel wan bide, ne bistîne. Carekê gundiyeke du mîhên wî firotibûn û gotibû ku guran ew xwarine. Leheng jê re gotibû, “Bila mîh hemî yên te bin, û bila mewsim aîsal

jî bi tevahî ya te be, lê li dû mewsimê tu dê ji nav me bar bikî. Şûna dizan di nav me de tune.” Li dû vê bûyerê wî bang li hemî gundiyan kiribû û gotibû wan, “Diziyê ji min mekin, brano, wekî ku ez diziyê ji we nakim. Heke xêr û bêra zeviyan be, yan ya heywanan be, nivê wan ji we re, nivê din ji min re. Ez ê beşekî ji para xwe ji bo baştirkirina rewşa me gişkan û armancine din bi kar wînim. Heke we hewcedarî bi tiştêkî hebû ji min re bibêjin û aşkere bibin, ne bi dizî.” Jê pê ve, wî çend gundiyan temenmezin û maqûl wek endamên komeke şêwrê bijartibûn, da ku bi rêya wan gelşên li gund dihatinî holê bihatana çareserkerin. Salekê li dû girtina vê biryarê pejirand ku ji sedî 60ê xêr û bêra zeviyan û lawiran bibe ya gundiyan, li şûna 50%. Axayên herêmê ji van şêwe biryar û kiryarên wî ne razî bûn û heta hinan ji wan li nik brayên wî gazincên xwe kiribûn û duduyan li cem dewletê jî lê gilf kiribûn. Li milê din, çend gundiyan ku tenê fêrî tirsê ji axayan bû bûn va aliyê erênî di wî de wek aliyekî nerênî didftin, yan wek şaneke bêhêzbûnê. Vayên dawî ew bizava dikirin ku jê bidizin, yan ûda wî giran nedigirtin, lê Leheng kesên weha zû dinasîn û dizanibû ku bicihkirina guhertinê di nav hinek erf û toreyên civatê de ne hêsan bû, ku ji bo bidestxistina amancên baş û bilind carine dayîna nerxekî divabû. Bi derbasbûna demê re gundiyan bi pirranî jê hej kirin û jê razî bûn. Ew bi tevahiya xwe bîst malbat bûn û hemî zevî û lawirên Leheng Axa di dest wan de bûn. Bêtir ji nivê wan li vî gundî ji day bû bûn û lê mezin bû bûn. Bavên wan ji Kaşan Begê ditirsîyan, mayîn û nemana wan di dest wî de bûn, lê rewşa îroj ne ya duhinî bû û Leheng Axa ne Kaşan Beg bû. Dîsa jî hinekan ji gundiyan, bi taybetî yên temenmezin, carine digotin, “Ka Kaşan Beg, ka Leheng! Ciwanmêrekî baş e, lê sedên wek wî jî nikarin şûna bavê wî tiji bikin!”

Lehengî bi alîkariya hinek bazirganan û dostên xwe weqfeke bi navê Weqfa Kaşan Begê ber çend salan damezirandibû. Çend dewlemendên herêmê û kesine oldar sal bi sal zekata xwe didan weqfa ku advokatê wî yê li Tarê, Locan Efendî, serpereştîya wê dikir. Lehengî bi xwe di salên bi xêr û bêr de beşekî ne biçûk ji pereyên firotina mewsimê pêşkêşe vê weqfê dikirin. Ta nuha weqfê alîkariya gellek jinebiyan û belengazan kiribû, nexweşîne

hejar şandibûn nexweşxaneyan û Kamoyê kurê Çînoyê Deştî rêkiribû Ewropayê. Kamo ji çar salan û vir ve li Viyena di Akadêmiya Mûzîkê de dixwend. Lehengî gellekî ji vî xortî hej dikir, ciwanekî ku bi radeyeke bilind xwendina navend li Tarê bi dawî hanîbû. Ber dest ji welêt berde navê wî wek tenbûrvanekî zîrek û stranbêjekî dengxweş belav bû bû. Ligel ku bavê wî û gellek meriyên wan ji vê yekê ne razî bûn jî, her ku fersend diket dest wî bi dengê xwe û tenbûra xwe gellek ciwan dilşad dikirin. Lehengî va yeka baş di çav xwe re kiribû û lewma pêşniyaz kiribû ku weqfa wan wî bişîne Ewropayê, da ku di akadêmiya Viyena ya navdar de hunera mûzîkê, bi taybetî hunera bikarhanîna kemencê, bixwenda.

Xaniyê Leheng Axa li ser girê gund bû. Tevî ku xaniyekî duqatî bû jî binavkirina wî wek koşk, yan qonax, ne di cîh de bû. Qatê li jêr ji odeya mêvanan û dîwana rûniştinê pêk dihat. Li qatê jorîn du ode hebûn. Yek ji wan pirtûkxane û ofîsa Lehengî bû û ya din odeya razanê bû.

Leheng sîh salîn bû, bêyî jin û zaro bû. Xwîşkeke wî, Xezalê, ya ku wek jineke ciwan bî mabû kebanîya malê bû. Brayê wê ji wê û herdu zarokên wê re maxek li teniştaya xaniyê xwe lêkiribû.

Ji du salan û vir ve Leheng Axa karbidestiya gund bi pirranî di dest wekîlê xwe, mirovekî bi navê Zoro, de berda bû. Ew bi xwe carine bi hefteyan wenda dibû, kesekî nedizanibû li ku ye. Salê sê-çar caran hevaline yan merîne wî lê dibûn mêvan û carine kesine ji derve jî dihatin serîlêdana wî. Di van demên dawîn de Melleyê Avdarê Boyar jî carine dihat cem, yan ew bi ser wî diket û herdu bi çîpê diçûn şûnên din.

Lehengî vê hefteyê dîsa xwe ji bo rêwîtiyekê amade dikir, lê ji ber cîhgirtina daweta kurê xalekî xwe neçar ma wê bi paş ve bixe. Ew ê di berbanga roja îniyê de bi ser Melle keta û ew ê bi hev re biçûna bajarê Tarê.



Kolanên bajarê Tarê bi xelkê mişt bûn. Wek mûriyên berên xwe dabin mûristanekê mirov di sibeha vê roja çarşemê de ber bi navenda bajêr ve diçûn. Otomobîlên ji şatmanên xwe dûyê şewitandina mazot û benzîna ji radeya arzan puff dikirinî derve hêdî-hêdî di nav mirovan de diliviyân. Kêmbûna keç û jinan li navenda bajêr xuya dikir ku civata bajêr yeke wisa bû ku şûna jinan tê de bêtir li paş deriyân bû. Tenê tek û tûk jin û keç, pîrraniya wan bi sê-çar gavan li paş peyan, di kolana navenda bajêr de dimeşiyân. Heta carine mirov jineke berbexte li dû lawekî dehdanzdeh salî di rê de didît. Dengên firoşkaran û yê tûtîkên corbîcor li nav hev diketin û di nav bêhna dûyê motorên otomobîlan û toza xweliya di vê germa destpêka payîzê de wek podreyê bûyî de diheliyân. Li kolana serek ya navenda bajêr deng û bêhnên din jî hebûn ku diketin nav yê ji xwe bi hêztir û wek rûbarên di nav çemên ji xwe mezintir de wenda bibin diheliyân: dengên kesên ligel hev diaxaftinî, yê zarokên dewfiroş, ewte-ewta çend segên bi çerm û hestî manî; bêhna ji birajtina kebaba cîger, dil û kezabên mîh, bizin û gayan dihatî; hilma mîza nêrmirovan bi koşeyên tarî de reşandî, . . . Meqamê dangan di nav melaxmeya bêhnên navenda bajêr de domand ta ku azana nimêja nîvro sînor xist navbera herdu beşên rojê û meqamê danê dû nîvro dest pê kir.

Li beşekî navenda bajêr otobûsa ji paytextê dewletê dihatî rawestiya, bîst û yek kes, ji wan çar jin û sê zaro, jê daketin. Yek ji wan bîst û yekan peyakî bejnziravî xweşik bû. Şêweya meşa wî, kincên lê û du çenteyên bi wî re aşkere dikirin ku rewşenbîr bû, heye ku rewşenbîrekî li derve dimayî. Li dû daketina ji otobûsê ew bîstekê rawestiya, wekî ku çaverê dikir kesek hatibe pêrgîna wî, lê dû re, çenteyê biçûk di destê çepê û yê mezin di yê rastê de, ji meydana otobûsan berî da kolana serek ya navenda bajêr. Li

navenda bajêr dageriya çayxaneyeye li ser piyê çepê, ket hindir, li pêş, çep û rastê xwe niherî, wek mirovekî li kesekî bigere, yan hêvî bike ku kesek ê wî binase. Dû re li maseyê vala geriya û dema nedî zivirî da ku biçê der. Li derketinê yekî ji paş ve bi milê wî yê çepê girt û ew veciniqand.

- Roj baş Mamoste. Çima wa zû piştê xwe didiye me? Yê di Çayxana Aramo keve, qe nebe dê çayekê vexwe.
- Min dixwest bi serê xwe danîşim, lê maşallah çayxane mişt e...
- Va aliye çayxaneyê ji bo nasan e û pîrrianiya wan gundiyan li bajêr in, yan bajariyan gundî ne. Di çayxaneya min de şûnên ji bo her kesî munasib hene. Ji bo birêzên rewşenbîr û ronakbîrên li dû demeke dirêj li welêt vedigerin jî şûneke layiqe wan li jor e. Ji mêvanên ji derve tèn pê ve tenê kesên di nav civata me de bijarte li wir rûdinin.

Peyayê ciwan mat ma çawa xwediyê çayxaneyê dizanibû ku ew bi salan ji welêt dûr maye. Mîna ku fedîkar derketibe xwazt bide zanîn çima wî baştir didît bi serê xwe danîşe, lê ji dest nehat. Ragîhandina mebesta wî bi gotina du, sê, yan çar hevokan ne pêkan bû. Sedemên derûnî hebûn ku rehên wan dikişyan rojên zarokiya wî, egerên giyanî hebûn ku bi westabûna li dû rêwitiyê dirêj ve girêdayî bûn û yên din, wek tîrsa ku yên bi wî re danîştinî dest pê bikin baraneke ji pîrsên tevlihev û cihêreng ji xwe bibarînin.

- Bibexşîn, naxwazim tu min şaş fêhm bikî,... got yê rêwî; lê xwediyê çayxaneyê axaftina wî birrî û got:
- Na Mamosteyê qedirbilind, tu min af bike. Tu mêvan î, ez mazûvan. Karê me ew e ku em rihetiya mêvanan misoger bikin. Ez di warê xizmetkariya mêvanan de ji heq derdikevim. Carê ketiye nav xwîna min. Kalikê min

aşpêjê Serdarê hêzeke dewletê bû, bavê min qehweciyê Kaşan Begê navdar bû û ez jî îroj bi saya wan xwediye Çayxaneyê Aramo me ku di bajêr de ya herî mezin û navdar e. De fermo.

Bi bihîstina navê Kaşan Begê re peyayê mêvan serê xwe piçekî bi jor ve hilda, bi çavên xwediye çayxaneyê ve niherî û xwazt tişteki bibêje, lê bêdeng ma.

Xwediye çayxaneyê, peyaki lihevhatîyî bi simbêlên qalinde dirêje lihevbadayî, çenteyê mêvên yê mezin di destekî de, ber bi deriyekî li aliyê din yê çayxaneyê ve meşiya. Mêvên, dudil û bêyî ku ji va kiryara mazûvên bi tevahî razî be, da dû. Li paş dêrî mazûvan dageriya aliyê çepê, çente li quncêki bi cîh kir û dest pê kir bi nêrdewanan rabe jor. Ji ber ku çî pencere yan çirayeke vêketî nebûn, mirov bi dijwarî pêş xwe didît, ew jî bi saya ronahiya ji dêrî re xwe digîhandî wir. Bi gihîştina qatê jor re xwediye çayxaneyê dest avêt dugmeyeke bi dîwêr de û li zêngil xist. Bi lêxistina zêngil re lampayek li jor vêket û dû re peyaki porspî û ciwanekî ku simbêlan hîn nû xwe raber dikirin hatin pêrgîna wan. Yê ciwan kir ku çenteyê reş yê di dest mêvên de ji ber wî ve rake, lê mêvên bi şaneke ji destê din weha raber kir ku qayil nabe. Yê porspî şûşeyeke biçûk ji beriya xwe derxist, ava wê ya bêhnxweş bi ser kefên destên mêvên de reşand, û li dû ku xwediye çayxaneyê çend peyv di guhekî wî de hanîn ser zimên, dîsa bi germî pêşwazî li mêvên kir, destê xwe yê rastê ji xwe wê de livand û pêş ve çû. Ber mêvan bi rê keve xwediye çayxaneyê destekî xwe bi şêweyê sivik û dostane çend caran li piştê wî xist û gotê:

- Rîso di xizmeta te de ye. Ew ê hemî daxwazên te bi cîh wîne. Em ê dû re hev bibînin.

Li nivê nêrdewanan xwediye çayxaneyê paş ve zivirî û bi gavên beza xwe dîsa gîhand jor. Devê xwe nêzike guhê aliyê rastê yê mêvên kir û bi dizî gotê:

- Mamoste Rasîn, bibexîn ez natim pêrgîna te! Min texmîn dikir tu ê bi otobûsa danê êvarê werî. Meraq meke. Leheng Axa roja îniyê tê.

Wî va gotina xwe kir û bêyî mayîna li benda gotineke ji mêvanê xwe dîsa zû ber bi nêrdewanan ve çû û daket jêr.

Mêvên xwazt tişteki bibêje, lê çi gotinên ji bo mebesta xwe lêhatî nedîtîn. Hema destekî xwe bi jor ve hilda, wekî ku bibêje spas, û dema dît xwediyê çayxaneyê jî li benda çi gotinan nema da dû Rîso, yê ku li dû meşeke dora deh gavan deriyekî din vekir û devbiken ji mêvên tika kir, bila derbas hindir bibe.

Di salona mezin ya bi lampayan hatî rohnkirin de bêtir ji sed maseyan hebûn, lê tenê şeş kes, her yek bi tenê xwe, li beşekî wê daniştibûn. Maseyên wan bi babetên xwarin û vexwarinê dagirtî bûn. Li dû bicîhkirina mêvên li paş maseyekê Rîso çû barê û tev piyaleke tiji ava mango û du lîsteyan, yeke soravîn û yeke gewravîn, li maseya mêvanê nû vegeya.

- Fermo birêz Rastîn, ji kerema xwe li van lîsteyan binêr, ka dilê te ji bo xwarin û vexwarinê çi dixwaze. Ez ê li dû pênc deqeyan vegeyrim.

Mêvên, matmayî, serê xwe li garson zivirand û bêhemdê xwe gotê:

- Navê min Rasîn e, ne Rastîn. Lê tu ji ku ve navê min dizanî!
- Milên hoste Aramo dirêj in, Rasîn Efedî.

Rêsîn bîstekê wisa texmîn kir ku rewşa ew tê de yeke xewnên şevan e. Berê kesekî li vî warî heta bi navê “mango” be jî nebihîstibû! Yê li dora wî daniştinî bi xwarin û vexwarina xwe ve mijûl bûn yan cigareyên xwe dikişandin û di kûnên çavan re li hev û din mêze dikirin.

Lîsteya babetên xwarinê, ku Rêsin ber ya babetên vexwarinê rakir, ew car din mat hîşt. Wî çî caran di xewnan de jî texmîn nekiribû ku li Tarê xwaringeheke bi ewqas babetên xwarinê hebûya. Tevî ku ew li gellek welatan geriyabû û hejmareke ne biçûk ji babetên xwarinê dinasîn jî, wî navên bêtir ji nivê van xwarinên di lîsteyê de çî caran nedîtibûn, ne jî bihîstibûn. Jê bêtir: navine babetên xwarinê weqa balkêş bûn ku hema-hema wek xeyalî dihatin ber çavan, navên wek Qeyxaneya Mûrîhêkan, Cewrikgoştê Simaqî, Şorbeya Mêjiyê Meymûnan, Goştê Marên Avî bi Pîvokên Kelandî re, Goştê Xezalan bi Kerengên Qewirandî re, Sîcuqên di Xwîna Hespan de Kelandî Tev Pîvazên Herêmî, Bastirmeyên Kerên Arnawûtî û Mastê Mihên belek,...

Bi gihîştina Rîso re, bêyî li lîsteyan binihêre û bêyî çî şopên matmayînê raber bike, Rêsin got:

- Zehmet nebe ji min re berê şorbeya mêt wîne û dû wê Hêkên Rûsî. Wek beşê dawîn ji min re *Şnîtsilê* Viyena wîne. Bila baş hatibe qewirandin. Ji bo dûxwarinê ez ê dû re biryarê bigirim.
- Hûn ê çî vexwin, ezbenî?

Meya sor, *Lambrusco Rosso*, yan *Mateus Rosè*. Bawer dikim herdu jî di lîsteya we de hene.

Bayê honik yê ji perwaneyên li jor difertilîn dihatî, ava mango ya sar, hilma titûna cigareya LM û dengê mûzîka xweş ji meqamê bi navê Şehrezad xemgîniya di dilê Rêsin de bi ber bê xistin û li şûna wê bextewerî bi cîh kirin.

Ji Rêsin wê de mêvanekî ku bi balkêşî li wî dinihêrî daniştibû. Em li vir rê bidinê bila xwe bi xwendevanên vê berhemê bide nasîn:

“Navê min Pîran e. Ez yek ji mêvanên beşê jorîn yê Çayxaneya Aramo me. Mêvanê berî kurtedemekê ketî hindir hejmara me mêvanan dîsa gîhand heftan. Çar rojan berê çî hat serên me dê were serê wî jî, lê wî hîn hay jê niye. Rîso a nuha Hêkên Rûsî ji wî

re dibêye. Mêvanê nû pê nizane ku berî Rîso tişteki bibe ser maseya mêvanekî, wî tiştî berê raberî mêvanên din dike, yekoyeko di ber maseyên wan re derbas dibe û destê xwe dadixe da ku xwarina, yan vexwarina, di dest de baş bixewine. Li vir her tişt weha ye. Haya her kesî ji her kesî heye. Di ferhenga zimanê Tarê de peyveke ku xwebêja peyva înglizî “*privacy*” bide tune. Mirov nikare bi serê xwe tişteki bike, bêyî ku yê din tiliyên xwe nexinê yan xwe wek eleqedar raber nekin.

“Li mêvanê nû neheqî bû, yan em bibêjin wî şaşî kir. Yê were Tarê divêt xwarina herêmi bixwe. Çiqa xelkê Tarê bi xwe meraqê li tiştên ji derve bikin jî, ew ji kesên ji derve tîn wê yekê dipên ku li vir tiştên ji Tarê, yan bi kêmasî herêmi, bibijêrin û ligor erfên deverê gavan ranin. Rîso hewl da min jî bixapîne, lê bi ya wî nebû. Min ew lîsteyên wî dîtin û ez keniyam, ez ji kenan lal bûm. Min got garsonê zimanxweş: ‘Lo Rîso, lo Rîso, ma ez ji bo xwarina mûriyan hatim Tarê, malava?’

“Rîso di bin simbêlan de keniya û pirsî: “Dilê te çi dixwaze, Pîran Efendî?” Min xwe li wê yekê nekir xwedî ku min navê xwe bihîst. Min hema gotê, ‘Zehmet nebe ji min re xwarineke Tarê wîne, wek babetekî kebabê yan tirşikekê. Bila nan bi xwarinê re pirr be, û dewê sar.’ Rîso careke din di bin simbêlên xwe yê spî re keniya, lê ez nekeniyam.

“Dema serîlêdana Tarê divêt mirov baş haydar be. Ne tenê ji polîs û mamûrên dewletê miqayitî pêwîst e, lê ji her kes û komê. Yê wek min û mêvanê nû hatî li vir wek nîvbiyanî ne. Ne tenê ev, li Tarê hinek kes û kom wê bizavê dikin ku nîvbiyaniyan ji hemî aliyan ve bidoşin, û eger ew di yê ji derve hatî de çi şûnên dotinê nebînin, heye ku hewl bidin bi guvaştina beşekî giyanê wî tişteki jê derînin, yan wî bi pêlêkirina hestan biêşînin.”

“Berê danîştvanên Tarê ne weha bûn, lê diyar e ku bi kêmasî hinek ji wan ji mamûr û polîsan, heye ku ji aliyên siyasî jî, fêrî gellek sinçiyên nû bûne, ku berê di şexsiyeta wan de nebûn. Ji aliyekî din ve, xelkê Tarê wisa bawer e ku yê xwe ji Tarê bigihîne welatekî

biyanî, dê di nav şev û rojekê de dibe pêzan yan dewlemend, yan jî dê bi kêmasî ji berê zîrektir û jêhatîtir bibe. Loma hêviya wan ji tariyên derveyî pîrr mezin e. Heye ku bi encama vê jêhêvîkirina mezin be ku ewên ji derve dihatin û ligor ku mirovê tarî ji wan dipa xwe îspat nedikirin dihatin biçûkkirin. Lê em vê yekê li şûn bihêlin û hêvî bikin ku dawiya vê serfêdanê bi xêr be.”

#### 4

Pêşxwarina bi navê “Hêkên Rûsî” ne ligor hêviya Rêsin bû û ta’ma wê ne wek ya xwarina bi heman navî bû ku wî demekê, çaxa li Viyena xwendekar bû, dixwar, lê ji ber ku birçî bû wî piçek jê xwar. Li dû kurtedemekê Rîso *şnîtsil* û piyaleke tiji meya sor li ser maseya wî bi cîh kirin. Rêsin serê xwe çep û rast hejand û got:

– Birêz Rîso, bawer nakim ev xwarina min xwaztibe! Û çawa dibe ku te bûz xistiye nav meya sor? Ma weha dibe?! Mirov bûzê naxe nav meya sor, birêzê hêja! Va goştê te ji min re haniye çi be jî ne *şnîtsil* e!

– Kêmasiya ji me efû bike Rasîn Efendî, lê aşpêjê me *şnîtsil* weha çêdike û meya sor li vir bêbûz nayê vexwarin. Bêbûz ew ê mirovî zû serxweş bike.

– Çêkirina *şnîtsil* divêt bi usûl be. Goştê golikê ji şûna nerm û bêdohn tê girtin, tenik-tenik tê birrîn û dû re bi mekutê textî tê kutandin. Hinek ard dikeve seheneke, nanê hişk yê hatî hêrandin

dikeve seheneke din û hêkine lihevketî dikevin tasikekê. Her parçeyê goşt berê dikeve nav êrd, dû re nav hêkan, dû re di nav nanê hûr û hişk de dihêt mistandin. Li dawiyê goşt di rûnê nebatî yê di teweyeke pahn de, yan di nav zeyta zeytûnan de, dihêt qewirandin. Va goştê te ji min re haniye wek goştê bizinan xuya dike, bi dohn e û bêyî ard û hêk û nanê hişk di rûnê miyan de, tew heye ku di rûnê çêlekan de, hatiye qewirandin. Ma weha dibe?! Na, na, ez naxwim. Xem nake, Xwedê ji we razî be. Tu goştê xwe rake û bi xwe bixwe, yan bide aşpêj û şagirtên wî, bila ew bixwin.

– Bi gotina te ye Rasîn Efendî. Te em rûreş derxistin, lê her xwarinek li şûna xwe xweş e. Vêrê ne Viyena, ne jî Rûsistan e. Kêmasiya ji me bibexşîn û fermo bibêje min ka tu li şûna *şnîtsil* çi dixwazî. Eger tu bi ya min bikî, pirinc û tirşika bamiyan, yan kebab. Em kebabê li vir pîrr xweş çêdikin.

– Bila bi ya te be. Te çi xwazt wî wîne. Tenê bila bêdohn be.

Rasîn hîn daniştibû û nanê xwe dixwar, dema mêvanên din yek li dû yekî ji salonê çûn der. Tiştê bala wî kişand ew bû ku kesekî ji wan ne xatir xwazt, ne jî çi pere dan Rîso. Hemiyar, bi taybetî yekî dora sîh salî ku bi wî re bişirî, di binê çavan re li wî niherîn, lê kesekî tiştê jê re negot. Li dû ku xwarina xwe xwar û qehwe vexwar, bang li Rîso kir û xwazt hesabê xwe bide. Rîso lê niherî, serê xwe bi rêz carekê daxist û çû ji barê zerfek hanî, ew da Rêsin û got:

– Vê nameyê berê bixwîne, ez benî. Ew ji te re ye.

Rêsin cigareyek vexist, zerf di aliyekî de çirrand û dest pê kir nameyê bixwêne:

“Dema tu zarokê çar-pênc salî bûyî, Rasînê hêja, bavê te tu carine bi xwe re dibirî konê Kaşan Begê. Heke di bîra te de mabe, biharê Kaşan Begê konekî reş ji bo mêvanan li gundekî xwe vedigirt. Di wî konî de her mirovekî cîhekî xwe hebû. Aliyê jor ji bo Kaşan Begê û mêvanên wî yên taybet bû. Xaliyekî sor li wî beşî



dihat raxistin û yastiqên bi çîn li ser bûn. Ji çep û rastê xêlî kulav ber bi deriyê kon ve dikişyan. Mêvanên ji warên dûr û rihspiyên civatê li nêzikî xwe diyê kon dadiniştin, xort û ciwanan li jêrê wan cîhên xwe digirtin û ji wan wê de şûna cotkar û gavan û şivanan bû. Cîhê zarokan jî, eger rêdana mayîne ji bo wan hebûya, li nêzikî pêlavan bû. Navê kesekî li ser şûna wî nehatibû nivîsandin, ne jî kesekî ji yekî din re digot bila li ku danişe, lê her yekî şûna xwe dinasî û pê razî bû. Çawa ku di binê konê Kaşan Begê de her kesî cîhê xwe dinasî, wisa jî di nav civatê de her mirovî şûn û giraniya xwe dizanibû. Di nav civateke weha de tu mezin bûyî û tu bi rê û rêçikên wê re dilsoz bûyî.

“Dema xortaniya te, li dû dûrketina ji gund, tu ketî bin bandora ramanên biyanî, rê û rêçikên civata te di çavên te de reş bûn, kesên wek Kaşan Begê bi rind û nerindên xwe ve li pêş çavên te bûn ma’r û gur û tu bûyî neyarê wan. Sal derbas bûn û wa ye te îroj bêriya konê reş kiriye û xweziya xwe bi demên zarokiya xwe dihîniye. Lê ew rojan bi ber bayê demê ketin û xewna ku tu li welêt rastî kes û dîmenên ji rojên par bihêyî dê her xewn bimîne, çimkî welat nema heman welat e, ne jî xelkê wê bi tevahî wek yê berê ye.”

“Heye ku li dû gihîştinê dilê te weqa zû li Tarê mabe. Dibe ku tu ji nuha ve li vê hatinê dilsar bûbî; û gotinê naxwaze, heye ku hestê poşmaniyê nuha dest pê kiribe û di dilê te de dilebite. Lê poşman mebe û bihêle bila ava çemê qedere te bi aramî bi ber xwe xe.”

“Di jiyana mirovên bijarte de tiştek ji azadiyê pîroztir tune, lê nuha ku tu mirovekî şareza yî bêguman tu dizanî ku azadiyeke bêyî sînor heye ku tenê ji bo lawirine hov hebe, ew jî ger ew bi serên xwe hatibin berdan. Gellekî baş e ku mirov xwe bi xwe berpirsîyarê/-a jiyana xwe be û di bijartina rê û rêçikên qedera xwe de azad be; lê li milê din, gelo di cîhana me de çend mirov rast layiqî maf û azadiyeke weqa bê-sînor in? Mirovê rast jêhatî û zîrek ew kesa ye ku dikare di her rewşê de, heta di nav mercên gellekî dijwar de be jî, li ser lingan bimîne, lê mayîna li ser lingan bi serê xwe jî têrê nake. Mirovê herî bijarte dê bikaribe di her rewşê de, bi

kêmasî di kûraniya hebûna xwe de, xwedan hêzeke taybet be, hêzeke ku wêrekiyê dixê dilê wî, wêrekiyeke ku hestê serxwebûneke şexsî li nik wî diafirîne, lê hestê serxwebûna şexsî bi serê xwe dîsa têrê nake. Hebûna vê hestê bêyî hebûna mentiqê li nik mirov wek keştiyeke bêyî rêber e. Kesên di dilên xwe de xwedan şexsiyeteke serbixwe ne û di heman demê de zana û mentiqî ne, di nav civata xwe de wek mûmên bedew in. Heye ku endamên civatê zû bi zû wan wek nerxgiran nebînin, lê li dawiya dawiyê bi saya wan şêwe mirovan e ku civat û netewe digihên şûnên bilind.”

“Bêguman tu dê ji xwe bipirsî: ‘Gelo kê, û ji bo çi, van peyvên ji min re nivîsandine?’ Pirseke weha di cîhê xwe de ye, lê ya grîng ew e ku peyvên di nameyê de bo têgihîştina mebestê alîgir bin.”

“Di jiyana mirovî de carine bûyerên ne’adetî diqewimin. Li vir jî mantiq û wêrekî rola xwe dileyizin; çimkî kesê ku ne xwediyê van şanan be dê nikaribe di rewşên wilo de rê û rêçikên durist bibijêre û heye ku bi encamê di bin ve biçê, wekî kesekî ku ji nişkan ve di aveke kûr wer bibe û nizanibe avjeniyê bike, yan xwe şaş bike û bi encama tirsê bifetise. Bûyereke bi vê nolê îroj hatiye serê te, bûyereke ji jiyana a’detî der. Tu dikarî mafê azadiyê hîn jî bi kar bihîni, lê li pêş te tenê du rê hene: Avjiniya li berevaciya pêlên vê serpêhatiyê û rasthatina li encamên pê ve girêdayî, yan avjiniyeke hêsan û aram bi pêlên wê re. Bila ji bîr neçe ku Tar ne bajarekî Amerîkayê ye û ev beşê Çayxaneyê Aramo ne beşekî ji kafêtêryayên bajarên rojavayî ye. Hîn bi ser de, wekî li jor hat diyarkirin, va serpêhatiya jî ne yeke rojane û a’detî ye.”

“Ji bo mirovekî wek te pêdivî bi gotinên zêdetir niye. Bi hêviya ku tu rêya rast bibijêrî û wek mêvanekî Çayxaneyê Aramo li benda kombûna me bimîni. Spas ji bo emaneta te ji Amerîka bi xwe re hanî. Em ê bi dîtina te dilşad bibin: L—.”

Rêsîn name careke din xwend, dora pênc xulekan rûyê xwe xist nav herdu lepên xwe û ponijî. Dû re bang li Rîso kir û berî bide dû

wî tenê pîrsek jê pîrsî, ligel ku bersîva pîrsa xwe dizanibû jî, çîqa derbarê wê de ne sed ji sedî bêguman bû jî:

– Name ji Leheng e?

Rîso wekî ku ji pîrsê mat mabe, yan fêhm nekiribe, xuya kir, li Rêsin niherî, serê xwe bi aliyekî ve bada, herdu destên xwe hildan jor û ji devê ku nuha piçekî qermiçî bû çî bersîv nehat der.

## 5

Em li vir dîsa rê bidin Pîrên, bila me li roja yekemîn ya gihîştina xwe û mêvanên din vegerîne:

“Rîso peyakî rûkenokî zimanxweş bû, lê axaftina wî gellekî bi sînor bû. Dû re pê hesiyam ku ji salan û vir ve wek azep li nik Aramo di kar de ye. Ji roja yekemî ve min hewl da bêtir jê nêzik bibim, lê bi ser neketim. Baş xuya bû ku wî ne ligor daxwaz û ramanên xwe, lê ligor yên serdarê xwe, karê xwe bi rê ve dibir. Wisa xuya dikir mîna ku serdarê wî lê qedexe kiribe perdeyê ji navbera xwe û mêvanan rake.”

“Roja şemê, dema ez jî wek mêvanê îroj hatî gihîştim vir, hejmara me di salonê de gihîşt heft mêvanan. Li dû gihîştina min bi dora saetekê mêvanê li paş maseya yekem daniştî, xortekî ku temenê xwe ji 25 salan ne bêtir bû, bang li Rîso kir û hesabê xwe jê xwazt. Rîso kenekî sivik hanî ser lêvên xwe û bi destê rastê şana sebîrxwaztinê raber kir. Xort, ku ez dû re têgihîştim navê xwe Halo

ye, li dû bîstekê daxwaza hesêb dubare kir. Rîso derket ser sekuya li pêş salonê, herdu destên xwe li hev xistin da ku haya me hemiyana bikişîne ser xwe û dest pê kir bipeyive:

– *Rîso bi dengekî delal got, ‘Mêvanên qedirbilind (piçekî rawestiya, li me hemiyana mêze kir û axaftina xwe domand) gotinên pirr ji bo kesên wek we ne lazim in. Kesên ji bo vê munasebeta yekta hatine bijartin, ligor ku ez dizanim, kesên zana û bi aqil in û zû fêhm dikin. Hûn ê çend rojan mêvanên me bin. Her yek ji we her hal ji bo mebestekê li vir e û dema ew mebest bi cîh were hûn ê car din bibin xwediyên qedera xwe. Hûn li vir pirr dirêj nakin û ez soz didim, eger hûn riyeye şaş nebijêrin û wek ji we tê hêvîkirin bikin, ji rindiyê pê ve hûn ê li cem me rastî tiştêkî neyên. Mêvanî û mazûvanî erf û adetên xwe hene. Wek mazûvan em wekîlên hemî pêdiviyên we ne. Wek mêvan hûn berpîrsên rêzgirtina ji erfên mêvaniyê re ne. Ji kerema xwe haydare wê yekê bin ku biryara dawîn ne di dest min, ne jî di dest Aramo de ye. Aramo, tenê ya ji wî hatiye xwestin dike û ez jî ya ew ji min dixwaze.*

“Xortê bi navê Halo li vir şaşiyeye mezin kir. Wisa diyar bû ku ew negihîştibû mebesta Rîso û ciddiyeta rewşê fêhm nekiribû. Destekî xwe li maseyê xist, bi rûyekî tîrş û tahl li Rîso niherî û gotê, ‘Va çi gotin e, lawo! Wexta min ji gotinên vala re tune. Ka hesabê min zû wîne, ez ê biçim.’

“Rîso bi dengekî rêzgir û rûyekî dostane, lê nuha piçekî sor bûyî, got:

*Birêzê ciwan neheqiyê li me dike. Li vir heye ku şaşiyek were efûkirin, lê ne dudu. Ez bi rîhên xwe yên spî ji birêzê ciwan rica dikim ku xwe neke sêva xirab di nav sepetê de. Hevsarê vê bûyera we bi xwe re eleqedar dike, wek min got, ne di dest min de ye. Hêviya min ji mêvanê ciwan ew e ku min fedîkar û xwe rûreş dernexe.*

“Halo rabû ser xwe, çend gotinên bi hêrs hanîn ser zimên, ber bi dêrî ve çû, ew vekir û derket. Li dû vê kiryara wî Rîso wek

mamosteyê ku şagirtekî li dij daxwaza wî kiryareke ne di cîh de kiribe xewinî. Ew ne wek kesekî xeyidî, lê bêtir wek kesekî li pêş yên din şermezar bûbe, yan kesekî ku ne li benda encameke ji xêrê re be, dixewinî. Li dû ku bêhna xwe piçekî fireh kir ew car din li me zivirî û axaftina xwe bi van peyvan bi dawî hanî:

*Birêz Halo sêveke xirab e, yan yeke terr e. Çi heyf! Ew ê vegere, lê wî carê xwe di çavên me de biçûk kir. Ez di xizmeta we de me, mêvanên gellekî hêja. Li dû qehweyê ez ê we bibim odayên we.*

“Van gotinên Rîso ez ta radeyekê xemgîn kirim, heye ku tew hinek ji me tirsandibin, lê kesekî devê xwe venekir, wekî ku em hemî ketibin bin bandora benceke seyr yan sihirbaziyê ji xeybê. Li milê din, bêguman hinekan ji me dê weha texmîn kiribûna ku rêxistineke rêhişk li dû vê serpêhatiyê bû. Hîn me qehweya xwe vedixwar me hew dît Halo bi gavên sist û serî di ber de ket hindir, wek mirovekî di xewa xwe de bimeşe. Çû li paş maseya xwe danişt û nelipitî ta Rîso ji me tika kir ku em bidin dû wî û biçin odayên xwe. Bêyî ku devê xwe veke ew ber me hemiyan rabû û da dû Rîso. Min û mêvanên din, me li rûyên hev niherî û bêyî kesek ji me tişteki bibêje me jî yek li dû yê din da dû Rîso.

“Odeya min yeke biçûk, lê pak û xweşik bû. Di odayê de textekî bi rûşeltên spî hatî nixamtin li aliyê çepê bû. Li qunceki odayê maseyê biçûk û îskemeyekê hatibûn bicîhkirin û li ser maseyê kaxez û pênûs hebûn. Dîwarê bi derî ne tê de bi her dîwarekî din ve wêneyek hatibû bidarxistin. Ode bêpencere bû, lê sê lampayên elektrîkê, yek li jor û du li kêlekên têxt, ew tiji ronahî kiribûn. Di qunceki wê de perwaneyekê bayê honik belav dikir. Li kêleka dêrî beşekî biçûk hebû ku tê de avrêj, henefiyêke avê û neynîkek hebûn.

“Hema ber rojava Rîso li deriyê odeya min xist û ji min tika kir ku xwe ji bo şuştinê amade bikim. Divabû hemî kincên xwe di odayê de bihêlim û çarşefeke soravîn li dor xwe bigerînim. Dora demjimêr heft Rîso ez dam dû xwe û birim serşokê. Bi ketina hindir re hebûna peyakî bala min kişand ser xwe û ez veciniqîm. Ew di

beşê aliyê rastê de li paş îskemeyeke wek ya dukanên berberan rawestiyabû. Dema Rîso tîrsa li nik min di çav xwe re kir kenîya û got, 'Ji Efrîto metirse, birêz Pîran. Ew bi heybet xuya dike, lê zîrarê nagihîne mûriyêkê jî; helbet heke mûrî bi wî danede.' Bi vê gotina xwe re dîsa kenîya û ji hindir çû der.

"Efrîto wekî navê xwe efrîtekî peyan bû. Dirêjiya bejna wî nêzikî du metiran bû û ligel ku qelew bû jî çî şopên dohn û çermê sist li ser giyanê wî nebûn. Simbêlên wî bi dora pênc santêman li herdu aliyên serlêva wî li hev hatibûn badan. Dema min baştir bi rûyê wî yê esmer ve niherî min dît ku çavê wî yê çepê kor e. Nedizanim çima, lê min dil nebû ligel wî bipeyivim. Wî bi şaneke ji destê rastê ez vexwandim ser îskemeyê û bêyî devê xwe veke dest pê kir porê min bibirre. Ji dengê cawbirê pê ve çî dengên din nedihatîn bihîstin. Ji şêweya bikarhanîna cawbira di destekî û şehê di destê din de xuya bû ku ji berberan yekî hoste bû. Dema birrîna porê min bi serî kir dest pê kir kefe di rûyê min bide, lê ber dest bi kurrkirina rîhên min bike derbas aliyê odeyê yê din bû û henefiya ava banyo vekir. Li dû kurrkirina rîhên min deng pê ket, got, 'fermo,' û destekî xwe ber bi banyo ve dirêj kir. Ez mat mam çawa mirovekî weqa bi hêz û heybet dikare weha destsivik û dengdelal be. Min got, "Spas" û derbasî aliyê banyo bûm. Banyo tîjo ava germ bû bû û bêhneke xweş ji kefa bi ser avê ketî dihat. Dema di nav avê de daniştim Efrîto deriyekî nizm vekir û min dît ku odeyêke biçûk li paş dêrî heye. Dirêj nekir ew li min vegeyîya û pirsî:

– Dixwazî guhdare sîmfoniya Bêthoven ya nehemîn bikî, yan meqamekî ji dahol û zurneya gewendeyên Tarê? Min matmayî bi xwe re got, "Tar li ku, Efrîto li ku û Sîmfoniya Nehemîn ya Bêthoven li ku!"

"Tevî ku dilê min di wê rewşa ez tê de guhlêdana mûzîka klasîk ya Bêthoven meraq dikir jî, bijartina xwarinan di salonê de hat bîra min û min dahol û zurne xwazt. Efrîto çû hindir odeya biçûk û berî li min vegere meqamekî dahol û zorneyê dest pê kir. Dema li min vegeyîya xwe bi çongan xist ser erdê û bi paçekî zivir rûyê min, sîngê min, milên min û dû re pişta min mist dan. Li dû kutakirina

karê xwe tapa binê banyo derxist, satilek tiji ava sar kir û bi ser min de berda. Li dû vê yekê çarşefeke spî da min û got, “Fermo vegere odeya xwe.” Min xwazt tiştêkî bibêjim, lê çi peyv nehatin ser zimanê min û ez bêyî axaftin li odeya xwe vegeriyam.

“Di odeyê de sîniyêke biçûk li ser maseyê hatibû danîn. Li ser wê parçeyek nanê sêlê, sehenek mast, sê xiyar û piyalek av hebûn. Li ser têxt kirasekî spî hebû. Min ew li xwe kir û dest pê kir nanê xwe bixwim. Li ser xwarinê wêneya bi dîwarê li pêş min ve bala min kişand ser xwe. Wêne yeke reş-spî bû. Zaroyekî di hembêza jineke ciwan de tê de dikeniya. Zaroyê dev-bi-ken bi min ve namo xuya nekir, min ew dîtibû, lê min çi kir jî ji dest nehat xwe bigihînim kîbûna wî. Dema min li dû xwarinê nêzikî li wêneyê kir û baş bi jina zaro hembêz kiribû ve niherî hêstir ji çavên wê hatin xwarê. Bi tirs min wêne li cîh hişt û xwe bada dîwarê li aliyê din. Di wêneya bi wî dîwarî ve pîr û kalek hebûn, lê wêneyê bêtir piştên wan, ne rûyên wan, raber dikirin. Herduyan destên xwe bi jor ve hildabûn, wekî ku ji Xwedê daxwazekê bikin. Dema min baş bi piştên kal û pîrê ve niherî, hew min dît wan rûyên xwe zîvirandin û li min seyr kirin, dibişîrîn. Ez veciniqîm û li hev şaş bûm. Gelo ez dîn bû bûm? Gelo ez di bin bandoreke sihîrbazî de bûm? Va çi rewş bû ez ketibûmê?!

“Bi lez min berê xwe da wêneya bi dîwarê sêyemîn ve. Ew wêne jî wek herduyên din reş-spî bû. Di wê de du peyan gorek dikolan. Li aliyekî kalek digirîya û li aliyê din pîreke mirî li ser erdê di nav kêfen de bû, heman kal û pîrên di wêneya din de. Kefen li seranserê bedena wê hatibû pêçandin, lê ne li serê wê. Dema min baş bi rûyê wê ve niherî min diya xwe dît. Dilê min bi lez lê da, tevahiya giyanê min lerizî û bêyî hemdê xwe ez terepaş çûm û li ser têxt veketim.

“Dema ji xewê hişyar bûm min nema dizanibû ka ew dîmenên ji her sê wêneyan hatinî ber çavên min ji xewnekê bûn yan dîmenên di dema hişyarbûnê de bi min ve xewinî bûn. Da ku wêneyan nebînim û dîsa li wan mêze nekim min her sê lampa vemirandin û dest pê kir di rewşa par ya bav û diya xwe de bîponijim – rewşa rojên wan yên ber mirinê. Min hêviya ku wan ji min dikirî bi bîr

hanî, hêviya di dilên wan de ta mirinê mayî û qurçîfî. Min her weha bûyerên îroj cîh girtinî di nav hişên xwe re derbas kirin. Xewa min nema dihat û nebûna pencereyekê di odeya biçûk de bêhna min teng kir. Tevî ku min dizanibû bastir e dêrî venekim jî, ez bêyî hemdê xwe çûm û min bizava vekirina wî kir, lê wekî min texmîn dikir venebû û ez neçar mam li textê xwe vegerim. Nedizanim kengê ketim xew. Tenê dizanim ku azana nimêja berbangê ez hişyar kirim. Li dû azanê bi dora saetekê derî hat lêdan û vebû. Rîso got, 'Hêvîdar im te baş xew kiribe, birêz Pîran,' û ez haydar kirim ku dirêj nake firavîn dê amade be.

"Dema Rîso vejeriya û ez bi xwe re birim salonê, min dît ku her şeş mêvanên din li wir in. Dîsa her yek ji wan li paş maseyekê danîstibû. Firavîn bi zewq û tevde hatibû amadekirin û rêzê kirin, wekî mirov di hinek otêlên pêncstêrkî de dibîne. Li ser maseyêke dirêj sê-çar babetên nê, zeytûn, mast, çar şêwe penêr, hêkên kelandî, qeyxane, hingiv, rîçala muşmuşan, ya tûyan û ya gulan; sucuqên goşt, mêtîyê berxan, qeymax, nanê penêrî, çar-pênc babetên şîraniya herêmî, du babetên gatoyan, pênc şêwe meywe, çay, qehwe, şîrê germ û yê sar, kakawa û çend tiştên din. Bêhna min piçekî fireh bû û min gote xwe, 'Va ne karê rêhişkan e.' Li dû firavîna ku xwarina wê bêtir ji saetekê ajot bo her yekî ji me rojnameyêke li paytextê dewletê çap bûyî hat dayîn. Di navberê de demjimêr 7bû bû dora yanzdeh dema Rîso li ser sekuya salonê xewinî û haya me kişand ser xwe. Dû re kaxezek ji beriya xwe derxist û dest pê kir naveroka wê ji me re bixwêne:

*Mêvanên qedirbilind! Va roja we ya duyemîn e li vir. Em bexşandinê hêvî dikin eger me hûn ji rêwîtiya we, yan ji karê we, aware kiribin, lê wek hûn dizanin jiyana bi tevahiya xwe rêwîtiyêke wisa ye ku gellek caran mirovan, bi taybetî mirovên amancbilind, nagihîne tevahiya daxwazên di dilên wan de. Li dû nîvro vêsî bikin, çimkî êvar û şeveke rengîn li pêş we ne. Demjimêr 7 hûn ê car din bihên vir. Li dû gihîştina we deriyê vî beşê Çayxaneyê Aramo dê ji bo rewşenbîr û giregirên Tarê û doraliyên wê vebe. Hûn ne zaro ne, ne jî kesên nezan in; me hêvî heye hûn ê mazûvanî û pêbawerîya me bênerx nekin. Hûn ji duhinî ve agahdar in ku her yek ji we ji bo*



*sedemekê li vir e. Ger hûn bi qederê bawer in mayîna li vir wek beşekî ji qedera xwe bihesibînin. Ger hûn pê ne bawer in wek lêrasthatinekê, tesadufekê, lê binihêrin. Wek tê gotin, hatina mêvên bi dest wî ye, lê çûna wî di dest mazûvên de ye. Ewên jîr û jêhatî di nav we de dê gihîştibin mebesta me. Bi hêviya ku hûn êvar û şeveke xweş û balkêş derbas bikin.*

“Rîso neda zanîn ka kê name nivîsandiye. Wî kaxez li hev pêça û li beriya xwe vegerand. Dû re axaftina xwe bêyî kaxez domand û da zanîn ku ew ê li vir me haydarî şertekî bike. Ew jî ew e ku mêvan pêwîst e ligel hev û din nepeyivin ta ku rê ji bo vê yekê dihêt dayîn. Berî me li odeyên me vegeirîne li ser gotina xwe zêde kir û got:

*Derî dê vê êvarê vekirî be, lê ji min bawer bikin, û ez vê yekê ji bo xatirê we û ji ba xwe ve dibêjime, carine deriyên vekirî ji yê girtî tehlûketir in. Her weha di dema axaftina bi mêvanên ku dê êvarê bigihên vir de miqayit bin. Gotineke şaş dikare bibe seba çîhgirtina encamên ne baş. Hûn birêzên qedirbilind bêguman dizanin mebesta min çi ye.*

“Ez bi meraq û heyecan li benda êvarê mam. Ji aliyekî ve kêfxweş bûm ku em ê car din têketana nav xelkê û rewşeke şên, lê ji aliyê din ve bi tirs bûm. Ez ji wê yekê bi tirs bûm ku yek ji me heftan şaşiyekê bike, çimkî min di dilê xwe de dizanibû ku qedera me heft mêvanan bi şêweyekê ji şêweyan bi hev ve girêdayî ye û şaşiya yekî ji me dê bandora xwe bigihanda yê din. Bi taybetî ez ji xortê bi navê Halo bi tirs bûm, çimkî wek kesekî bêsebir û bêyî pêkaniya xweragirtinê xuya dikir. Wî carekê şaşî kiribû û dikaribû careke din bikira. Ji bo kurtedemekê min tevdêra wê yekê kir ku xwe di dema têketina salonê de bigihînimê û haydar bikim bila devê xwe girtî bihêle û ji salonê neçe der, lê dû re min biryara xwe guhert, li dû ku min tenbeya Rîso bi bîr hanî.

“Dora demjimêr 5’ê dû nîvro ji heman rojê, roja yeksemê, Rîso li deriyê min xist û ez birim cem Efrîto, yê ku rîhên min dîsa kurr kirin û porê min şeh kir. Li dû vegera li odeya xwe dem zû derbas bû û dirêj nekir min xwe di salonê de dît, bi her şêş mêvanên din re.

“Demjimêr heft û niv deriyê salonê vebû û di nav saetekê de hindir tiji bû. Atmosfêra di vî beşê Çayxaneyê Aramo de ji hinek aliyan ve wek yeke li cîhên bijarte yên bajarên mezin bû, lê di heman demê de yekta bû: Li ser sehneyê komeke ji mûzîkvanan meqamine pêşkêş dikirin ku mirov dikaribû tenê ji hunermendên orkêstrayên navdar bipa. Garsonên di kar de ne tenê bi kincên pak û bedew bûn, lê her weha ji heqê karê xwe jî derdiketin. Mase bi çarşefên spî hatibûn nixamtin û li ser wan kêr û çetel û kevçiyên kalîteçak hatibûn bicîhkirin, û ji bo her şêwe vexwarinekê piyaleke ligor wê hatibû danîn. Mirov hişmekar dikir li babetên xwarinê binihêre; û vexwarin, ji araqiyê bigir ta şampanyaya fransî, hebû. Tenê kêmasiyek hebû: nebûna jinê. Lê li van deveran va yeka ne tiştêkî mathîştinê bû. Hinek kesên nêzikî min carina bi îsrar piyalek mey pêşkêşe min dikirin, tevî ku li ser maseya min jî mey hebû. Heman tişt ji bo şeş mêvanên din jî dihat kirin.

“Demê dehê şevê derbas kiribû çaxa çira vemirîn. Ji mêvanan dengêkî yekgirtî derket, dengê ku bexteweriya wan aşkere dikir, wekî ku bûyereke dilşadkirinê ya ew li bendê bûn dê dest pê bikira. Dû re li çepikan dan. Bi vêketina lampayan re dîmeneke ku min çaverê nedikir li pêş salonê xuya kir. Neh keçên ciwan yên bi kirasên dirêj û ji rengên bijarte, keçên ciwan yên çeleng û bejnzirav, berên wan li mêvanan, di rêzekê de li ser lingan bûn. Te digot qey ji kûzê sihirbazeke dem û dewranên par hatibûn der; sivik û delal xwe bi ber lehiya dengê yezdanî, yê ku hunermendan ji tenbûr û ûdê, kemençe û bilûrê, dudik û bizqê dihanî der, xistin; na, xwe bi ber nexistin, xwe di nav de helandin – yan baştir e bihêt gotin ku wan meqamê mûzîkî û giyanên xwe di nav dîlaneke sihirafer de bi hev re kirin yek.

“Bedew bûn van keçan, gellekî bedew. Van keçên ku şeş ji wan porreş û sê zerî bûn, xweşik û xwînşêrîn bûn, bixwebawer û jêhatî bûn, stûberz û serbilind bûn, memikhenarî û newqzirav bûn. Rêzgirtineke ku tenê ji bo qentirîn berhemên Xwedê û xweristê dikare bihête dayîn li nik min, û bêyî guman li nik piraniya kesên di

salonê de jî, bo wan hat hestkirin. Heke ne ji bo xatirê Yezdanê dilovan bûya min ê di wê dem û şûnê de secde ji wan re kiribûya, ne ji ber egerên dunyayî, lê ji bo nerxdana ji çelengî û delaliya jinê re, bo rêzgirtina ji afirmandê wan re, û ji bo xatirê çakî û bedewiya mirova mê. Keçên bijarte bûn van keçan, keçên weha ku mirov digot qey ji qonaxeke dîrokiye par, yan ji zemawenda mîrekî navdar ji mîrên demeke zêrîn ya vî warî, ber navê xwe bibe Tar, xwe gîhandibûn Çayxaneyaya Aramo. Xwe li ba dikirin, sivik-sivik xwe dilivandin, bi hev re û di heman demê de, te digot qey bi dêzî bi hev û din ve girêdayî bûn. Piyê yekê ji yeke din bilindtir yan nizmtir nedibû, lêvên yekê ji yeke din bêtir yan kêmtir nedibişîrîn, lingê yekê ji yê yeke din hindiktir yan zêdetir nedilivî; bi awayekî yekgirtî, bi tevdêreke hevpar, bi şêweyeke xweristî û ligor meqamê mûzîkeke behuşî ew beşdarê dîlanekê yekta bû bûn.

“Te digot qey bûyereke olî ya pîroz cîh digirt. Wan keçan hêvî, bextewerî û aramî di dilên kesên li wir de bi cîh kiribûn û di heman demê de rêzgirtineke bêdawî ji can û giyanê jinê re li nik temaşevanan zîz kiribû. Tevî ku di salên derbasbûyî de min kêmtir spasiya Yezdanê kiribû jî, li vir, û bêyî hemdê xwe, min ji kûraniya dil û hişên xwe spasî jê re kir ku cîhana me bi rindî û bedewiya jinê hatiye xemilandin. Min ji jinê hez kir, ji her jinê, heta ji ya giyanfiroş jî. Bi encama kela hestan ez kelgirî bûm, çimkî hemî jinên ku di cîhana me de rastî ta’deyan hatine û dihên, hatin bîra min. Nixamtina rûyê jinê bi perdeyên reş jî hat bîra min; ew perdeyên ku çelengiya wê vedişêrin û civatê ji kenê ser lêvên wê bêpar dihêlê; ew perdeyên ku mirovahiya nivê bedew ji însanan îhanet dike, wekî ku hebûna jinê şerm be. Di dilê min de nefreta li hember wan kesan dîsa keliya, kesên ku dixwaztin nivê civatê pûç bihêlin û jinê tenê wek çaviya zayîna zarokan, berdesteke nav dîwarên malê, yan wek çûkbûkeke demî bo pêleyiztinê bi kar bihînin.

“Van bedewkeçan û dîlana wan ya bi pêlên mûzîka qenc re kesên beşdar ta wê radeyê xistibûn bin bandora sihra li holê ku kesekî pêş kutabûna dîlanê ji wan re li çepikan jî nedida, çimkî kiriyareke weha dê aramiya rewşa sihrafer bişkanda. Demê wateya xwe

wenda kir ta ku çira melûl bûn, vemirîn û ew di şevreşiyê de wenda bûn. Dema dengê çepikan ket guhên min û lampa vêketin, ez têgihîştim ku dem bi dora saetekê li pêş nivê şevê ye. Bo kurtedemekê hişên min ji rewşa salonê dûr man, çimkî bi tevahî di nav cîhaneke weha de bûn ku tê de qencyê, evînê û rêzgirtina hevbeş şûna ezotiyê, asotengiyê û stemkariya mirovan li hev dikirin, digirtin.

“Qehwe û çayê dihatin belavkirin. Mûzîk nema dihat bihîstin, ne jî li ser sekuyê şopên hunermendan mabûn. Min wisa dizanibû ku şeva me li dawîhatinê bû û em ê dîsa vegeyriyana odayên xwe, lê weha nebû. Kêm-zêde nivê şevê bû dema Aramo derket ser sehneyê. Taximekî reş li wî bû û wek kesekî şûnbilind û zana xuya dikir. Beşdaran dawî dan axaftinê û Aramo dest pê kir bipeyive:

*Mêvanên birêz û hêja! Hêvîdar im her tişt bi dilê we be. Ji we hêviya bexşandinê dikim ku ew ê bi saya wî êvarên weha xweş li Tarê cîh digirin, Leheng Axayê qedirbilind, bi encama karine grîng nikanibû xwe bigîhanda vê kombûna me. Ew silavên xwe ji we hemiyan re pêşkêş dike û dê di kombûna êvara îniyê de bi me re be.*

*Nuha Mêvanine me dê gotarên xwe pêşkêş bikin. Berê Kadirê Rojperest ê ji we re gotareke li ser qederê pêşkêş bike. Li dû wî Bêwar Ramanî dê derheqê beşekî ji dîroka welatê me de gotareke xwe bixwîne.*

*Mêvanên delal, ji rindiya xwe bixêrhatinê li brayê hêja Mamoste Rojperest bikin.*

“Rojperest, peyakî bejinkurtî kêm-zêde pênceh salî, wek yekî ji wan kesan bû ku mirov ji wan pîrr nedipa, lê li dû bihîstina dengê wan biryara xwe diguhert û bi meraq guh dida gotinên wan. Wî berçavk ji beriyekê û kaxezek ji ya din derxistin û li dû pêşgotineke a’detî dest pê kir gotara xwe bixwîne:

*Hinek ji mêvanên xoşewîst heye ku bi hêza qedere ne bawer bin, lê nav çî be jî, hêzeke veşartî heye ku jiyana mirovan dixwe bin bandora xwe. Ne grîng e ku navê vê hêzê qeder be; mirov dikare navên din jî lê bike, lê ya grîng ew e ku di jiyana her yekî jî me de bûyerine ku kesek ne li benda wan e dikarin biqewimin û bi encamê rêjiyana mirov dikare bihêt badan, guhertin, yan tew rawestandin.*

*Jidaybûna dergûşekî/dergûşekê, yanê hebûna mirovî li ser rûyê erdê, bi ser û binê xwe ve lêrasthatineke seyr e. Di beşdarbûna mêr û jinekê di têkiliyê cinsî de, dema piştî mêr dihêt du sed ta sê sed milyon beşikên toximî jî organê wî derbas devrehmika jinê dibin. Tenê yek ji wan xwe li nik jinê digihîne hêkikekê, tenê yek! Bi gotineke din, destpêkirina rêya jiyana her yekî û yekê jî me lêrasthatineke yekta ya di nav du-sê milyon ihtîmalan de ye; yanê wekî ku di nav du-sê milyon kesan de jimara karta “yanesîbê” ya kesekî lê rast bihêt. Bi ser vê yekê de, têkiliya cinsî ya du mirovan di dem û şûneke ku tê de rêya jiyana dergûşekî/dergûşekê dest pê dike de heye ku her weha lêrasthatin be. Li milê din, di roj û salên jiyana her yekî û yekê jî me de bi hezaran rê û rêçik dihên pêş me. Siberoja ku girtina yekê jî wan rêyan dikare ji xwe re bike encam heye ku bi tevahî ji siberoja ku girtina yeke din dikaribû me bigihîne cudatir be.*

*Carina qedera mirov ne di destê wî bi xwe de ye. Bi gotineke din, tişt û bûyerên din rola xwe dileyizin bêyî ku wî bixwe çî rol di bijartina wan de hebe. Bala xwe bidin vê nimûneyê: Em bibêjin mirovekî bi navê X li rawestgeha otobusê ye, dixwaze biçe mala xwe. Bi gihîştina otobusê re hevalekî ku wî jî mêj ve nedîtiye lê rast dihêt. X aciz dibe ji ber ku otobûsê ê jî dest biçêt û pêwîst e bi encamê li benda yeke din bimîne, lê rû nagire ku hema weha bi hêsanî xwe ji ber wî hevalî bade û li otobusê siwar be. Otobus bi rê dikeve û hema bi sed gavan ji rawestgehê wê de bombeyeke tê de hatibû bicîhkirin diteqê û hemî kesên tê de dimirin. Wek hûn dibînin, lêrasthatineke ku X ne li bendê bû, bûyereke ku wî jî bo cîhgirtina wê çî tevdêr nekiribû, di jiyana wî de roleke mayîn û nemanê dileyize.*

*Lê mirov di pirsra qederê de ne her dem bêtevêdêr û bêrol e. Mînakê ku ez ê nuha bidim raber dike çawa mirov dikare carina di qedera xwe de rolekê bileyize.*

“Li vir Rojperest tiştêkî balkêş kir. Mîkrefon li şûn hîşt, ji ser sekuya salonê daket û hat maseya yekî ji me heft mêvanan, ku nuha dizanim navê xwe Perîşan Pêzan e, û pê re peyivî, wekî ku wî vexwêne ser sehneyê. Berê Perîşan, wek navê xwe, perîşan bû û ket hev, lê li dû ku Rojperest çend gotinên din jê re kirin û Aramo hat hawara wî Perîşan rabû ser xwe û bi Mamoste Rojperest re çû ser sehneyê. Gotarbêjî ew bi van peyvan pêşkêşî beşdaran kir:

*Ji bo nimûneya ku mirov dikare di jiyane de bi xwe jî rolekê di qedera xwe de bileyize, min birêz Perîşan Pêzan bijart. Va bûn dora bîst salan ew li derve dimîne. Bavê wî cotyarekî belengaz bû û Perîşan di nav tunebûnê û rewşeke aloz de mezin bû. Ew nuha ne tenê mirovekî rewşbaş e, lê her weha dinivîsîne û xwe wek rewşenbîr jî dizane.*

“Li dû pêşgotinê Perîşan wek kesekî ji xwe razî be xuya dikir. Tevî ku dê bêyî kaxez biaxafta jî berçavkek ji beriya xwe hanî der, da pêş çavên xwe û dest bi axaftinê kir:

*Birayên delal, Ez gellekî ji Mamoste Rojperest re spas dikim ku ez layiqe vê rolê dîm. Mixabin min tiştêk ji bo vî karê ku ji nişkan ve bo min hat dayîn amade nekiriye û ez ê hema li ser piyan çend gotinan bo xatirê Mamoste bikim.*

*Bi rastî jî yek dikare di qedera xwe da rolekê bilîze. Birayên min hemî bêsermiyan man û tiştêk ji wan derneket, lê ez bi qedera xwe razî nebûm. Tevî ku ez ti caran neçûbûm dibistanê jî ez dikarim xwe wek kesekî zana, wek rewşenbîrekî bi nav bikim. Min ta îro deh kitêb nivîsandine û gotarên min di rojnamên karkerên Kurdan ên li derve tîn weşandin de jî hene.*

*Berî herim derve ez ji gund çûm bajarekî mezin. Li wir tev gundiyekekî xwe di odeyêke kirê-erzan de dimam. Hevalekî me bi navê R. hebû*

ku carina dihat mala me, yan jî em diçûn mala wî. Va hevalê me em hokirin gellek tiştên di bajaran da diqewimin û çî heyf ku rast jî kesekî serserî bû, tevî ku di eynî wextê de bi dostên xwe re dilsoz bû. Me jê hej dikir tevî ku me dizanibû ji xeynî me kesekî nedixwest pê re hevaliyê bike. Rojekê hinek heşîş bi xwe re hanî mala me û em neçar kirin ku bi wî re heşîşê bikîşînin. Me berê got na, lê R. giriya û got, 'We ez biçûk kirim û pê hesandim ku hûn ne hevalên wefadar in.' Welhasil me pê re heşîş kişand. Me titûna di cixarene pêçayî de li ser kaxezekê rijand, kirtikek heşîş di nav de pelixand û li nav titûnê xist. Dû re me titûna bi heşîş car din berda nav cixareyên doçikpemî, yek ji wan vêxist û dest bi kişandina wê kir. Hemî xemên me li dû bîstekê ji nav hişên me rabûn û me dest bi kêr kir. Me hema li rûyên hev dinêrî û em dikeniyar. Carina yekî ji me dikir ku bipêyive, lê berî gotina xwe bi serî bike piqînî bi me diket û careke din kenekî dirêj – em ji kenan lal dibûn. Çawa kirtikekî weqa biçûk ji heşîşê dikaribû hemî xeman ji mêjiyên me derxe û me têxe nav dunyake bêxem, ez ecêb mam, helbet li dû hişyarbûnê!

Êvarekê hevalê me lawekî çardeh-panzdeh salî bi xwe re hanî mala me û dû re ji me xwazt ku em dest bavêjin lêwîk. Dema me got na, wî dîsa dest bi girî kir û got, 'Hûn xwe li hember min mezin dibînin, hûn ji min hej nakin.' Li dawiyê me bi a wî kir. Ji ber ku va cara yekê bû ku min û hevalê bi min re ode girtî tiştêkî weha dikir, em derheqê usûla destavêtina lawan de bêyî tecrûbe bûn. Nizanim çawa bû û sê-çar caran qîrîn bi lêwîk ket. Me hew dît ku deriyê me tê kutane. Me xwe kerr kir, lê derî dîsa û dîsa hat kutan û ez neçar mam dêrî vekim. Du polîs û cînarekî me li pêş dêrî bûn. Bi kurtî, jineke cînar hevalê me û lawikê pê re di çav xwe re kiribûn, ketibû gumanan, mêrê xwe haydar kiribû û wî jî li dû qîrîna lêwîk telefone polîsan kiribû û a nuha du polîs li pêş dêrî bûn. Polîsan em dan dû xwe û li jêr xistin otomobîla xwe. Lawik digiriya û em şermezar û çilmisî mabûn. Me bi rê ve çî pereyên bi me re hebûn, her weha saetên xwe, dan herdu polîsan, û şukur ji Xwedê re ku wan em û lêwîk serbest berdan, bi şertê ku em eynî êvarê ji odeya xwe derkevin, roja din kilîtê bidin delêl û nema li wê taxê vegerin.

“Li vir Perîşan, wekî ku ji nişkan ve ji ber van gotinên xwe ve şerm kiribe, fedok kenîya û bi dengêkî nîzm got: *Li qusûrê menêrin bo van gotinên min. Yek: em ciwan û bêtecrûbe bûn û du: ez bo xatirê Mamoste mecbûr bûm vê serpêhatiyê wek mînak bidim.*” Li dû ve şîrovekirinê wî bi dengê xwe yê qebe domand:

*Li dû wê olexanê min bi daxwaz û îsrar qedera xwe guhert û nema dest avêt heşîşê. Di eynî demê de nefreteke kûr derheqê destavêtina lawan de li cem min çêbû. Hevalê bi min re ode girtibû, li milê din, çû û bi hevalê me R. re odeyek girt. Dû re bû esrarkêşekî mezin; her weha “oxlanciyekî” di taxa xwe de navdar. Nizanim herdu nuha li ku ne, mirî yan sax in, ne jî dixwazim bizanibim. Tiştê muhîm ew e ku min rîyeke din bijart. Li welatê xerîbîyê min xwe bi keda xwe pêş ve bir, dû re zewicîm; û min zanîna xwe jî kûr kir, xwe bi xwe perwerde kir û pirtûkên kesên navdar xwendin, wek Marqîs, Lenîn, Rosa Luxemburg, Hegel, Pûşkîn, Tolstoy, Nazim Hîkmet, Sartre, Cegerxwîn, Ehmed Arif û gellekên din.*

“Li vir Rojperest xwe nêzîke Perîşên kir û çend gotin bi dengêkî nîzm jê re gotin. Bi texmîna min, jê re spas dikir û digot ku nimûneya wî dabû di cîh de bû û têrê dikir – bila li şûna xwe vegeriya. Perîşên axaftina xwe bi van peyvan bi dawî hanî:

*Bi kurtî, heger ne ji daxwaza min ya bi îsrar bûya, ez ê yan li gund mabûma û îroj bavê deh-duwazdeh kur û qîzên perîşan bûma, yan jî bû bûma esrarkêşekî, yan tew ‘oxlanciyekî,’ û heye ku îroj mirî, yan girtî bûma. Lê na, min qedera xwe du caran, ji du caran zêdetir bêguman, guhert û bi serbilindî dikarim xwe wek rewşenbîrekî gelê xwe bi nav bikim.*

“Rojperestî dest bi lêxistina çepikan kir û Perîşên axaftina xwe bi van gotinên di nav çepikan de hanî dawiyê:

*... û nuha hatime serîkî li welêt xim, lê mixabin, mixabin... – zor spas.*



“Perîşan, li maseya xwe vegeriya. Rojperest çû paş mîkrefonê û axaftina xwe bi van gotinan bi serî kir:

*Çend şêweyên din yê guherandina rêçikên qedere hene û yek ji wan ew şêweya ye dema mirovek, yan hejmareke ji mirovan, bi daxwaz û tevde rêçika qedera kesekî didin guherandin, guherandineke bi encamên baş yan bed. Lê ji ber kêmbûna demê em ê axaftina li ser wan şêweyan bihêlin careke din. Gellekî spas ji bo guhlêdana we birêzên hêja û bêguman spasiya me ji birêz Pêzan re heye ku hat alîkariya me û weha bi ciwanmêrî û vekirî nimûneyek da ku çawa mirov dikare di guherandina qedera xwe de xwedan rol be.*

“Beşdaran li çepikan dan, Aramo dîsa vegeriya paş mîkrefonê, spasiya Kadirê Rojperest kir û Bêwar Ramanî vexwand ser mîkrefonê, da ku axaftina derheqê “beşekî ji dîroka welatê me” de pêşkêş bike.

“Ramanî, peyakî lihevhatî û porşehkirî, mirovekî ji ewên ku dengên wan bi mîkrefonan xweş derdikevin bû. Kaxezeke biçûk ji beriya saqo ya aliyê rastê derxist, piçekî lê niherî û dest bi axaftinê kir:

*Braderanî xoşewîst! Sereta daway lêbordîna ekem ke netwanîm otarekî le derbarey mêjûy welatekeman da êsta bo êwe braderanî berêz peşkes bekem. Min bo berêz Aramo behsî otarî xom kirdibû, belam be daxewa sê saet le pêş destpêkirdinî em kombûnêwe sozî dam berpîrsekî em şare ke hîç şitekî sebarêt be mêjûyî xakî xoman nelêm. Kabraderanî muxaberat le minî dawxwaz kirdin ke behsî şitekî tir bekem we minîş êsta behsî înaqîlabekî leşgerî ekem ke hîç be çî şêwe peywendî le gel salanî raberdû we yan em welate xoşewîste niye. Min le derbarey înaqîlabekî le dijî pênuş qise dekem ke tenya xeyalî ye we peywendî hîç be çî core legel em welate niye. Wekû diyar e le'm welate înaqîlabekî le dijî pênuş eslen mumkin niye we pênuş l'em welatane her azad we serbexo bûwa, le katî nûsandinî tewrat û încîl û quranî pîrozewa ta nûsandinî destûrekanî dewletanî em herême...*

“Li vir Aramo xwe gîhand Ramanî û ew haydarî tiştêkî kir. Ramanî serê xwe hejand, wekî ku gotina wî fêhm kiribe, got: “De baş e canekem,” û şêweya axaftina xwe guhert û domand:

*Bibexşînin birêzan. Ji bîr çû ku divêt li vir bi şêweya din bipeyivim. Ji çakbextiyê û bi saya zewaca bav û daya min, ku her yek ji wan bi şêweya herêmeke Tarê dipeyive, ez bi herduyan dizanim. Ez vegerim serpêhatiya xeyalî: Li welatekî bi navê Komara Mokratê înaqîlabeke leşgerî cîh girt, înaqîlabeke li dij pênûsê. Destpêkê tenê girtin û êşkencekirina pênûsan hebû, bi mebesta ku ew bihên tirsandin û li dij dewletê kar nekin. Lê serleşger bi tevahî negihîştin amancên xwe, çimkî pênûsine serhişk her li dij ramanên serdariya hêzên leşgerî nivîsandin û daxwaza cîhgirtina hilbijartinên azad kirin, daxwazeke li dij mentiqê, çimkî cîhgirtina hilbijartinên azad ne ji erf û toreyên herêmê bû, ne jî ligor tenbeyên berpîrsên ola xelkê welatên herêmê bû. Wekî ku berpîrsan bi xwe digotin, ramanên wisa ji derve hatibûn û li dij toreyên ‘mokratîkî’ bûn. Lewma ceneralan şerekî berfireh li dij pênûsan bi rê xistin, şerê ku domand ta ku hemî pênûsên welêt hatin şkandin, girtin, yan revîyan derve. Pirtûkên rewşenî, rojnameyên serbixwe, kovarên rexnegir, nivîsarên lîberal bo filiman û şanoyan, şêwene ji helbestan û hinek berhemên ku ligor ceneralan ‘bo amancên derveyî ketibûn herêmê da ku ziyane bigihînin berjewendiya gel û welêt,’ hemî ji holê hatin rakirin. Serdaran va encama li xwe û ‘li gel’ pîroz kirin û behsa qonaxeke nû di dîroka Komara Mokratîk de kirin. Lê salek derbas bû bû, nebû bû, dema çend pênûsan careke din dest bi nivîsandinê kirin û li vir nûçeyekê, li wir helbestekê, li cîhekî din belavokekê û li yekî din kurteçîrokekê xwe gîhandin destên xwendevanên bi meraq. Polîsên komarê çî kirin, çî nekirin, nikaribûn pênûsekê bi cîh bikin, lê li dû êşkencekirin û kujtina bi dehan kes têgihîştin ku perrên hinek teyran xwe xistine şûna pênûsan. Bi encama vê yekê hemî teyrên ku perrên wan dikaribûn ji bo nivîsandinê bihatana bikarhanîn hatin girtin û di navendên di bin serpereştîya dewletê de hatin bicîhkirin, ew jî li dû ku Rêxistina Hevalên Teyran li welatine biyanî tevdêrên kujtina wan şermezar kirin.*

*Berpîrsên Komara Mokratê dest bi propagandayeke berfireh li dij teyran kiribûn, digotin ku "Zîça wan ziyânê digihîne xaniyên dîrokî li bajarên me û heye ku tew çanda me jî gemarî bike." Li dawiya dawiyê hat pejirandin ku hemî teyrên per-û-zîç-tehlûke di navendên taybet de bihên bicîhkirin, bi şertê ku welatine dewlemend, yên ku rê didan çalakîyên Rêxistina Hevalên Teyran mesrefê wan navendan bidin. Wisa jî dewletê xwe careke din pîroz kir û rojeke neteweyî ji aliyê ceneralan ve hat binavkirin: Roja Serkevîna li dij Perrên Teyrên Ajan. Li dû çend heyvan îstîxbaratên dewletê pê hesiyar ku nivîsine kurt li ser textikan dihên weşandine. Li dû bikarhanîna pîsporan û birêxistina lêkolîn û lêniherînên dûr û dirêj têgihîştin ku mîxan şûna pênuşan û perrên teyran girtine. Bi encama vê yekê dewletê dest da ser şûnên çêkirina mîxan û tenê bi jimar mîx li dezgehên pîşesazî ku hewcedarî bi wan hebûn belav kirin. Dayîreyeke bi navê Dayîreya Belavkirin û Şopandîna Mîxan dest bi kar kir. Her babetekî mîxan bû xwediyê navekî, jimareke taybet û dosyakê. Mîxên ji derve dihatin ger ligor mercên qanûnî yên mokratî nehatibûna çêkirin li ser sînor dihatin girtin. Di çapemeniya derve de raportên corbicor derheqê girtina mîxan de dihatin weşandin. Ligor yekê ji wan, kesên ku mîxên neqanûnî di çenteyên xwe de vedişartin û van mîxan bi wan re dihatin girtin, polîsan ew neçar dikirin ku mîxan daqultînin, û ger mîx pîr dirêj bûna di xwe re kin. Tew raporteke rêxistineke muxalefetê li derve iddî'a kiribû ku mîxên qaçax, ger wek "mîxên nivîsamanc" di deftera polîsan de bihatana binavkirin, ew li navendên êşkencekirinê dibûn hacetên êşandina beşên nazik ji giyanên qaçaxciyan.*

*Rewşê weha domand ta ku nivîs bi tevahî ket dest dezgehên dewletê. Tenê karmendên wê dikaribûn binivîsînin, ew jî ligor merc û bendên fermî. Şagirtên xwendegehên divabû hemî imtîhanên xwe bi şêweyê devokî bidin; bazirganan divabû navên muşteriyên xwe û deynên li wan li ser kasêtan dagirin; xwediyên nameyan divabû nameyên xwe li nik dayîreyeke taybet bidin nivîsandin; û her xwaringehê delalek li pêş deriyê xwe bi cîh kiribû, da ku li şûna listeyan ji xelkê re bi deng ragihînin ka çi babetên xwarinê lê hebûn. Dewletê li zanîngehan kûrsên bi navê*

Hunera Bilind ya Ragîhandina Dengî bi rê xistin. Ewên van kûrsan bi radeyên bilind bi serî dikirin ji heqê karê xwe dihatin der. Bo nimûne, xwaringehên navdar kesên weha bi kar dihanîn ku dikaribûn navê xwarinekê bi gellek rengên dengî bigotana. Xwarineke wek tîrşîka bamiyan, wek mînak, bi şêwe û mêlodyên rengereng ji aliyê van pisporan ve dihat binavkirin. Heye ku carekê wek ‘tîrşîka bamiyaaaaaaaa’ û bi dengekî zirav ew bi nav bikirana. Heye ku wek “tîrşiiiiiiik ya bamiyan” bi dengekî qebe, yan wek ‘tîrrrrrşîka baaaaaamiyan’ û bi dengekî qalind û giran... Rewşê bi salan wisa domand û nîfşê nû hema-hema êdî fêrî jiyana dengî-devokî ya bêyî nivîs bû.

Hinekan ji danîştvanên paytextê Komara Mokratê ji çavên xwe bawer nekirin dema rojekê li ser dîwarekî kolaneke navenda bajêr peyvên “PÊNÛS DIJÎ” dîtin. Ji ber ku li vê herêmê ji hezarsalan û vir ve tişteki adetî bû ku mirov razeke hev û din bikin, nivîsên li ser dîwaran roj li dû rojê bêtir bûn. Gotinê naxwaze ku polîsên dewletên vê herêmê jî gellekî zîrek in û dikarin di nav roj û şevekê de tawanbaran bi dest xin. Lewma dirêj nekir polîsan aşkere kirin ku beşikine babetekî ji kevîran karê pênuşê dikine. Ji vir û şûn ve xwetêkilkirina bi her kevîrê ku dikaribû ji bo nivîsê bihata bikarhanîn re hat qedexekirin û ger kevîrê nivîsger bi kesekî re bihata girtin divabû bi wî kevîrî li serê xwe xista ta ku xwîn jê dihat der, yan ta ku gêj dibû û diket.

Ligel hemî bizav û kiryarên dewletê jî nivîsandin ranewestiya. Hinek kesên ku bi nexweşiya nivîsê ketibûn, kesên ku dewletê wek “nivîskêş” bi nav dikirin, dest pê kiribûn xwe bi xwe brîn bikin û bi xwîna xwe binivîsin. Hêdî-hêdî va yeka bû modayek û ket nav ciwanên sinifên bilind ji xwendegehên navend û yên zanîngehan. Wan bi derziyan xwîn ji xwe û ji hev û din dikişandin û bi wê nivîs û çînik li ser kaxez û kartonan bi cîh dikirin û berhemên xwe bi dîwar û stûnên li ser kolanan dixistin. Tew hinek ciwanên tolaz yê bajarên mezin peyvên bi çînikên hunerî li ser memikan, yan textên kûnan bi cîh dikirin, modayeke ku dest pê kiribû li bajarine ewropayî, tevî ku li wan deran nivîs û çînik ne qedexe bûn jî, têkevin kar. Dû re kesine belengaz dest pê kirin xwîna xwe bifroşin

kesine dewlemend û nivdewlemend, çimkî nivîs êdî bû bû wek sewdayekê, em bibêjin: wek kişandina esrarê bo esrarkêşên ji çîna bûrciwazî. Dewlet neçar ma akadêmiyekê bo hêzeke taybet damezirîne û wê hêzê li dij nivîskêşan bi kar bihîne. Segên pispor yê şopajotina xwîne ji derve hatin kirîn û ketin ber kar. Ligel ku welatine ewropayî qedexekirina nivîsê li Mokratê şermezar dikirin jî, bazirganiya di navbera wan û wê de geş bû, çimkî van segên pispor bi nerxekî bilind ji heman dewletan dihatin kirîn. Vê bazirganiyê aşkere cîh digirt, tevî ku hukûmetên van welatan dizanibûn ku şirketên segfiroş yê welatên wan di rastiyê de seg ji bo amanca berbandkirina nivîsê difrotin û van segan li dij xelkê Mokratê diketin kar. Dema mîdyaya wan dest bi rexnegirtina li vê yekê kir berpîrsên dewletên segfiroş gotin ku amanca wan ne piştgiriya berbandkirina nivîsê ye, lê ew e ku bikarhanîna xwîne bihêr rawestandin, çimkî bikarhanîna wê bi vê şeweya ku li Mokratê dibû dikaribû bibûya sedema belavbûna nexweşiyên mirovkuj. Rêxistinên muxalefetê yê van welatan berê ew bizava kirin ku vê pîrsê di dest xwe de li dij partiyên desthilatdar bikin qulp, lê dû re dest jê berdan, li dû ku birêvebirên şirketên segfiroş bi dizî, di navbera xwe û serdarên wan rêxistinan de, gef xwarin ger ew vê rexnegiriya xwe bidomînin diyariyên aborî dê di demên hîlbijartinan de nema bo rêxistinên wan bihatana pêşkêşkirin.

Bi alîkariya segên pispor û teknolojiya nûjen bi hezaran kesên nivîskêş hatin girtin, lê her weha bi sedan kesên bêtawan. Bo nimûne, bavê zarokeke çar salî hatibû girtin û li dû êşkenceyêke dûr û dirêj gotibû, ku erê wî bi xwe destê qîza xwe ya çar salî brîn kiribû, da ku bi xwîna wê binivîse. Ji bo vê tawanê Dadgeha Parastina Komarê ji Nivîsên Ziyanafer cezayê neh sal girtin dabû vî kesî. Lê ligor beyannameyêke rêxistineke mafên mirovan ya li derve, ew bavê hatî girtin, êşkencekirin û sizakirin kesekî nexwende bû. Ne tenê ev. Dihat gotin ku ew mirîdê şêxekî bû ku terîqeta wî nivîsa bi xwîne wek kiryareke li dij daxwaza Xwedê bi nav dikir. Ligor cînarên wî, zaroka brîndar xwe bi şefreyêke li ser erdê hatî dîtin brîn kiribû. Dewleta Mokratê ji aliyê xwe ve va rêxistina mafên mirovan wek rêxistineke ketî bin bandora neyarên wê bi nav kir û ragîhand, ew ê peywendiyên dîplomatî bi welatê rêxistin lê

dimîne re bi dawî bîne û dê nema çekên xwe, ne jî segên xwe, jê bikire, ger karbidestiya wî welatî careke din rê bida rêxistinê ku tiliyên xwe têxe nav pirsên hindirîn yên Komara Mokratê . Dewletê her weha ragîhandineke bi vîdyo di televizyonê de raber kir ku xuya dikir çawa segên pispor çîlikên xwînê di mala wî kesê hatî sizakirin de dîtibûn. Heta kirasê keçikê jî hatibû raberkirin. Axifgerekî mokratî yê wezaretê peywendiyên derve bi hêrs gotibû, “Li şûna ku rêxistinên mafên mirovan brînkirina keçeke çar salî ji aliyê bavekî dîn ve şermezar bikin, ew ji ber bicîhkirina qanûnê rexneyan li Komara me ya ku ji bo demokrasîyê, azadîyê û wekhevîyê (ku nimûneyeke herêmi ye) digirin.” Derheqê “iddî’ayên” ku bavê keçê nexwende ye û mirîdekî terîqetêke li dij nivîsê ye de, axifgêr kaxezek raberî kamêrayên televizyonê kiribû, kaxezêke ku li ser wê van peyvan û îmzeyek hebûn: “Nawe min Betrettin. Min girt ji keçikê xwîn.” Axifgerê Mokratê li vir şaşiyek kiribû û va şaşiya wî tevahiya bizava wî ne ku tenê bêyî sûd hîştibû, lê rexneyên rêxistinên mafên mirovan tûjtir kiribûn. Gotina wî ku keça çar salî “ji aliyê bavekî dîn ve” hatiye brînkirin di dest du rêxistinên de bû qulp. Wan di beyannameyên xwe de ragîhandin, “Ger axifgerê Komara Mokratê bi xwe dibêje ku 9 sal siza bo mirovekî dîn hatine dayîn, gotina wî îspatek e ku dewleta wî rêz heta ji mafên dînan re jî niye. Kesê dîn ji bo kiryarên xwe ne berpîrs e. Divêt têkeve bin serpereştîya pisporên li nexweşxaneyên taybet! Li milê din, weha ligor rêxistinê, dema ew mirovekî dîn 9 salan di girtîgehê de bihêlin ew ê li derketinê bi kêmasî 9 caran ji berê dîntir bibe. Jê bêtir: ger yê dîn di girtîgehê de hefteyê kesekî bi xwe re dîn bike, bi encamê û li dû 9 salan 468 dîn ê bi egera vê kiryara şaş li Mokratê zêde bibin. Bi gotineke din, dîsa ligor rêxistinê, gellek kesên baqil dikevin girtîgehên vî welatî dê dîn jê derkevin. Ger salê hema tenê sed dîn li vî welatî bînin girtin û her yek ji wan di dema girtina xwe de bi dehan, yan tew bi sedan kes bi xwe re dîn bike, ji xwe re bide ber çav ka her deh salan carê girtîgehên Komara Mokratê dikarin çend dînan ji xwe derînin! Lewma baştir e Mokratê kêşeya dînan, ger rast dîn bin, bi rêyên din çareser bike. Ligor me, li berjewendîya Mokratê bi xwe ye ku va mirovê hatî girtin têkeve bin destên pisporên nexweşxaneyên nefsi, ne girtîgehê.”

*Berpirsekî Komara Mokratê qerf û henekên xwe bi têbiniyên herdu rêxistinên mafên mirovan kirin û di konferenseke bo mîdyayê de ragîhand:*

*“Îspatên di dest de wê yekê raber dikin ku girtîgehên Mokratê baştirîn şûnên çareserkirina nexweşiyên derûnî ne, ew jî bi erzantirîn şêwe.”*

*Di hevpeyvîneke televiyonî de, berpirsî bi ken li ser gotina xwe zêde kir û got:*

*“Ewên li dewletên rojavayî bawer nakin, bila dînên xwe ji me re rêbikin. Bila hema ji sedî 10ê pereyên didin pisporan û pişîşkan bidin me, em ê dînên wan baqil bikin û li dû çend mehan sax û selamet li wan vegeirînin.”*

*Ji ber ku li hinek herêmên Afrîkayê komine bêhêz ji xelkê ji aliyê komine hêzdar ve dihatin hingavtin û talankirin, yan tew tune kirin: modeyeke ku wek “pakkirina etnîkî” dihat bibavkirin, rêxistinên mafên mirovan bi wan herêman ve mejûl bûn û dema wan bo gengeşeyên bi berpirs û berdevkên Komara Mokratê re nema. Li dawiya dawiyê wan dest ji vê mijarê berdan û bavê keça xwe brîn kiribû li Mokratê her girtî ma.*

*“Bêwar Ramanî gotara xwe weha domand:*

*Birayên birêz! Wek min di destpêkê de got, va berhema ku ez ji we re dixwênime bi ser û binê xwe ve çîrokeke xeyalî ye, lê carina di jiyane de xeyal û rastî li nav hev dikevin û mirov nema dizane ka kîjan beşên jiyana wî xeyalî û kîjan ne xeyalî ne. Ma kî dikare sond bixwe ku va kombûna me li vir ne xeyalî ye?*

*“Li vir careke din tiştêkî ku ez ne li bendê bûm qewimî. Ramanî ji bo bîstekê axaftina xwe eware kir, stuyê xwe çend caran çep û rast bada, wekî ku li kesekî digeriya. Dû re destê xwe ber bi yekî ji me heft mêvanan ve dirêj kir û domand:*

*Rê bidin ez birêz Ronî Kaşanî bi we bidim nasîn. Mirov dikare bibêje Seyda yek ji wan kesan bû ku bi encama tevgera li dij pênuşê reviyabûn Ewropayê. Hêzên asayîşê yên wê demê pênuşek di mala wî de dîtibûn û pênuşa wî li pêş çavên wî êşkence kiribûn. Pênuş weqa hatibû lêdan ku beşekî wê şkestibû, firriyabû û di çavekî Seyda de bi cîh bû bû. Tevî ku bi encama brînbûna çavê xwe di rewşeke bed de bû jî, ew hatibû girtin û çend mehan di girtîgehê de mabû, ber bi kefalet bihêt berdan. Ji ber tirsê ku dîsa bihêt girtin ew bi alîkariya rêxistina xwe ji welêt derketibû û ji wê demê û vir ve li welatekî bakurê Ewropayê dimîne.*

*Li welatê ewropayî pijişkekî navdar yê bi navê Dr. Frederik Eriksen beşê şkestî ji pênuşa hatî êşkencekirin ji çavê Seyda derxist. Bi saya inîsyatîva Navenda Alîkirina Penaberên Êşkence-dîtinî, pejirandina wezareta tenduristiyê, û bêguman zîrekiya Dr. Eriksen, Kaşanî ne tenê hinek ji ronahiya çavê xwe dîsa bi dest xist, lê her weha piçek jî ji pênuşa xwe. Dû re, bi alîkariya aborî ji Dayîreya Sosyalê û keda muhendisên şirketeke navdar ya wî welatî, ew beşikê biçûk yê pênuşa Seyda di pênuşeke nû de hat bicîhkirin. Seyda pênuşa xwe ya nû bi çavên tijî hêstir maç kir û sond xwar ku heta welat ji lepên leşgerî rizgar nebe ew ê ji bilî vê pênuşê destê xwe bi yeke din neke. Bêyî dirêj bikim, de ji rindiya xwe bixêrhatineke germ li Mamoste Ronî Kaşanî bikin.*

“Kaşanî jî wek mêvanê ber xwe ket hev û ji ber vê vexwandina ku ne li bendê bû veciniqî. Bêguman wî dê tenbeyên li me mêvanan bûnî jî hanîbin bîra xwe. Lê Aramo xwe gîhandê, dest dayê, çend peyv di guhekî wî de hanîn ser zimên, bi xwe ket pêşiya wî û ew bir ser sehneyê.

“Beşdar bi şeweya ku Aramo mêvanê xwe derbasî ser sehneyê dikir kenîyan û dengê çepikan salon hejand. Bixêrhatineke germ li Kaşanî hat kirin, heta kesên li dor pênc-şeş maseyan rabûn ser lingan jî. Rewşeke wilo seyr li pêş çavan bû ku mirov diket gumanê ka xewn bû yan rastî.



“Kaşanî, yekî ji me heft mêvanan, peyakî hûrikî dora şêst salî bû. Nîvê porê wî weşiyabû û berçavkeke reşavîn li ber çavan bû. Dema gihîşt mîkrefonê baş diyar bû ku ew bi encama vê pêşwazîlêkirina germ kelgirî bû bû. Wî dest da Ramanî, herduyan rûyên hev û din sê caran maç kirin; û dû re xwe gîhand paş mîkrefonê, destmalek ji beriya xwe derxist, pozê xwe pê damala û kir ku bipeyive, lê mîkrefon piçekî bilind bû. Tenê li dû ku Ramanî hat hawara wî û mîkrefon jê re daxist wî dest bi axaftina xwe kir:

*Dostên qedirbilind! Ji bo vê pêşwaziya germ gellekî spas dikim. Spas ji Mamoste Ramanî û Aramo Efendî re ku va fersanda dan min. Ez bajarê Tarê ji rojên zarokiya xwe ve dinasim. Tar ji bo min ne bajarekî xerîb e. Dema ez ji otûbûsê daketim û bêhna bayê wê ket pozê min ez daniştim û min xweliya erdê Tarê maç kir. Ez ê ji vir derbasî cîhekî din bibûma, lê em li Çayxaneyaya Aramo Efendî bûn mêvan û min di dilê xwe de dizanibû ku ji bo mayîna me li vir sedem hene. Gellekî kêfxweş im ku texmîna min di cîh de derket û va ye ez li pêş we beşdarên ezîz li paş mîkrefonê me.*

“Hinek mêvanên ku têngihîştibûn ka mebesta wî bi wan gotinên dawîn çî bû li hev dinihêrîn. Gupegup bi dilê min jî ket û ez tirsiyam Kaşanî germ bûbe û xwe ji bîr kiribe. Aramo xwe ber bi min bada, li çavên min neherî û hindik mabû ji şûna xwe rabe, lê ji çakbextiyê Kaşanî bêtir derbarê me û mayîna me de negot û weha domand:

*Navê komara Mamoste Ramanî di çîroka xwe ya xeyalî de behsê kiribû ne grîng e. Mokrat dibe, Termokrat dibe, Hişkistan dibe yan Kişkistan, ne grîng e – tiştê grîng pêûs e.*

*Peyva pêûs ji du beşan pêk dihêt: ‘pê’ û ‘nûs.’ Pê ji ‘bi wê’ hatiye û ‘nûs’ ji ‘nivîs.’ Bi gotineke din, pêûs wateya tiştê ku bi wê dihêt nivîsandin dide. Lê ‘pê’ dikare her weha xwebêja ling bide. Bo nimûne, peyva ‘pêlav’ bi bîr wînin, yan hevokên ‘Wî pêlê kir’ û ‘Em li ser piyan man.’ Bi gotineke din, peyva pêûs ne yekwate, lê duwate ye: tiştê ku mirov pê dinivîsîne û nivîsandina bi lingan. Her hal hûn dizanin ku bi inglîzî jî ji pêûsê re “pen” dihêt gotin, peyva ku divêt wek “pên” bihêt ser zimên. PEN her weha rêxistina*

*nivîskarên cîhanê ye. Ligel ku hejmara herî bilind ji nivîskarên welatên rojava tê de ne endam in, ez bi xwe ji salan û vir ve ye ku endamê PEN'ê me, bêyî ku berhemeke xwe jî bidim wan. Rojnameya sosyaldemokratan, Xwedê ji wan razî be, wêneya beşê şkestî ji pêûsa min di rûpeleke xwe de weşandibû û bi encamê ez rasterast wek endamê PEN'ê hatibûm qeydkirin.*

*Berî ez ji welêt biçim der, min pîrriya çar bi lingê xwe dinivîsand. Lê ji ber ku ji sed hevvelatîyên min du kesan jî bi xwendinê nedizanibûn, hema çî bihata nivîsandin jî baş bû, çimkî bi saya min û çend kesên wek min nivîs nemir û namire jî. Ya rast, ber îngîlaba li dijî pêûsê jî dewlet li dijî pêûsa min bû çimkî nivîsa min ji aliyê rastê diçû yê çepê, li şûna ku ligor qanûna nû ji çepê biçûya rastê. Her weha ji ber wê yekê ve ku peyvîne di nivîsarîne min de di ferhenga fermî de nedihatî dîtin. Bi kurtî û bêyî ku ez serê we biêşînim, me xwe gîhand derve. Va bûn hevdeh sal ez li wir im, lê ji min bawer bikin ku min hîn xewnek jî bi zimanê wî welatî nedîtiye, ligel ku ez endamê PEN'a wir im jî. Hemî xewnên min li Tarê û ji Tarê ne, û gotinê nexwaze ku seranserê xwendin û nivîsandina min jî bi zimanê tarî ye. Ez tevahiya goştê ga û masiyên welatê ez lê bi nan û pîvaza Tarê nadim, ligel ku ez li wir endamê PEN'ê me jî. Belê! We maf heye bipîrsin, heger wisa be de tu çima venagerî welêt Seyda?! Bersîv gellekî hêsan e. Ma gelo berpîrsên par yên dewletê çî nan û pîvaz ji me re hîştîbûn ku em lê vegezin? Dem derbas bû û temenê min nuha li dor şêst salan e. Ez dizanim ku gelê min ê li min xwedî derkeve û ez ji birçîna namîrîm, lê her weha dizanim ku gel bi xwe perîşan e û naxwazim pariyê nanê zarokên wan û zîllîkê nav pîvaza wan têkevin devê min. Li milê din, tevî ku dewleta îroj rê dide serîlêdana min jî, ne bawer im ku ew ê rê bide vegera pêûsa min, ya ku li derve ji karê xwe eware nebûye. Bo nimûne, hema hefteyekê ber bi rê kevîm pêûsa min helbestek ji xwe barand; bawer dikim di bêriya min de ye! Ha va ye; ez ê wê ji bo we dilsozan bikim diyarî:*

*Li pêş çavên min dîmena şivanekî rûkenok e;  
Beranê bi zengil daye dû û li paş wan kerî di rê de.  
Ey Xwedê! Min vegeirîne zozanên bihara min*

*Û têxe nav komeke bêrîvanan.*

*Duh bûm siwarê keştiyeke vî bajarê sar,  
Tê de ketim nav xewn û xeyalên demên par.*

*Pêlên deryayê keştî hejandin,  
Rûviyên zikê min li hev gerandin  
Û vereşiyam ez bêyî hemdê xwe:  
Ax, ax! Hespeke Tarê nadim bi hezar keştiyan!*

*Wê şevê di xewnê de bûm xortekî bîst salî  
Li ser piştê kimêteke boze rehwanî:  
De bajo siwaro, bajo!  
Dî destê te de hevsarê bi lîwan e,  
Dî nav sîng de dilekî liyan e.  
De li xar ke sivîko hespa te rehwan e,  
Ya dilê te dixwaze bike, ma ne dawî her neman e!*

*De bajo teyro, li xar ke wê kihêlê,  
Bila te bibe pêş konê qîza serokêlê,  
Va demeke Narîn ji xewê bêpar e,  
Pismam li bendê ye wek segê har e,  
Dilê wê jî tenê bi dilê te re yar e.  
De bajo sivîko, bajo, roj şkest êdî êvar e,  
Xwe bigihîne Narînê, pêşiya we bihar e.*

*Lê wey wax li minê, umrê çûyî venagere,  
Pê hesiyam ku evîna min tenê raman û xeyal e,  
De bigirî rebeno, bigirî, derdê te ji derdan yekî bêçar e.*

“Beşdaran dan çepikan, hinek ji wan rabûn ser lingan, çendekan defterên berîyan jê re birin da ku ji wan re îmze bike, çavên Seyda şil bûn, Ramanî çû rûyê wî, dest dayê û Aramo xwe gîhand wan, dest da herduyan.

“Li dû axaftina Ronî Kaşanî du-sê kesên din, her yek ji bo kurtedemekê, peyivîn, lê gotinên wan ji bo min ne balkêş bûn, yan heye ku wekî ne balkêş dihatin bihîstin, ji ber ku axaftin zêde bû

bûn û êdî dereng bû. Li milê din, hişên min xwe bi axaftina Kaşanî ve mijûl kiribûn. Ji bo min aşkere bû ku Kaşanî ne bêriya welêt, lê bîre ciwaniya xwe kiribû, û ew “nan û pîvaza” wî behsê dikir ji ramanêke mêlankolî ya romantîkî pê ve ne tişt bû. Wekî ji helbesta pênuşa wî jî diyar bû, di kûraniya dilê Seyda de gellek meroqên bi ber bayê çerxa felekê ketinî hebûn, wek meroqa li evîndariya xortekî bîst salî, bi zerî yan esmerekê çeleng re; wek meroqa li siwarbûna hespeke wek ya bokeyekî straneke gelêrî. Çi heyf ku van meroqên wî dê her stewr bimana, wek xewnên ji xeyalê, xewnên ku dê cara dawîn di nexweşxaneyêke paytextê welatê li bakurê Ewropayê de di nav hişên wî re derbas bibûna. Ger berî mirinê rojek bihata û tew ligel pênuşa xwe veqerîya jî, hêviya ku wî ji ‘gel’ dikir ê her wek xewn bima; çavên wî dê ji dîmena resen ya şivanê rûkenok û nêriyê bi zengil bêpar bimana; û derbarê Narîne û hespa bi lîwan de – tenê kesên wêrek û bêxem dikarin xwe bigihênin lêvên Narînan û li hespên kimête rehwan siwar bin, ne kesên wek ‘seyda’ yê li welatên dûr ketinî dehfa demê û qedere. Heye ku ji bo wî bi xwe û ji bo her kesî baştir bûya ku ew û pênuşa xwe li derve bimana. Lê çawa be jî, xweşbextî ye ku pênuş li ku bin jî dikarin xewnên bi wêne biafirînin.

“Kombûnê ta berbanga roja duşemê domand. Li dû belavbûna beşdaran, me hew dît ku Halo di nav me de tune. Ez dû re pê hesiyam ku Efrîto Aramo di cîh de agahdar kiribûye dema Halo bi beşdarekî kombûnê re, hema bîstekê pêş kutabûna axaftina dawîn, derketibû. Wisa diyar e ku Aramo yê Halo bi xwe re biribû dinasî, lê baştir dîtibû bi pê wan nekeve, çimkî ew kesa ne tenê wek Halo ji binemala Reşbextiyar bû, lê di van demên dawîn de bû bû endamê rêxistineke ku wî wek yeke rêhişk dihesiband û baştir didît jê dûr bimîne.”

\*\*\*

Roja duşemê her şeş mêvanên Aramo, nuha ku Halo nema bi wan re bû, hema-hema ta danê êvarê di odeyên xwe de man û pirraniya demê di xew de bûn. Bo êvara duşemê, Aramo ji wan re xwarineke herêmî û şevbirkeke balkêş amade kiribû. Dengbêjekî

navdarî gelêrî ji herêmê ta nîvê şevê stran ji mêvanan re gotin û ew bi encamê gellekî kêfxweş bûn û demeke xweş derbas kirin.

Roja din, roja sêşemê, hema bi rojhilat re Aramo mêvan li otomobîleke hatî kirêkirin siwar kirin û birin gera li hinek şûnên nêzikî bajêr. Êdî mêvanan dest pê kiribûn bi hev re bipeyivin. Li vergerê Aramo, yê ku bi xwe otomobîl diajot, dîsa ew agahdar kirin ku Leheng Axa dê roja îniyê bigihîşta Tarê û bi wan re danişta, ku ew ji bo vê yekê mêvanên wî bûn. Got ku kombûna roja îniyê gellekî ji bo Tarê û berjewendiya xelkê wê grîng bû û Leheng hebûna wan di vê kombûnê de pêwîst dîtibû. Aramo her weha aşkere kir ku derbarê Halo de şaşiyeke cîh girtibû, şaşiyeke ku bo cîhgirtina wê kesek ne tawanbar bû. Di heman roja ku ew ji paytextê dewletê gihîştibû Tarê de çaverê dihatiye kirin ku şarezayekî bi navê Dalo jî bigihîşta. Ji ber ku şarezayê navdar li paytextê dewletê hatibû girtin û di otobûsa ji wir gihîştî Tarê de kesekî bi navê Halo hebû. Wî, Aramo, weha texmîn kiribûye ku Halo Mamoste Dalo ye. Aramo got: “Ez bi rastî jî mat mam ku çawa mamoste hîn weha ciwan bû. Dû re ez li vê kiryara xwe û li Halo ketim gumanan, lê êdî dereng bû, şaşî carê bû bû.”

Li dû vegera li salonê Aramo ji mêvanan tika kir ku dîsa wek berê her yek li paş maseyekê danişe. Aramo got: “Gellekî grîng e ku her yek ji we birêzên hêja bi serê xwe be, ta gihîştina Leheng Axa. Ez jî nizanim çima, lê weha tenbe li min hatiye kirin. Kêmasiyên me bibexşînin.” Her weha ew agahdar kirin ku roja li pêş, roja çarşemê, mêvanekî din ê bigihîşta û divabû ew jî bi serê xwe bimaya. Li dû xwarina şîvê û vexwarina çayê mêvanên ku nuha mest bû bûn çûn odayên xwe.

Leheng Axa, baştir dîtibû ku mêvan, ta mumkûn bû, bi serê xwe bimana ta cîhgirtina kombûnê, çimkî ditirsiya jihevnezîkbûna wan bibûya egera têkçûna disîplînê. Lê dema girtina biryarê, wî nedizanibû ku kombûn ê bi paş keve. Aramo, li milê din, ev daxwaza wî, bi taybetî di destpêkê de, ji ceddîbûna wê ceddîtir girtibû.

Em ê nuha dîsa li bajarokê Avdarê vegerin û biçin mala Melle Boyarî.

Carine wisa dibe ku bi lêdana deriyê malê re mirov dizane tişteki ne ji xêrê re li pêş e. Melle Boyar, yê ku roja çarşemê li bajarokê Avdarê tev endamên malbata xwe li ser xwarina şivê bû, di cîh de va yeka hest kir dema deriyê hewşa wan hat lêdan. Ca ji rojan îroj Helîmê xwarineke ku wî pîr jê hej dikir çêkiribû.

Herdu peyayên derbasî hewşê bûnî ne namo bûn. Ew ji gundê Bêçarê bûn û ji dûr ve meriyên Melle bûn. Kurê Melle yê biçûk bavê xwe haydarî hatina wan kir û gotê ku “Apê Remo û Zekoyê Hado dixwazin te zû bibînin.” Melle sifre li şûnê hişt û bi lez çû odeya mêvanan. Bêhna xwêdana binê çengan û dûyê cigareyan ji herdu peyan dihat. Çavên wan yên melûl di kortikên rûyên bêreng de bi xeman dagirtî bûn. Devên wan hişk û dengên wan kelgirî bûn. Herdu peyayên ku salên wan pênçer derbas kiribûn revîyan destên Melle, tişteki ku wan berê çî caran nekiribû. Çîqa Melle mirovekî mêvanhej û destfireh bû jî dîtina van herdu mirovan bi vê şêweyê li keyfa wî nehat. Ya rast, di kûraniya dilê wî de ew meraqa hebû ku biqîre û wan biqewitîne. Dîtina wan bi vî rengî giyanê wî giran, bêhna wî teng û dilê wî sar kir, lê di nav civatên rojhilatî de mêvan mêvan e û mazûvan maf niye mêvên biqewitîne, û hîn bi ser de rolên Melletiyê û merîtiyê jî!

Gundê Bêçarê jî berê yê Kaşan Begê bû. Li dû mirina wî du binemalên li gund diman lê ase bûn. Binemalek, Mala Mîrnasê Şekarî ji dûr ve digihîst êla Kaşan Begê bi xwe. Endamên binemala din, Mala Karoyê Reşbextî, ji dûr ve meriyên Melle Boyar bûn. Ji

ber ku gundên Kaşan Begê pirr, kurên wî bêtevêdêr û neyarên wî bêjimar bûn, û hîn bi ser de dewletê jî dixwazt malbata wî ji hev belav bibe, zeviyên gund li dû mirina wî ji aliyê endamên herdu binemalan ve erzan hatin kirîn û ji wan re man; lê herdu aliyên her bi çavên tiji hevrikî li hev niherîn, “gorên hev kolandin” û heta li nik dewletê bûn ixbarçiyên li dij hev jî. Xelkê gundên der-dorê mat diman ku çawa ta nuha peya ji hev nekujtibûn. Li dawiya dawiyê va texmîna bû rastî û di vê roja çarşemê de peyakî ji Reşbextiyan û xortekî ji Şekariyan hatin kujtin. Du rojan berê çend ciwanên wan li ser taximê zeviyekî li rojhilatê gund li hev xistibûn, serên hev û din şkandibûn û dû re çûbûn qışleya dewletê ya li gundekî din û li hev gilî kiribûn. Cendirmeyan ji aliyekî sê û ji aliyê din çar peya girtibûn û xistibûn girtîgehê. Çarşemê taştîyan Egîdê Şekarî ji malbata Şekariyan û Nedoyê Reşbextî ji malbata Reşbextiyan li nêzikî bîra gund rast hev hatibûn. Gotinek ji vî û yek ji wî, herdu li pêş jinên li ser bîrê ji wêrekiya xwe wêrektir bû bûn, dabênçeyên xwe ji ber xwe kişandibûn û dabûn sîngên hev. Tevî ku brînen wan ne yên mirinê bûn jî bi encama wendakirina xwîne herdu jî di navbera Bêçarê û Avdarê de miribûn û laşên wan li gund hatibûn vegerandin.

Bi bihîstina nûçeyê re Melle hema hindik ma di şûna xwe de hişk bibe, ne tenê ji ber ku ew ji bûyerên wisa gellekî aciz dibû, ne tenê ji ber ku Reşbextiyan ji dûr ve digihîştin wî û bixwazta-nexwazta çemelê malbata wî jî yekî ji heman darê bû ku divabû ligortoreyên herêmê bi encama bayekî qebe ligel tevahiya darê bihejiya; lê her weha ji ber ku Leheng Axa dostê wî bû û divabû çemelê malbata wî jî bi yê Şekariyan re bihejiya. Bi gotineke din, bi encama vê bûyerê herdu dost dibûn xwîniyên hev. Ger herduyan tew bixwaztana çemelên xwe ji van daran veqetandana jî ew ê bi encamê ji çavên xelkê derdorê biketana. Lê çawa be jî, Melle di navbera xwe û xwe de spasiya Xwedê kir ku ji her aliyekî yek, û ne tenê yekî aliyekî, hatibû kujtin. Vê encamê dê lihevhanîna wan hêsantir bikira.

Di êvara heman rojê de li dû yasiyan du peyayên Şekariyan jî gihîştin mala Leheng Axa û ew derheqê heman bûyerê de agahdar

kirin. Di berbanga roja din de, roja pêncsemê, wekîlê wî Zoro va nameya li jêr gîhand Mêlle:

“Birayê hêja Melle Boyar,  
Ez ê îroj tevî du mezinên Şekariyan bigihêm Avdarê û li mala Şêx M. bibim mêvan. Wekî texmîn dikim hinek ji mezinên Reşbextiyan jî dê xwe gîhandibin te. Divêt em bi her awayî hewl bidin wan li hev bînin. Min bi Zoro re sê nameyên din jî rêkirin: yek ji Şêx M. re, yek ji Şêroyê Mêrgî re û ya sêyem ji Heciyê Kaşî re. Tu jî xwe di navberê de bigihîne Arî Efendî û Daroyê Fatê. Em ê hemî îroj êvarê di mala Şêx M. de bigihên hev ji bo lihevhanîna herdu aliyan.”

“Wekî dê bizanibî cîhgirtina va bûyera ne bi xêr di demeke gellekî nemunasib de cîh girt. Di berbanga roja îniyê de divêt ez û tu ji Avdarê derkevin û xwe bigihînin Tarê, bila tu amede bî: Brayê te Leheng.”

Ew kesên ku Leheng di nameya xwe de bi nav kiribûn û dê di kombûna aştkirinê de beşdar bibûna xwediyan rêzgiriyeke mezin bûn di nav civatê de. Kesên wek wan di proseyan aştkirinê, lihevhanîna û navberîkirinê de roleke mezin di nav xelkê herêmê de dileyiztin.

Êvara pêncsemê dora sîh mirovan di mala Şêx M. de gihîştin hev. Li dû gengeşe û danûstendineke dûr û dirêj ji dest Melle Boyar, Leheng Axa, Şêx M. û giregir û rîhsipiyên Avdarê hat der her çar mezinên ji herdu malbatên hevrik ber bi hev bihînin. Berê her çar peyayên ji Bêçarê gotinên hişk avêtin hev, lê mebestpak ketin navbera wan û bi hosteyî mertal dan ber wan hişkpeyvan ta ku axaftin nermtir bû û meraqa aştbûnê li nik herdu aliyan xwe livand. Bizava xêrxwazan domand ta ku “bi gotina Xwedê û pêxemberê wî bû û rindiyê nerindî şuşt.”

Xwarin hat xwarin, çayê hat vexwarin, Fatîhe hat xwendin, rûramûsanê cîh girt û beşekî ji Sûreta Yasîn bo canê herdu “birayên çûnî rehmeta Xwedê” û li ser peymanê aştiyê hat bihîstin. Di civîna ta nivê şevê domandî de biryar hat girtin ku nimêja îniyê,



sibe, li Bêçarê bihêt kirin û beşdarên di kombûna mala Şêx de tê de beşdar bin ji bo misogerkirina lihevhatina herdu aliyên hevrik. Di navberê de peyane din jî ji herdu aliyên xwe gîhandibûn Avdarê. Di berbanga roja îniyê de ji her aliyekî yek hat rêkirin da ku herdu binemalan haydare encamên civînê bikin û da ku şênîyê gund xwe ji bo gihîştina mêvanan amade bikin.

Leheng Axa û Melle Boyar neçar man çûna Tarê bihêlin e'srê roja îniyê. Çi çareyên din nebûn. Beşdarnebûna di nimêja îniyê de li Bêçarê dê wek kiryareke ne di cîh de, heta bêvac, ji aliyê xelkê ve bihata hesibandin. Girtina biryara paşvejistina rêwîtiyê, ku dê bibûya egera paşvejistina kombûna grîng jî, ne hêsan bû, lê "qeder qeder e" û "tiştê hatî nivîsandin dike illeh bibe."

## 7

Em li roja çarçemê û gundê Bêçarê vegehin, roj û şûna mirina Egîdê Şekarî ji malbata Şekariyan û Nedoyê Reşbextî ji malbata Reşbextiyan.

Çarçemê dû nîvro gundê Bêçarê di nav xem û kederan de dikeliya û dinaliya. Ji ber ku ji her binemalekê yek hatibû kujtin kesek ji gund nereviyabû, lê jin û peyayên wan, wekî ku di bin bandora bencê de bin, hîn bêtara bi ser wan de hatî bi tevahî hest nekiribûn. Tenê qîrîn û orîna hinek jinan dihat.

Ji sibeha pêncsemê û şûn ve, rasterast bi şuştina cenazeyan û binaxkirina wan re, rewşeke wek heşermeşerê li gund xwe bi cîh kir û bêhna mirinê, nefretê, tirsê û diltezînê jê dihat. Jinan li xwe dixistin û hinekan porê xwe dirûçikandin, yan rûyên xwe pirûncek dikirin. Diya Egîdê Şekarî geh ji xwe diçû, geh digiriya û geh jî qîrîn û hawar-hawara wê bû. Di navberê de dengê wê yê bi şopên janê dagirtî dihat:

“Lo Egîdo, te çima diya xwe nekir qurbana xwe, aaax, lo Egîdê diya xweyo, lo!” Pizotên êgir xwe xistibûn nav dil û kezeba wê; çîhan di nav hişên wê de bênerx bû bû, bedewiyê xwe ji ronahiya rojê dizîbû, siberoj bêxwebêj mabû, hêvî di jînê de nemabû, bextiyarî bû bû cînciq û şkestibû: “Wey bêlome be, Xwedêyo, bêlome be!” Egîdê li ber dilê wê giranbuha dê nema rojên wê yên manî bixemilandana, lîlîniya zilxitên wê dê di roja zemawenda wî de nehata bihîstin, destên wê dê bi paçên dergûşên wî nebûna: “Wax qedera bi teniya reşê, wax! Wey feleka bêrehmê, ma min cewrikên li ber argûnê te fetisandibûn ku te dergûşê min ji ber argûnê min bir? Hawar...!”

Xwîşkên Egîdê Şekarî bi dobê serê şînê dikişandin û dilorandin. Bi taybetî ya mezin ji heqê rola xwe derdiket û bi dengêkî bi evînê û şewatê dagirtî dilorand:

*Lo birawo te çima li me weha kir?  
Te zerî û esmerên Bêçarê li dû hîştin  
û zû ji nav me bar kir.  
Lo Egîdo, tu siwarê hespa şêye kihêl î  
Hem boke yî, hem ciwanmêr î  
Tu stêrka nav xortan î  
Tu kilê çavên qîzan î  
Tu lewendê li ber dilê xûşk û biran pîrr giran î  
Wey li min rebena Xwedê birawo  
Va çî bêtar bû te bi ser me de hanî!*

Jinên li dora wê bi rîtmekî hevgyrtî û bi meqamekî di heman demê de geş û reş gotinên wê di nav giriyê xwe de dikelandin û

dihelandin. Li dû demekê girî hêdî-hêdî siviktir dibû, qîrîn kerr dibû û her komeke ji sê-çar jinan di nav hev de dest bi axaftinê dikir ta ku kesine din ji gundên dorhêlê xwe digîhandin malê û jinan dest ji şorê berdidan, dîsa girî û qîrîn vedijandin û dîmena berê careke din xwe dubare dikir.

Li mala Nedoyê Reşbextî jî şîn digeriya, lê girî û qîrîna li wir ne wek ya li mala din bi alawî bû. Çawa bûya jî wî mirazê xwe dîtibû, pêncehsaliya xwe derbas kriribû û ji du-sê salan û vir ve mirovekî nexweş bû. Lê ligel vê yekê jî erf û toreyên şîne rola xwe dileyztin û meriyên wî dikirin ku şîna li ser wî ji ya li ser Egîdê Şekarî ne kêmtir bi tîn û bandor bûya. Li dû hatina nûçeya mirina wî tişteki gellekî seyr çih girtibû: Jina wî lal bû bû. Pirsibû: “Ma rast mir?” û nema peyivîbû. Wê nuha xwe di quncekî maxê de kome ser hev kiribû û bi çavên bel li beşdarên di şîne de dinihêrî – lê bi şêweyeke wisa ku te digot ne tişteki dibîne, ne dibihîse. Çiqa jinan kirin ku wê “hişyar” bikin jî ew ne ji şûna xwe lipitî, ne jî devê xwe vekir. Pîreke ji gundê bavê wê, ya ku ew ji dema zarokiya wê de dinasî, êdî gote wan: “Dest ji Zêrîne berdin! Ya hatî serê wê têrê dike!”

Zêrîn tenê bi giyanê xwe li wir bû. Hişên wê bi şopa rojên par ketibûn; dema ew keçeke ji wan keçên çeleng û navdar bû. Ji hemî keçên gundê wan ew ya tenê bû ku dizanibû bixwêne, ya tenê bû ku ta çardehsaliya wê rê jê re hatibû dayîn ku li hespan siwar be û bide xarê. Ew yekem keça herême bû ku dizanibû çawa dabenceyê û çiftê bi kar bihîne. Di nav hemî keçên wê deverê de wê bi çelengî û zîrekiya xwe deng dabû. Di panzdehsaliya wê de tac û rext dan sêrî. Biharê ew di nav bêrîvanan de wek hîva di nav stêrkan de dihat ber çavan. Rojekê bi kirasekî gewravîn, xeftanekî stilgirosîyî gulrengîn û bervanekeke ji qedîfeyê reş; bi taca zîvîn, rişmeyên bi pîlikan hatinî xemilandin û îçqorê bi xazî, dobra û zêrên reşadî ketibû govendeke gundekî cînar. Bejn û balava wê, çelengî û sivikiya wê, aramiya livîna wê, xwepereştî û zimanxweşiya wê navê wê kiribûn benîştê kerengan û xistibûn devên xelkê. Digotin, “Lo merî hişmekar dike lê binêre û pê re bipeyive!”

Dilê Zêrînê çî caran neketibû kesekî. Ew li benda xortekî ji xeybê bû, ciwanekî wek Memê Alan ku rojekê bi hespeke kimêt bihata û destê wê bixwazta, lê wê çîqa pa jî Memê wê nehat, heye ku hîn zû bû ji bo gihîştina wî.

Êvareke zivistaneke bi pûk li mala bavê wê bi ser de giriyan, destên wê hene kirin û gotin: “Bûkê xerîbê, lê were me’re!” Di sibeha roja din de bavê wê gustîlkek dayê, çû nav rezê xwe, bi dizî giriya û ta êvara wê rojê li mala xwe venegeriya. Zêrîna wî, xemla mala wî, ya li ber dilê wî bêhempa nerxbilind; lê di heman demê ya ku tirs di nav hişên wî de xistî hêlînê, êdî ne li mala wî bû. Ew di şanzdehsaliya xwe de bû bû bûk û zindî ketibû gorê.

Çanda gelê Zêrînê bi stran û çîrok û destanan dagirtî bû, ku tê de keç û lawên çardeh salî bokeyên serpêhatiyan bûn. Ew di nav civatekê de dijî ku tê de zarokên panzdeh salî jinên bi zarok bûn. Di nav xelkê wê de keça ku ber bîstsaliya xwe nebûya bûk dibû serhevdeya malbata xwe, zewicandina wê dijwar dibû û ew di mala bavê xwe de roj li dû rojê diçilmisî ta ku rojekê peyabîyekî ew dixwazt, yan ta ku ew wek hêwiyekê diket malekê.

Gundê zavayê Zêrînê ji gundan yekî req û rût bû. Erê, zava ji binemaleke mezin bû, lê wê binemalê nav hebû, şan nebû, di nav nezaniyê û belengaziyê de vedigevizî. Ji bo endamên wê tenê xwepesindana bi bapîran û eşîrê li holê mabû. Ji yekem bîsta êvara zewacê de, dema zavayê ku wê hîn nû didît ket hindir û awirek dayê, bi amanca ku serdariya xwe jê re ragihîne, wê dizanibû çî hêvî di vê zewacê de ji bo wê nebû. Di heman şevê de gellek rê û rêçikan xwe di nav hişên wê de livandin; û di bîsteke va şeva ku sînor dixist navbera du qonaxên jiyana wê de hindik mabû ew rabe ser xwe, di şeva reş de bi rev berê xwe bide mala bavê xwe û jê re bibêje, “Bavo, çî dikin jî bikin, ez li vî mêrî venagerim!” Di nav mêjiyê wê de şerekî veşartî di navbera hêza wêrekîyê û ya ezotiyê li aliyekî û ya dilsoziya bi malbatê û erf û toreyan re li aliyê din de dest pê kiribû. Lê hêza dilsoziyê li ya ezotiyê bada û wê biryar girt xwe ji bo xatirê nav û dengê bavê xwe, şerefa malbata xwe, û ji bo bicîhkirina erf û toreyên gelê xwe bi tevahî di dest qedere de

berde. Bi derbasbûna şeva bûyî sînorê du qonaxên jiyana wê re wê çiraya kesayetiya xwe di nav hiş û dil û mêjiyê xwe de vemirand. Roj li dû rojê melûltir bû û dirêj nekir bû wek kukumeke binê şkeftan, wek dîwaneyeke di nav mijê bêhêvîtiyê de wenda. Serbilindiya wê bi serhişkî û awirên mêrê wê re brîn bû, zîrekiya wê bi neheqiyên xwesiyê re sist bû, wêrekiya wê di bin giraniya erfên civata wê de qurçifi, çelengiya wê bi hatina zaroyê yekem re vemirî, bejna wê bi encama karên giran û bi gihîştina dergûşê çarem re xûz bû û xelkê Zêrîn ji bîr kir; tenê salê çend caran yekî li vir, yekê li wir, digotin, “Çi heyf ku Zêrîn ket vî halî!”

Ji zarokên Zêrînê kurek di sêsalîya xwe de kor bû. Kurê din li dû kutabûna dema leşgeriyê çû bajarekî mezin û venegeriya. Qîzeke wê mirî ji dayê bû û ya din bêmêr ma çimkî bavê meraq dikir ji xwe re biguhere. Dema meraqa wî li dû derbasbûna salan bi cîh nebû hat gotin, “Hejarê êdî hindik maye pîr bibe; çî xêr tê de nemaye!” Rojekê yekî ku berê du jinên wî hebûn qelenekî bi dohn da bavê bêpere mayî û keça ku nuha bû bû bîst û du salî, kir jina xwe ya sêyemîn. Heyşt heyvan li dû zewaca wê zarokek ji ber çû, herdu jî mirin; û xelkê got, “Rebenê çû xelas bû.” Tenê çirûskeke hêviyê êdî ji bo Zêrînê mabû: kurê wê Halo.

Zêrîn di nav rojên jiyana xwe de; na, di nav rojên jiyana di mirina xwe de, wenda bû bû. A nuha ji bilî dîmenên ji rojên zarokiya wê, rojên di nav mijê demê de li paş manî, tenê kurê wê yê li Romanyayê di nav hişên wê de bû; û tevî ku wê di kûraniya dilê xwe de dizanibû ku çî xêr ji bo wê di wî de jî tunebû, wê xwe dixapand û ji xwe re piçek hêvî, hema çirûskeke ji omdiyê dihîşt, ku belkî rojekê vegere, wek “peyakî jêhatî ku pê serbilind bim,” wek kurekî ku bikaribûya diya xwe ber mirinê ji rewşa wê ya kambax azad bikira. Çawa be jî wî li Ewropayê dixwend!

Ber çend rojan gundiyekî wan yê ji bajêr vegeyriyayî gotibû ku “Halo li riya welêt e.” Heta hevaleyê wî li Tarê roja gihîştinê jî diyar kiribû, lê yê gundî roj ji bîr kiribû.

Zêrîna di nav mijê xem û xeyalan de wenda bûyî serê xwe bi jor ve hilda, li stûnan niherî û ji nişkan ve deng jê hat der: “Ew ê were, na, erê, na, erê...” û ji ber ku hejmara stûnên maxê zoyî bû, bi gihîştina stûna dawîn re wê bi dengekî bi keser di ber xwe de got, “Na, na, çûna wî jî bêveger e.” Jinên matmayî bi tirs û xemgînî lê niherîn, dilên wan pê şewitîn û pîra ku ew ji rojên zarokiya wê ve dinasî bi çavên tiji hêstir û dengekî nizm di ber xwe de got, “Wax Zêrîna min, wax! Xweliya heft gundan li serê te be! Ma bavê te be û ti xêrê ji xwe nebîne! Ji xwe rebeno nedî jî!”

Li dû demekê ji nişkan ve orînî bi Zêrînê ket; nuha ew li ser mêrê xwe digiriya. Wî ronediya jî xêr ji jiyana xwe nedîtibû. Rast e mirovekî ne hêsan bû û gellek caran ta’de li wê û zarokên wê kiribûn, lê ligor xwe wî ji wan hez dikir. Çiqa dilê wê di nav roj û şevên salên bi ber bayê demê ketinî de xistibe nav êş û janê jî, wan bi hev re demeke dirêj derbas kiribûn, day-û-bavê heman zaroyan bûn, bi hev re carine giriyabûn û hinek caran keniyabûn. Ew jî bi şeweyeke ji şeweyan qurbanê şert û mercên jiyana li şûn û demekê bû, berhema civata xwe bû. Bi koçkirina wî re ew ê nuha bi tena xwe bimaya. Bav û diya wê ji mêj ve ji vê cîhanê koç kiribûn û deriyê “mala bavê” dê li pêş wê nema wek berê vekirî bûya. Kesereke kûr kişand û derbarê mêrê xwe de bi xwe re got, “Bavê Halo, feqîro, te jî xêr ji xwe nedî.” Çiqa dengê wê yê di nav kela girî de hatî der dilê mirov bi wê dişewitand jî, jinên li wir kêfxweş bûn ku Zêrîn bi xwe hatibû û deng pê ketibû.

## 8

Em dîsa vegerin bajarê Tarê û êvara Rêsin ya yekemîn li wir; bi gotineke din, heman êvara ku tê de herdu kesên ji Bêçarê çûbûn mala Melle Boyarî li Avdarê. Bila gotin dîsa ji Pîrên be:

“Çarşemê êvarê xewa min di odeya li beşê jorîn ji Çayxaneyaya Aramo de nehat. Yekemîn car bû ku min xwe wek girtiyekî hest dikir. Ez her weha ditirsiyam ku bûyereke ne ji xêrê re li pêş be. Wêneyên di odeya min de dîsa bala min kişandin ser xwe. Ez rabûm û min car din yeko-yeko li wan niherî. Bi niherîna li wêneya sêyem re ez gêj bûm. Min wek serxweşekî xwe gîhand ser têxt û li ser piştê veketim.

“Li ser têxt min serê xwe ber bi dêrî ve bada û hew dît ku ma’rekî reş ji aliyê deriyê avrêjê ve ber bi min ve dihêye, lê min çî kir jî ji dest nehat ku rabim ser xwe. Min xwazt biqîrim, lê nikaribû. Ma’r gihîşt min, serê xwe ber bi jor ve hilda û çavên me li hev rast hatin. Zimanê wî yê çetelîn li derve bû û hema hindik mabû bigihê rûyê min. Dû re xwe xuşand kêleka min, li ser têxt kokel bû û dest pê kir vereşe. Aveke spî, wek dewê tirş û tîr bûbe, ji devê wî bi ser sîngê min de dirijiya. Min mirin hêvî dikir da ku ji wê rewşê rizgar bibim, lê bi dest min nediket. Tiştê seyr ew bû ku min dizanibû xewn e, lê ji dest nedihat bi xwe bihesim û min bizava qîrînê dikir, lê deng ji min nedihat. Bi hatina dengêkî nişkavîn re min xwe ber bi jor ve çekir û kesereke kûr ji min hat der. Giyanê min bi tevahî şil bû bû, dilê min beza lêdida – û min hew dît derî vebû. Mêvanê îroj gihîştî, çenteyê reş di dest de, ket hindir û derî hêdîkan li paş xwe girt; got: ‘Êvar baş, hêvîdar im min tu netirsandibî.’ Min ji ber xwe ve şerm kir ku wî ez di rewşeke weha kambax de dîtim, li dû wê xewna bi sam, lê di heman demê de bi hatina wî dilşad bûm ku bû egera azadbûna min ji wê. Min bêhemdê xwe got, ‘Na, na, fermo danîşe,’ û ber bi avrêjê û henefiya avê ve çûm. Min rûyê xwe şuşt, bedena xwe ziwa kir û zivîrim odeyê.

– Te derî çawa vekir? Min pirsî.

– ‘Vekirina deriyên ji bo min hêsan e’, got mêvanê min û keniya.

– Navê min Pîran e. Ez ji roja şemê ve li vir im.

– Rasîn. Wek dizanî ez îroj gihîştim. Ev çi ye li vir diqewime? Gelo tu çawa vê rewşê şîrove dikî?

– Ji vir ta du-sê rojan her tişt ê zela bibe; loma ez ê mayîna li vir ji bo hefteyekê tehmûl bikim. Hela em bibînin ka çi dibe!

– Karê te çi ye Pîran?

– Ez li Berlîna rojava mamoste me.

– Ez jî berê li Ewropayê bûm, lê nuha li Boston li dezgeheke lêgerîn û lêkolînên derbarê zanistiya elektronî de kar dikim.

– Yanê karê te peywendî bi tiştên wek radyo û televizyonê re heye?

– Na, bêtir xwe bi dataya elektronî ve peywendîgir dike. Di nav çend salên li pêş de kompiyûter ê cîhana me têxin qonaxeke nû. Ta nuha ew bi pirranî tenê ji aliyê hêzên leşgerî yê dewletên pêşkeftî, bi taybetî yê Amerîkî, ve hatine bikarhanîn; her weha ji aliyê hinek zanîngehên mezin ve, lê dirêj nake ew ê têkevin her derê. Ew ê cîhana me bi şêweyê nakeve aqilan bidin guherandin. Karê min xwe bi bernamêyên kompiyûteran ve eleqedar dike.

– Tu dibêjî rola te li vir bi karê te ve girêdayî be?!

– Heye ku bêtir bi vî çenteyê reş ve girêdayî be.

– Ma ne yê te ye?

– Na, ne yê min e. Tiştê ku ez ê bibêjim bila di navbera me de bimîne. Ber dora mehekê, şevê zengilê deriyê mala me li Boston hat lêdan. Peyakî di temenê min de xwe wek Jan Bazirganiyan pêşkêşî min kir. Got, ew kurê Kêvork Bazirganiyan e, yê ku bi dehan sal berê bi alîkariya Kaşan Begê xwe gîhandibûye Amerîka. Bi xwe re nameyek hanîbû ku Leheng Axa nivîsandibû, û tê de ji



min tika dikir şeş ferhengên di çenteyê ku Jan ê bida min de bigihînim Tarê. Ji min xwaztibû ku ez li çênte miqayit bim wekî li jiyana xwe. Bêguman brayekî min ê ew agahdar kiribûya ku ez ê di van rojan de bihatama serlêdana welêt.

– Balkêş e. Yê ermenî tişteki din negot?

– Na, tenê got ku bavê wî rêzeke mezin ji Kaşan Begê û malbata wî re hebû, ku bav û diya wî bi saya wî zindî mabûn û di bin qanadê wî de li Tarê bi cîh bû bûn, ku bavê wî bo demekê wek xiznedarê Kaşan Begê di kar de mabû û dû re bi alîkariya wî xwe gîhandibû Dewletên Yekgirtî yên Amerîka.

“Li vir derî hat lêdan û berî ez ji şûna xwe bilivim Rîso û Efrîto ketin hindir. Rûyê Rîso sor û piz bû bû, destên wî dilerizîn. Rûyê Efrîto jî tîrş û tahl bû. Rîso herdu destên xwe ber bi jor ve hildan û got:

– Birêzên qedirbilind! Me tişteki weha ji we nedipa! Rasîn Efendî, dema me deriyê odeya te vekirî dît û tu ne li hindir bûyî, em ziravqetî bûn!

– ‘Tu çi bibêji te maf heye, Rîso,’ Rêsin got, ‘Yê tawanbar ez im, ne Pîran, bibexşîn.’

– ‘De fermo em te bibin odeya te,’ Rîso got.

“Efrîto xwazt çênte rake, lê Rêsin bi xwe ew rakir û ber bi dêrî ve çû. Berî biçê der li Rîso zîvirî û gotê:

– Rîso, ez hatim odeya Pîrên û min ew ji xewê rakir. Ez bêhteng bû bûm û hew.

– ‘Fêhm dikim, fêhm dikim, ez benî, lê çi ji dest min tê! Ez tenê ya ji min tê xwestin dikim, birêz Rasîn,’ got Rîso.

“Dema Rasîn, Rîso û Efrîto ji odeya min çûn der demjimêrê yekê nivê şevê derbas kiribû. Min hewl da razê, lê serê min bi raman û

dîmenan mişt bû, û tevî ku min xwe mest hest dikir û dixwazt têkevim xewê jî razan bo demekê ji min dûr ma. Demjimêr 12ê nîvro, roja pêncşemê, ez bi lêdana dêrî re bi xwe hesiyam. Rîso ez haydar kirim ku em ê li dû saetekê dest bi xwarina navreyê bikin.”

\*\*\*

Di heman şevê de, dema Rasîn ji odeya Pîrên gihîşt ya xwe, ew li paş maseyê danişt û cigareyek vêxist. Ji ber ku birçî bû, ji bilî avê tiştêkî ji bo vexwarinê nebû û ode bêyî pencere bû, dûyê cigareyê li xweşiya wî nehat. Gewriya wî şewitî û wî xwe nîvgêj hest kir. Li dû şuştina rûyê xwe û firçekirina diranan hema bêyî qondere û kincan deyne li ser têxt veket. Ji nişkan ve dengek hat wî. Deng yekî nizm û nezelal bû. Bi hatina dêng re çiraya odayê dest pê kir vemire û vêkeve. Odeya wî wekî ku tiji mij bûbe xuya dikir. Li doraliyên lampayê mij tîrtir bû û wisa diyar bû ku deng ji wir dihat. Tevî ku Rasîn bi hebûna neysiziyan, yan ewên ji me çêtir, ne bawer bû jî wî di vê rewşa xwe de ew bi bîr hanîn. Deng her ku çû zelaltir bû û lampaya bi têla elektrîkê ve girêdayî li dor xwe dizivirî. Rêsin xwe wek kesekî wêrek dizanibû, lê a nuha ew di şûna xwe de hişk bû bû, xwe wek kesekî bêhêz û girêdayî hest dikir. Xuh dabû, nefesa wî teng bû bû. Ew li ser têxt rûnişt û ji bo kurtedemekê meraqa li daxwaza hawarê kir, lê li xwe dananî. Lampaya li jor dizivirî teqiya û beşikekî ji cama wê li eniya wî ket. Xwîna germ ji eniyê bi rê ket û di navbera bijiyên wî re çîlik bi çîlik ber bi jêr ve rijiya. Kir ku rabe, lê hêzeke wek bayekî qebe ew li ser piştê xist û serê wî li dîwarê li paş têxt ket. Xwe avêt ser xaliyê li kêleka têxt li ser erdê û ji dest hat çarşefa li ser doşegê ji aliyekî ve bikişîne û serbijangên xwe pê ji xwîne pak bike, lê ji ber ku nuha bi tevahî tarî bû nedikaribû tiştêkî bibîne. Deng bi tevahî zelal bû û wek dengê rahibekî dilpakî bawermend di dema îbadeta rasteqîne bo Xwedê de, yan wek dengê pisporekî ji wan pisporen ku nexweşên derûnî

dixin xewê, hat bihîstin: “War bûye Tar û Tar gemarî bûye, Rasîn, Tar gemarî bûye!” Rasîn veciniqî û bêyî hemdê xwe got, “Nikarim wê bi serê xwe pak bikim Seyda, bibexşîn! Ji derfeta min mezintir e.”

Dengê ku nuha wekî ji pîremêrekî xembar derkeve dihat Rêsin, lê vegerand: “Tarê pak bikin, Rasîn! Wê ji gemarê pak bikin! Navê wê biguherin û dîsa bikin War, Rasîno, Tarê dîsa bikin War!”

Dema deng hat birrîn, Rasîn ji bo demekê ji şûna xwe nelivî. Dû re hêdî-hêdî rabû û li dugmeya yekê ji lampayên li herdu aliyên têxt geriya ta ku ew dît û vêxist. Baş bû ku qondereyên wî hîn di lingan de bûn, çimkî beşikên cama lampaya li jor hûr-hûrî bûyî li ser erdê odeyê bûn. Wî çiraya duyemîn jî vêxist, ji wir xwe gîhand avrêjê û li wir jî çira vêxist. Dû re kincên xwe danîn, destmaleke li wir bi dar de şil kir û tevahiya bedena xwe bi wê şuşt. Bi encama vê yekê bi xwe hat û bêhna wî fireh bû. Li textê xwe vegeya û hema bêçarşef li ser veket. Ji nişkan ve li wî e’yan bû ku xwediyê deng Kaşan Beg bû. Bêyî bizanibe çima, germahiyeke aram û xweş xwe di nav tevahiya giyanê wî û di kûraniya hişên wî de bi cîh kir û ew bi encamê xilmaş bû.

Konekî bi neh stûnan li kêleka gund hatibû vegirtin. Peya li aliyê rojava di navbera çîta li wî beşê kon hatî bicîhkirin de danîştibûn. Rasînê zarok ji wan wê de li ser lingan bû dema wî hîrrîniya hespa Kaşan Begê bihîst û hew dît ew û sê siwarên pê re li pêş kon in. Peya di cîh de rabûn ser piyan, azepek çû serê hespê û Kaşan Beg, mirovekî lihevhatîyî bi şelwer û sixmeyê çuxîn, şa’reke mor li dor sêrî û xencereke zîvîn di ber re, jê daket. Bang li Rêsin kir, destê rastê li piştê xist, ew rakir û li hespa xwe siwar kir. Got, “Rasîno! Here Tarê pak bike!” û bi destekî li piştê hespê xist. Rasîn tirsîya, lê hespê sivik-sivik da xarê, dû re beza û bi aramî reviya û dirêj nekir dest pê kir bifirre. Çi şopên tirsê êdî di dilê Rêsin de nemabûn. Wî xwe azad, aram û bextewer hest dikir, lê çîqa hesp firriya jî xwe negîhand Tarê. Carekê ew wek bajarêkî di nav mij de be ji dûr ve xewinî, wek yekî ji wan bajarên ku mirov di keştiyan de ji dûr ve dibîne. Lê li şûna ku hesp xwe li Tarê bigire xwe bi aliyekî din ve

badâ. Çiqa Rêsin kir ku hevsêr ber bi aliyê bajêr ve bikişîne jî hespa serî jê girtî bi ya xwe kir, yan heye ku hêzeke veşartî ew bi mebest wê de dikişand. Ew aramî û bexteweriya ku wî hest dikirin xwe wergerandin hesteke bi xem û bêhêvîmanê dagirtî û Rasînê di navbera qonaxên zarokiyê û ciwaniyê de dest pê kir bigirî. Kaşan Begê berê wî dabû Tarê da ku wê bike War, lê hespê xwe ji ser amancê badabû û berê xwe dabû şûneke nediyar.

Dema Rîso roja pêncşemê pêş nivro li deriyê Rêsin xist ew veciniqî û ji xewna xwe vegeriya şûna ew lê. Li dû ketina hindir odayê, Rîso matmayî pirsî:

– Çi bû Rasîn Efendî? Wey wax! Eniya te jî brîn bûye! Çi bi vê lampayê hat ku weha xinc-xincî bû!

– Ez jî nizamim Rîso.

– Em ê dû re odayê pak bikin. Em eniya te derman nekin?

– Na, na, hewce nake. Ne çî brîn e, lo! Ez ê xwîna li ser hişk bûyî bişom.

## 9

Em dîsa li gundê Bêçarê vegezin. Gihîştina mêvanan ji Avdarê roja îniyê bo kurtedemekê, wek hilmek bayê di rojeke havînê ya germ de piçek honikî bi xwe re bihîne, rewş li Bêçarê hebekî guhert. Pêşwaziyeke germ li mêvanan hat kirin û herdu alî li wan xwedî derketin. Li dû ku mêvanan û gundiyan bi hev re li dû Melle Boyar nimêja îniyê kirin, hemî di bin du konên mezin de beşdare xwarina navreyê bûn. Jinan xwarineke xweş ya bi goşt ji wan re amade

kiribû. Li dû xwarinê û vexwarinê şor dîsa germ bû, rû hatin ramûsandin, şîret hatin kirin û ew soza ji giregirên Şekariyan û Reşbextiyan hat girtin ku ew ê wek “bran” bi hev re bijîn. Bi xweşî û rindî mêvanan xatir ji mazûvanan xwaztin û her kes û komek li şûna ew jê hatî vegeriyan.

Nûçeya lihevhatina Şekariyan û Reşbextiyan, wek agirê di rojêke germ de bi pûşê hişk yê zeviyekî keve, di nav şênîyê Tarê û xelkê hemî deverên wê de zû belav bû. Ber wê her kes bi kelecana li benda bûyerên balkêş û bi xwîn bû, lê nûçeya lihevhatina di nav du rojan de daniştvanên herêmê bi çûk û mezinan ve mat hîştin. Piraniya xelkê bi rindî behsa rola Leheng Axa û Melle Boyar dikirin, lê ne birêvebirên dayîre û dezgehên dewletê, ne jî yên rêxistina bi navê Tevgera Serkanê Tarî, TST. Qumandarê hêzên dewletê li deverê General T. di cîh de raporteke ji serdarên xwe re şand û tê de gotina “sabotekirina rola dewletê ji aliyê axayekî û Melleyekî ve” kir. Serdarên hêzên leşgerî û yên asayişê, karmendên dayîreke dewletê, her weha dadmend û mamûrên dezgehên dadmendiye, û heta bi advokatan û erzihalçiyên jî, te digot qey masiyekî mezin ji dest wan şemîtîbû, dilsar bû bûn. Wan ji xwe dipirsîn, gelo axayekî bêhêz û Melleyekî mizgefteke gundî çî maf hebûn ku wan “ji rizqê” wan bêpar bikin? Kêşeya di navbera Şekariyan û Reşbextiyan de dê weqa sûd bigîhandana wan, lê xewnên wan bi encama lihevhatinê bi ber bê ketin. Mamûrekî pirsîbû, “De çima? Ma kesekî rizqê melle ji ber devê wî direvand? Helbet, na. De Melle çî maf heye ku rizqê mamûran ji ber devê wan birevîne?!” Heke herdu aliyên hevrik aşt nebûna, tew heke şerê li dij hev bidomandana, wan ê ji bo vê pirsê erzihal bidana nivîsnadin, advokat bigirtana, rişwet bidana mamûran û cendirmeyan û dadmendan. Hêzên asayişê dê li ser hesabê wan bixwarana û vexwarana, pere ji wan bigirtana. Lê nuha ku aşt bûn çî xêr ji wan hemiyan re li holê nema. Wan ew omdiya dikirin ku aştî têk biçê û herdu aliyên hevrik li şerê hev û din vegehin. TST, li milê din, gellekî bi aştîbûna herdu aliyên hêrs bû, bi taybetî ji ber wê yekê çimkî ne tevgerê, lê hinên din di aştîkirina herdu êlên hevrik de rol leyiztibûn. Lewma ew bizava dikir ku Leheng Axayî û Melle Boyer riswa bike û hêvî dikir aştîya wan bi rêxistibû têk biçê.

\*\*\*

Dema Leheng Axa û Melle Boyar roja îniyê derengê dû nîvro ji Bêçarê vegeriyan Avdarê da ku ji wir bêyî ewarebûn biçin Tarê ew bi fermana Ceneral T. hatin girtin, lê ji ber ku çî bersîv ji serdarên wî nehat û Leheng Axa gef xwarin ew ê li paytextê dewletê gilî bike serdarê leşgerî neçar ma wan roja din, roja şemê, li dû taştê bide berdan. Dema Leheng Axa pirsîbû, ka ew çîma hatin girtin, serleşgerekî gotibûyê ku guman hebûye wan civînên siyasî di mala Şêx M. de û li Bêçarê bi rê xistine û xwe têkilî karê dewletê kiribûne, lê ligel va gotina xwe jî serleşgerî bizava razîkirina Leheng Axayê ku gellek çaran “diyarî” dabûnê kir û jê hêvî kir ku bi sebir be.

Ne tenê li Avdarê, lê her weha li Tarê bi xwe jî, her kesê ku dikaribû hestiyekî ji hevrikiya Şekariyan û Reşbextiyan bi dest xîne bi encama lihevhatina wan dilsar bû bû. Heta bi Şêx M. be, tevî ku Leheng Axa û Melle Boyar çî ji wan hatibû kiribûn ku wî jî têkile proseya lihevhanînê bikin, û ligel ku kombûna aştbûnê di mala wî de çîh girtibû, wî jî hêvî dikir ku ziyana bigihê Leheng Axa û Melle Boyar. Li dû vegera ji Bêçarê wî li pêş hejmareke ji mirîdên xwe gotibû, wî ji rîhspiyekî Bêçarê bihîstiyê ku “Wan ji bo pirsîna lihevhanînê perene pîrr ji herdu aliyên girtine.” Şêx M. bi xasûkî gotibû, “Ez bi xwe gotineke wîlo bawer nakim,” lê dû re bi devekî kenok li ser vê gotina xwe zêde kiribû û gotibû, “lê li milê din, her tişt ji dest benîadem tê.” Va gotina wî bêguman yeke bi her awayî neheq bû, çîmkî proseya lihevhatinê di mala wî de û li pêş çavên wî dest pê kiribû, û li milê din, Leheng û Melle her yek ji wan xizme aliyekî bû û bi encamê rasterast bi vê pirsê ve eleqedar dibûn. Hinekan li Avdarê gotibûn ku Şêx M. li Bêçarê gellekî dilsar bû bû,

çimkî ji Melle Boyar hatibû xwaztin ku serkêşiya nimêja îniyê bike, ne ji wî. Bi gotina wan kesan, dilê Şêx hem li Mêlle û hem li Lehengî mabû, çimkî divabû pêşniyaz kiribûna ku bila wî, Şêx M., serkêşiya nimêjê bikira, “qe nebe ji bo xatirê rîhên wî yên spî.”

Tevgera Serkanê Tarî, TST, propagandayeke mezin li dij Leheng Axa û Melle Boyar bi rê xist. Di beşekî belavokeke di bin navê “DEM NE DEMA AXAN Û MELANE” de TST ew bi “xiyanetê, xwefirotinê û bi rêxistina dek û dolaban” gunehbar dikirin. Ligor belavokê, “Axê bi navê Leheng û melê bi navê Boyar di nav gel de bêqîmetin û wan bi fitneyan du kesên feqîr dan kujtin. Wan ew dan kujtin ji bo peran ji xelkê bigrin.” Her weha ligor belavoka TST, “Her kes zane ku gundê Bêçarê berê ê bavê Leheng bû û çimkî gundî wek biran bi hev re dijîn, wî bi afkariya Melle ew berdane hev bo gund car din bike ê xwe.” Jê bêtir, piştgirine TST di nav xelkê de Melle Boyar û Leheng Axa bi kiryarên “fahiş” gunehbar dikirin û digotin, “Ew bi hev re li bajarên mezin bi jinên xwefiroş re wîskî vedixwin.”

Gotinê nexwaze ku axa û Melleyên herêmê bi pirraniya xwe, ew jî li dij Leheng Axayî û Melle Boyarî bûn, û ligel ku wan ji TST hej nedikirin jî belavoka wê li xweşiya wan hat. Balkêş bû ku rêxistina bi navê Cemaeta Ummeta Muwehhed (CUM) derbarê vê pirsê de bêdeng ma û xwe pê ve eleqedar nekir.

Li dû berdana Leheng Axayî û Melle Boyarî ji girtîgeha Bêçarê bi dora du saetan dayîreya karbidestê Tarê ji Ceneral T. re telefon kir. Ji wî hat xwaztin, bila tevdêra “jiholêrakirina” her duyan bike û TST wek berpîrsa kiryarê bide zanîn.

Ceneral T. hay jê hebû ku Leheng Axa û Melle Boyar dê ber bi êvarê bi cîpê biçûna Tarê. Wî bi lez bang li du serleşgerên xwe kir û ferman da ku bila kemînek li ser riya wan bihêt amadekirin. Ceneral T. ji herdu serleşgeran re, li dû hevdiîtineke ku tenê nîv saetekê ajot, got: “Hûn karê xwe dizanin, hewce nake ez bêtir bibêjim.”

Roja şemê pêş nîvro nûçeya girtin û berdana Leheng Axa û Melle Boyar li bajarê Tarê belav bû. Hema bi belavbûna wê re civînekê di maleke li rojhilatê bajêr de cîh girt. Berpirsekî TST, çar endamên tevgerê, xwediyê malê jî di nav de, û Haloyê ta nuha wenda mayî tê de beşdar bûn. Berpirsiyêr bi çavên Halo ve zîq niherî û gotê:

– Halo, va herdu bênamûsan bavê te dan kujtin. Em xwîna bavê te li erdê nahêlin. Em ê heyfa wî hilînin û qatîlên wî bidin cezakirin. Tu çi dibêjî?

Haloyê ku nuha cigareyek bi ya din vêdixist, wek kesekî ku mentiq û tevdêr li cem nemabin dixewinî. Bêyî ku li çavên berpirsiyêr binihêre di ber xwe de got:

– We çawa xwest bikin, biryar a we ye.

– Berpirsiyêr bi hêrs got, ‘Biryar a te ye jî. Tu mirovekî xwendekar î. Lazime tu ajan û dijminên gelê xwe binasî; û ê hatî kujtin bavê te ye, ne ê min.’

– Bikujin. E’ jî dixwazim bên kujtin.

– Em ê bikujin, lê lazime tu jî bi rola xwe rabî. Binêr! Ta îro te get tiştek jî ji tevgerê û gel re nekiriye. Dîsa jî em li kesên wek te xwedî derdikevin.

Çawa li hesabê desthelatdariya Tarê nedihat ku “axayekî” xêrxwaz yê serbixwe û Melleyekî di nav xelkê xwe de xwedan navekî pak li herême bihên dîtin û hejkirin, wisa jî li hesabê TST nedihat ku van herdu kesên ne di nav wê de li deverê bibin mirovên xwedan bandor. Ji ber ku Leheng Axa û Melle Boyar li dû bizavên pirrjimar, yên dewletê li aliyekî û yên TST li aliyê din, hîn serbixwe mabûn, herdu aliyan jî ew wek kesên “nedost” û heta “tehlûke” xistibûn lîsteya reş. Rehên rika herdu aliyan li hember Lehengî di nav du salên dawîn de kûrtir bû bûn û va bû bû demek ku berpirsên li şûnên bilind ew ne tenê wek astengeke li pêş amancên dewletê, lê



her weha wek çavkaniyeke ji bo siberoja rolên xwe û hêza leşgerî li herêma Tarê tehlûke dihesibandin.

Leheng pêş dora çar mehan li paytextê dewletê di kombûneke bi cîhgirê wezîra çandê re de beşdar bû bû û ew hêviya jê kiribû ku derbarê bidestxistina rêdana fermî ji bo projeyeke xwe de, projeya damezirandina navendeke çandî û baxçeyekî li bajarê Tarê, bi wî re alîkar derkeve. Li dû ku wezîra çandê derbarê vê projeyê de hat agahdarkirin wê di kombûna wezîran ya bi serokwezîr re ew hanîbû ser zimên. Tevî ku projeyeke çandî, ne yeke siyasî, bû jî serokwezîr ew wek tehlûkeyeke mezin dîtibû û ligorwî “Va projeya ji bo siberoja dûr ji serhildaneke çekdar tehlûketir e bo dewletê.” Di dema kombûna mehane ya bo asayîşa dewletê de, ku tê de berpîrsîne bijarte ligel serokwezîr kom dibûn, serokwezîr serdarê hêzên leşgerî di dema vexwarina qehweyê de bi şêweyekî ne fermî, biribû aliyekî, ew derbarê pîrsa xwe bi projeya Leheng ve girêdida de haydar kiribû û jê re “pêşniyaz” kiribû ku “Hewl bide vê projeyê ber zayînê ji holê rakî.” Lewma rola Leheng di pîrsa lihevhanîna Reşbextiyan û Şekariyan de wek fersendeke zêrîn ket dest serdarê leşgerî û dema General T. nûçeya girtina wî ragîhand serdêr di cîh de kombûneke bo sê hevkarên xwe bi rê xist bo girtina biryarekê, biryara ku dû re bi telefonê ji General T. re hat ragîhandin. Bi gotineke din, ne tenê xelkê û mamûrên dewletê, lê heta bi General T. bi xwe be jî, sedema rasteqîne ya biryara “jiholêrakirina” Lehengî nedizaniyên.

Bo TST jî sedemeke kûrtir hebû. Serkên gellek caran berpîrsê Tevgerê yê li Tarê riswa kiribû, çimkî ligor xwe fêhm nedikir ka “Bo çi gel heta vê royê hîn sed ji sedî ne bi me re ye!” Berpîrsê Tevgerê û hevkarên wî, yên ku bi pîrranî nexwende bûn, tawan bi tevahî dixistin stuyê Lêheng. Wan Serkan ji carekê bêtir agahdar kiribûn ku yê li pêş “kontrolkirina gel bi tevahî” bûyî asteng Leheng Axa bû. Wan kombûnên di beşê jorîn yê Çayxaneya Aramo de cîh digirtin, alîkirina xelkê ji aliyê Weqfa Kaşan Begê ve û rola Lêheng ya civakî wek nimûne didan. Ligel ku wan bi xwe jî dizaniyên ku sedema encamedana daxwaza serokê tevgerê di rastiyê de ne Leheng bû, wan dayîna navê wî wek mertalekî xweparastina ji girtê

Serkên didîtin. Bi encamê ji berpîrsê tevgerê yê li bajarê Tarê re va fermana nerasterast ji Serkên hatibû: “Kesê we behs kiribû ji bo xatirê mesleheta gel ji meydanê bidin rakirin!” A nuha fersendeke zêrîn bo bicîhkirina fermanê bi dest ketibû. Di civîna li Tarê cîh girtî de va tevdêra hat kirin:

Sê çekdarên TST û Halo dê li dû dora du saetan di otomobîleke endamekî tevgerê de ber bi Avdarê ve bi rê kevin. Ew ê ji bajêr ne weqa dûr, li nêzikî şûna ku lê du rê digihîştin hev, xwe di newaleke teng ya li kêleka şoseyê de veşêrin. Hêviya berpîrsiyê ew bû ku cîpa Lehengî berî rojava negihê wir. Li dû rojava Halo dê li kêleka rê raweste û wekî kesekî ku diçêye Tarê destê xwe li otomobîlên di rê de rake. Eger otomobîla raweste ne cîpa Lêheng be, ew ê lêborînê bixwaze û bibêje ku ew li benda dostekî xwe ye. Ger cîpa wî be ew ê ligel wî û Melle bipeyive, berê bi dengê qebe. Ew û Melle Boyar hev baş dinasin. Ew ê jê re bibêje, wî mirina bavê xwe li bajarê Tarê bihîst û bi otomobîlekê ta vir hat, lê çî otomobîlên ber bi Avdarê û Bêcarê di rê de nehatin. Lewma baştir dibîne li bajarê Tarê vegere da ku roja din biçê gundê xwe. Çekdarên tevgerê dê xwe di navberê de bigihînin wî û ew ê ji Leheng û melle bixwazin ku dest ji hemî çalakiyên civatî berdin û bi tevgerê re alîkar bin; yan na, jiyana wan ê di nav tehlûkeyê de be. Ger soz nedan û gotinên zêde kirin ew ê bihên kujtin.

## 10

Te digot qey felekê hemî karê xwe eware kiribû û xwe bi tevahî dabû ber wê yekê ku astengan li pêş rêwîtiya Leheng Axayî û Melle Boyarî bi rê xîne. Di dema xwarina navreyê de, hema ber bi rê kevin, kurê Melle yê biçûk xwazt xwe li ajotina cîpê biceribîne, ew jî bi alîkariya kurê cînarekî ku şofêrî dikir. Leheng ji bîr kiribû kilîta

cîpê jê derîne. Ji mala Melle ne dûr cîp li dîwarekî ket û radyatora wê di nivî de pelixî. Va bûyera ku kesek ne li bendê bû Melle fedîkar derxist û rêwîtiya wî û mêvanê wî dîsa eware kir.

Li Avdarê tenê du otomobîl hebûn, nivotobûseke ku di navbera wê û Tarê de rojê carê diçû û dihat û nuha li Tarê bû û kevnecîpeke cînarê Melle ya ku çûbû gundekî û çav li rê bû piştî rojava vegehiya. Leheng gellekî bêhteng xuya dikir û Melle hem bêhteng û hem şermezar. Li pêş wan çî rê neman ji bilî mayîna li benda vegeha cîpa şofêrê cînar.

Dora demjimêr heşt cîp vegehiya û demjimêr neh ew ji Avdarê ber bi Tarê ve bi rê ketin. Bi dora sîh û pênc kîlometiran ji Avdarê dûr şofêr di neynikê de çirayên otomobîlekê li paş xwe dîtin. Dirêj nekir otomobîl ji wan derbas bû. Bi dora çar kîlometiran ji wir dûr, dema rê ket navbera feydeke li aliyê çepê û girê bi navê Kaşê Kesk li aliyê rastê, trimbêlekê ji nişkan ve li pêş cîpê şewqa çirayên xwe bi jor û jêr ve rakir û danî, wekî ku daxwaza rawestandîne bike. Dema cîpê nêzikî li otomobîla li pêş xwe kir şeş leşgerên çekdar di bin ronahiya çirayên wê de li ser rê diyar bûn. Leheng di cîh de rawestandîna xwazt û cîp bi dora çel-pênçeh gavan ber bigihê leşgeran rawestiya. Wî hest kir ku niyeta leşgeran ne yeke ji xêrê re bû; zû li paş xwe zivîrî û bi dengêkî qebe gote Melle Boyar:

– Boyar, zû dakev, xwe bigihîne nav daran û hewl bide bi dûr kevî. Zû, zû, here, here.

Melle bi xemgînî lê vegehand:

– Ez ê çawa bêyî te biçim? Hela em berê binêrin ka çî dixwazine.

Leheng wek hêrs bûbe zû got:

– Wext nema, bra! Here, here! Pêşbirrîna di vê êvarê de ne ji xêrê re ye! Eger hatim girtin, qe nebe tu xwe bi Tarê gihîne û kombûnê bi rê xe. Bila bêtir neheqî li mêvanên li benda me ne

nebe. Me ew ji rêyên wan eware kirin. Oxira te vekirî be. Zû, zû, ha wa ne gihîştin.

Ji leşgeran çar gihîştin cîpê û yekî ku diyar bû çawîş e fermana daketina ji otomobîlê da, lê Melle Boyar nema êdî tê de bû. Çêwîş li Leheng niherî, ew nas kir û bi dengêkî nizm gotê, “Mixabin dema te li vê dunyayê îşev bi dawî tê.” Serleşgerê ku tev şofêr û neferekî hîn di otomobîla leşgerî de bû nuha daket û hêdî-hêdî ber bi cîpa Leheng tê de ve bi rê ket. Hîn di rê de bû dema pîkabeke leşgerî jî xwe ji aliyê Avdarê ve gîhand wir û bi dora sîh gavan li paş cîpê rawestiya. Di wê de serleşgerek û şeş nefer hebûn. Ew serleşger jî ber bi cîpê ve çû û leşgerên pê re dest pê kirin xwe li herdu aliyên rê bi cîh bikin.

Guman êdî li nik Leheng nemabû ku mebesta leşgeran kujtina wî bû. Ew zû li şofêr fertîlî û gotê bila bireve. Leheng dabenceya xwe kişand û da eniya çêwîş: “Bêje leşgerên xwe bila paş ve herin.” Çawîşê ku ne li benda kiryareke weha bû veciniqî û bi qîrîn ferman da bila her sê leşgerên bi wî re paş ve biçin. Hema pê re Leheng gulleyek ji dabenceya xwe avêt û got: “Çekên xwe biavêjin û paş ve biçin.” Bi vê gotina xwe re wî xwe bi lez ji paş cîpê re gîhand aliyê din yê otomobîlê, bi hêviya ku xwe bigihîne dîreksiyonê û hewl bide cîpê pêş ve biajo. Çîqa kiryareke weha tehlûke bû jî, wî dizanibû ku dawiya bêtevdêrmayînê dê her mirin be. Di bizava ajotina cîpê de, heta ger hêviya serkevtinê ji sedî yek bûya jî, qe nebe bo wî bi xwe ji nebûna çî hêviyê baştir bû. Lê bi encama gihîştina pîkaba çirayên wê vêketî manî, leşgerekî ku nû jê daketibû û xwe gîhandibû aliyê feydê ew û dabenceya di dest de dîtî û du caran teqe lê kir. Yek ji gulleyan li milê Leheng yê çepê ket û ew xist. Gulleya din li şofêr ket û ew li ser piştê xist xwarê. Li dû ketinê Leheng xwe bi zik avêt ser erdê, berê dabenceyê da serleşgerê ji otomobîla yekem ber bi wî ve dihat, ku dabenceyeke tazî nuha di dest de bû, û çar gulle ber bi wî û otomobîla li pêş avêtin. Qîrîn bi serleşgerî ket û ket xwarê. Deng bi çend leşgeran ket û dest pê kirin hema koravîn gulleyan biresînin. Di dabenceya Lehengê brîndar de tenê 2 gulle mabûn. Yek ji wan li leşgerekî ket û ya din li vala çû. Di navberê de leşgeran Lehengê ku nuha bi sê

gulleyan brîndar bû û li ser erdê li kêleka cîpê ramediyabû xistibûn navbera xwe. Serleşgerê di pîkabê de gihîştî ber bi wî ve hat û 3 gulleyên din bi dabeñçeya xwe avêtinê.

Leheng girrekî bi şewat li hember vê neheqiyê di xwe de hest kir, girrekî ku jana xwe ji ya brînan tûjtir û kûrtir bû, lê dirêj nekir aramiyê xwe di nav hişên wî de bi cîh kir. Di nav bîsta bi mirinê ve girêdayî kesereke kûr kişand, ku çima ew di jiyana xwe de bêyî zewac ma, çima çî zaro li dû xwe nehîştin û çima zûtir dest bi projeya xwe nekir, lê poşmanî êdî bêkelk bû. Hewl da hişên xwe bi ramanê, yan dîmeneke, xweş ve mijûl bike. Destgirtiya wî ya ewropayî hat bîra wî, ewa bi encama qezayeke rê bi şêweyê trajîk mirî û li dû mirina xwe tevahiya Ewropayê di çavên wî de ji bexteweriyê vala hiştî. Bîrhanîna vê yekê jî ew dîsa xemgîn kir, lê ji nişkan ve kenekî sivik li ser lêvan xewinî. Ji xwe pirsî: “Gelo em ê hevdu li wî alf bibînin?” Arîna, dosta wî ya li bajarê mezin, hat bîra wî, hunermenda ku wî jê hej dikir, lê erf û toreyên gelê wî rê nedidan zewaca bi yeke wek wê re. Çend rêzên ji straneke wê di nav hişên wî re zû derbas bûn:

*Te dilê min brîn kir bi tîrên evîne demekê  
Bêyî derman hişt ew dilê mest û hejar  
Bihara jiyane xwe dizî û li paş ma delalo  
Rêyên me cihê-cihê gihîştin payîza salan  
Bo tevavjîniya di gola şadiyê de dereng e êdî  
Bêje bila me veşêrin li dû mirinê li yek gorê.*

Wî bi bîr hanî, “Çi heyf min xwe negîhand kombûna me ya li Tarê!” Lê pêbawerîya ku hevalên wî dê projeya wî bi serî bikin ew bi hêvî kir. Ligel xem û hesretên di dilê brîndar de jî deryaya aramiyê hişên wî bi tevahî xistin nav xwe. Dîmeneke bi ronahiyê mişt di nav hişên wî de ket xewanê û nexşeyê rengîn ya Tara mezin hat ber çavan. Navê wê bû bû War, Warê Rojê. Bi hêviya ku hevalê wî xwe ji kemînê azad kiribe kesera dawîn kişand û xwe bêyî tirs da dest mirinê. Di bîsta herî dawîn ya li ser pira di navbera jîne û mirinê de wî day û bavê xwe bi bîr hanî û di nav ronahiyê kûr û xweş de xwe gîhand wan.

Melle Boyar ji rêya otomobîlan bi dûr ketibû. Hestê tawanê ew xistibû bin êşkenceyeke giran. Wî reva xwe wek kiryareke ne qenc didît, dixwazt li hevalê xwe vegere, lê dema dengê teqîna çekan bihîst dizanibû ku vegera wî dê çi encamên baş nede. Bêhna wî piçekî fireh bû dema bi bîr hanî ku ew bi daxwaza hevalê xwe ji leşgeran bi dûr ket, û dema projeya Leheng hat bîra wî ew bêtir bi hêvî bû. Bêhemdê xwe ji dilekî bi şewatê dagirtî du caran li ser hev bang hevalê xwe kir, lê bersîv nehat. Dilê wî tiji girr û hêrs bû bû, girrê li hember dewleteke bêbext ku nedihîşt jiyan bi aramî di rêya xwe de bidomîne. Nifir li karbidestan kirin, reştirîn nifirên ku wateya peyvan dikarin ji xwe derînin. Hêstirên bi encama perîşaniyê û nebûna hawarê ji çavên wî dihatin xwarê rûyê wî şil kirin. Dilê wî piçekî li Xwedê jî ma, çimkî ligel hemî tikayên wî, ku bila bihata hawara wan; ew di wê dem û şûnê de li wan xwedî derneket. Pirsî: “Xwedêyo, tu çima li hember neheqiyê weha bêdeng dimînî?” Û dîsa pirsî: “Çima va neheqiya, çima?”

Leşger li dor Lehengî civiyabûn. Laşê şofêr jî li wir bû, lê ne ye Melleyî. Leşgerêkî ji wan wê de bi cîh bûyî dengê Melle Boyar bihîst, dema wî bang li Lehengî kir, lê xwe lê nekir xwedî û ber bi komê ve hat. Leşgerê ciwan Xelloyê kurê Seydoyê Konreşî bû. Dema hîn xortekî sivik bû ew çendîn car bi bavê xwe re çûbû mala Melle Boyarî. Melle jî du caran di dema biharê de hatibû gundê wan û li mala wan bû bû mêvan. Ew yek ji leşgerên di pîkabê de gihîştinî bû. Hay jê nebû yên di cîpê de kî bûn, lê dema navê “Leheng” du caran li ser hev bihîst wî dengê Melle di cîh de nas kir û texmîn kir ku hevalê wî Leheng Axa dê hatibe kujtin. Nêzikî li koma leşgeran kir, lê tevahiya giyanê wî dilerizî, çongên wî sist bû bûn û wî diranên xwe bi ser hev de guvaştibûn da ku li hev nekevin. Di nav giyan û hişên wî de tirs û girr li nav hev ketibûn û ew dihejandin, tirs ji ber xwedîderneketina li reva Melleyî û girrê bi encama vê kiryara neqenc ku wî nikaribû berbend bikira. Ji çakbextiya wî kesekî di şevreşiyê de va rewşa ew tê de di çav xwe re nekir.

Leşger li dor herdu otomobîlan bû bûn gurên birçî, lê Melle bû bû xwê û heliyabû. Serleşgerî projektora pîkabê vir de-wê de bir û hanî, lê bêşûd bû. Şeva reş û daran Melle daqultandibûn. serleşger nuha diponijî, “Gelo ew ne di cîpê de bû?” Bi fermana wî leşgerekî bi lez galoneke tiji benzîn ji pîkabê hanî, benzîn bi ser cîpê de reşand û agir berdayê. Laşên Leheng Axa û şofêr pênc-şeş gavan ji cîpê wê de li ser erdê man Pîkab tev şeş leşgerên tê de hatinî û laşê serleşgerê hatî kujtin zîvirî Avdarê. Otomobîla din tev serleşgerê duyem, çêwîş û leşgerên ji koma yekem, herduyên brîndar jî di nav de, beri da bajarê Tarê. Yek ji du leşgerên brîndar bi gulleyeke ji tifinga hevalekî xwe giran hatibû brînkirin.

Bi dora bîst kîlometiran ji Tarê vir de Halo dest li otomobîla dihatî rakir û bi rawestandina wê re çawîş û leşgerekî bi lez jê daketin. Li dû niherîna li nasnameya wî çêwîş ew velo kir û dabenceya ligel wî dît. Bi dîtina wê re serleşger jî ji otomobîlê daket.

– Tu diçiyê ku, lawê kerê, û va çi dabence ye?

– Bavê min berî 3 rojan hat kujtin. Ez li hêviya trimbêleke ji Bêçarê me; na, mebesta min, ez dixwazim herim Bêçarê. Trimbêlekê ez gîhandim vir, lê çi trimbêlên din nehatin. Min dixwest dîsa li Tarê vegerim û sibê biçim gundê xwe. Min dabence li Tarê kirî, çimkî ditirsim dijminên me min jî bikujin.

– Serleşger got, ‘Va segbava derewan dike. Rastiyê jê derînin!’

Çêwîş, Halo bi lêxistinê hingavt, lê çîqa lêxist jî wî her sond xwar ku ew rastiyê dibêje. Dema çekdarên TST va dîmena dîtîna biryara hêrîşkirinê girtin. Ji aliyekî ve fersendeke baş bo lêdana leşgeran bi dest ketibû û li milê din, ew bi tirs bûn ku Halo ji neçariyê tevdêra wan û hebûna wan li wir bihîne ser zimên, yan navên wan bide leşgeran. Piçekî din ber bi otomobîla leşgerî ve hatin û leşgerên li pêş otomobîlê li ser lingan dan ber gulleyên reşaşên xwe. Çar leşgerên di otomobîlê de manî jê daketin, xwe avêtin kêleka rê û dest pê kirin gulleyan ber bi aliyê teqînê jê dihatî ve biavêjin. Lihevdanê dora pênc deqeyan ajot. Li dû dora deqeyeke bêdeng

leşgeran dîsa dest bi teqînê kirin û bi miqayitî ber bi hevalên xwe yên li pêş otomobîlê ketinî ve çûn. Serleşger, çawîş û Halo hatibûn kujtin û leşgerê şofêr di zikê xwe de brîn bû bû. Yek ji du brîndarên di otomobîlê de her weha miribû û çend gulleyên reşaşan li cîpê ketibûn. Du leşgerên xwe di şevreşiyê de ber bi çekdarên TST ve livandinî car din dest bi lêteqînê kirin. Yekî din bi rêya bêtêlê serdariya leşgerî agahdar dikir. Ji çekdarên TST yek di hêta çepê û milê rastê de brîn bû bû. Hevalên wî neçar man wî li dû xwe bihêlin, çimkî wan hesabê leşgerên di cîpê de nekiribûn û nuha nedizaniyên ka çend in. Yê brîndar, ciwanekî ku li bajêr nedihat nasîn, bêtirs ji hevalên xwe re pêşniyaz kir ku bila wî li wir bihêlin û biçin. Bi çûna wan re dest bi teqîna li leşgeran kir û ranewestiya ta ku gulleyên wî neman. Herdu leşgeran xwe gîhandin şûna ew lê û bi alîkariya pîlê bi wan re ew dîtin. Berê bi potînen xwe li ciwanê brîndar dan û dû re ew bi xwe re ber bi otomobîlê ve kişandin, lê dema westa bûn yekî ji wan bi gîr û rik lûleya tîfinga xwe nêzike sepeta ciwanê brîndar kir û gulleyek jê avêt. Wan ew li wir hîştin û ber bi otomobîla xwe ve çûn.

\*\*\*

Sibeya yekşemê serdariya hêzên leşgerî li Tarê va beyannameya da weşanên giştî:

“Şeva çûyî komeke ji çetayên TST di navbera Avdarê û Tarê de, bi dora sîh û pênc kîlometiran li bakurê Avdarê, pêşbîrrî li Leheng Axayê xwediyê gundê Saranê girtin, ew û şofêrê wî kujtin û agir berdan cîpa ew tê de. Ligor agahiyên me, rola Melleyê ji Avdarê jî di vê kiryarê de hebûye, çimkî dema cîp ji Avdarê bi rê ketibû ew jî bi Leheng Axa re bû. Pirsaxwe bi Melle ve girê dide balkêş e. Gelo wî xiyaret bi hevalê xwe Leheng Axayî re kiribe û ew dabe kujtin?



Gelo peywendiya wî bi TST re hebe? Yan gelo ew jî bûbe qurbanê çetayan û hatibe revandin? Hêzên asayîşê dê di nav demeke kurt de bersîvên van pirsan bidin.

“Çetayên TST her weha xwendekarekî bêtawan yê ji derve hatibû serîlêdana malbata xwe, kesekî bi navê Halo, dîl girtibûn û mixabin berî hêzên me wî azad bikin kujtibûn. Komeke ji leşgerên me di navbera Tarê û Avdarê de, bi dora bîst kîlometiran li başûrê Tarê, li çekdarên ew revandinî rast hatibû. Li dû şerê çih girtî çetayên çekdar reviyân û miriyên xwe bi xwe re birin, lê termê yekî li dû xwe hiştin. Mixabin serleşgerêk û du leşgerên me yên ciwan şehîd ketin û du brîn bûn.”

Roja duşemê, rojekê li dû ragîhandina hêzên leşgerî, TST ji aliyê xwe ve beyannameya li jêr belav kir, di bin vê sernivîsê de: HÊZÊN XWÎNRÊJ ÊN DEWLETÊ DEREWAN LI GEL Î DUNYAYÊ DIKIN.

“... Em li hember derewên serdariya hêzên leşgerî rastiye didin zanîn:

“Komeke ji hêzên dewletê li nêzikî Bêçarê pêşbirî li otomobîla ku Leheng Axa û Melle Boyar tê de bûn girtin, ew û şofêrekî hejar, bavê 5 zaroyan, bi awayekî hov kujtin û agir berdan otomobîlê. Amanca dewletê wek her dem ew e ku xelkê Tarê berde hev û di eynî demê de wan bitirsîne. Tevî ku Leheng Axa û Melleyê Avdarê ne bi me re bûn û tevî ku em ji hinek kirinên wan ne razî bûn jî, TST rêz ji wan re hebû.

“Di livbaziyeke din de, eynî şevê, têkoşerên tevgerê hewl dan qehremanê ciwan Halo, (ku xwendekarekî ji Romanya hatî serîlêdana welêt; bavê wî jî berî pênc rojan bi amanca dek û dolabên dewletê û aliyên kevneperest li gundê Bêçarê hatibû kujtin) ji dest leşgeran azad bikin. Mixabin berî ew were azadkirin leşgerên xwînrêj ew kujtin. Bi encama şerê çih girtî du serleşgerên şûnbilind û heft leşger hatin kujtin, bi kêmasî sê nefer brîn bûn û otomobîleke leşgerî hat tunekirin. Mixabin têkoşerekî me jî şehîd ket.”

Em li vir vegerin pêncsemê dû nîvro û sibeha îniyê li beşê jorîn ji Çayxaneyaya Aramo.

Dema mêvan pêncsemê dû nîvro bo xwarina navreyê gihîştin salonê, Aramo hat pêrgîna her yekî ji wan. Dû re ew tev daniştin û bi hev re navre xwarin. Êdî bêhna hemiyan fireh bû bû û ew li benda cîhgirtina kombûna êvara îniyê bûn, ku Leheng Axa dê tê de beşdar bibûya.

Roja din, roja îniyê, Aramo û hevalên xwe ji berbanga rojê ve xwe bi amadekirina bo kombûnê ve mijûl kirin. Mêvanên bijarte ji zana û giregirên Tarê, endamên Komîteya Kombûnan û dostên Leheng Axa xwe di navbera 7.30 û 8.30ê êvarê de gîhandin salona kombûnê. Heft mêvanên Aramo ber wan gihîştibûn wir. Lê hîn jî Leheng Axa negihîştibû, ne jî çi agahiyên ji wî. Çavên hemiyan li deriyê salonê û gihîştina wî bûn. Ji demjimêr 9 û şûn ve her ku xulekek derbas dibû xema beşdaran zêdetir û sebra wan kêmîr dibû. Dilên wan, wek şîva bo wan hatibû amadekirin, sar û sartir dibûn. Demjimêr 10ê êvarê Aramo neçar ma şîvê belav bike û demjimêr 11ê êvarê beşxandin ji mêvanan xwazt û got, ku wisa diyar e Leheng Axa hatiye ewarekirin û nikaribûye xwe bigihîne kombûnê. Bi encamê ew ê neçar bimana ku kombûnê bi dawî wînin. Ji hemiyan bêtir her heft mêvanên Aramo wekî ku bêhêvî bûbin xuya dikirin. Dora nîvê şevê bû dema beşdaran dest pê kirin ji salonê biçin malên xwe. Li dû wan tenê Aramo, Rîso, Efrîto û her heft mêvan man. Aramo û mêvanan li hev kirin ku roja din, roja semê, li dû xwarina navreyê kom bibin û binihêrin ka ew ê çi bikin.

Roja şemê, dema nûçeya girtina Leheng Axa û Melle Boyar li Tarê belav bû, Aramo xwe gîhand mêvanên xwe û ew agahdare girtina Leheng kirin.

“Min zanibû bûyereke ne ji xêrê re qewimiye. Ne ji xusetê Leheng Axa ye ku dereng bigihê kombûnan,” got Aramo û domand: “Berê karine grîng ew eware kirin, dû re, roja çarşemê, meriyekî wî û yekî Melleyê Avdarê li gundê Bêçarê hev kujtibûn. Li dû lihevhanîna wan û vegera ji Bêçarê, hema berî bi rê kevin û werin Tarê, ew û Melle Boyar li Avdarê hatibûn girtin.”

Perîşan Pêzan got: “Bi rastî ez gellekî xemgîn bûm bi vê nûçeyê, lê ez nikarim zêde bimînim.”

Ronî Kaşanî got: “Ez jî nikarim ji duşemê şûn ve bimînim.”

Aramo cigare bi cigareyê vêdixist û şaş mabû çî ji mêvanan re pêşniyaz bike.

Rêsîn pirsî: “Baş e, tevdêrên te nuha çî ne?” .

Aramo bersîv da: “Bawer nakim Leheng Axa di hebsê de dirêj bike. Ez dibêjim ew ê wî îroj berdin.”

Pîrên pirsî: “Lê eger bernedan? Em nikaribin biçin dîtina wî li Avdarê?”

Aramo got: “Em dikarin, lê pirsra grîng projeya wî ye û li Avdarê ew pirsra çareser nabe. Ez dibêjim em ta sibê li bendê bin, ka çî dibê.”

Ji mêvanan yê herî temenmezin mirovekî bi navê Çeçanê Remo bû. Ew di ciwaniya xwe de yek ji wan peyayên Kaşan Begê bû ku serpereştîya gundên wî dikirin. Li dû mirina Kaşan Begê eşîra Çeçên xwîni bû bû û ew ligel endamên malbata xwe reviyabû aliyê jêrîn yê Tarê û li wir bi cîh bû bû. Berî çend rojan nameyek ji Leheng Axa gihîştibûyê, tê de ew vedixwand Tarê û jê dixwazt ku bi gihîştina xwe re nameyê bide Aramo. Ji mêvanan Aramo tenê

ew dinasî, lê ji yê din re weha raber nekiribû. Li vir Çeçanê Remo peyivî û got:

– Ez bi xwe bêyî ku Leheng bibînim ji vir naçim. Wî em bêsebeb dawetî vir nekirine. Bêguman karê wî bi me heye û ez dibêjim ew ê baş be ku em li benda wî bimînin.

Bêguman Çeçên hay jê nebû ku kesên wek Pîrên û Rêsin li derve xwedan rol û kar bûn û dê nikaribûna bo demeke ji dema bernameya xwe dirêjtir li vir bimana.

– Aramo got, ‘Xwedê ji te razî be Apê Çeçan, tu rast dibêjî.’ Serê xwe ber bi Rojperestê ta nuha bêdeng mabû bada û domand: ‘Lê li milê din, ez dizanim ku hinek ji mêvanên hêja nikarin li vir dirêj bikin. Heke mumkun be, ew ê baş be em ta duşemê li benda hatina Leheng bimînin. Dîtina te çî ye birêz Rojperest?’

Rojperest got: “Minîş intîzarî kak Leheng dekem.”

Aramo ji mêvanan tika kir ku ta êvara duşemê bimînin û ger ta wê demê çî agahî ji Lehengî negihîştin, kê dikaribû bila bima û yê nedikaribû bila bi rêya xwe ve biçûya.

\*\*\*

Roja yekşemê nêzikî nîvro mêvan di salonê de li dor maseyekê danîştibûn û dizanibûn ku rewş ne ligor ku Aramo dipa didomiya. Wan di çav xwe re kiribûn ku Rîso jî ne yê berê bû. Wî ne ew yeko yeko biribûn ser maseyên wan, ne jî îroj rûkenok bû. Li bervaciya rojine par, li ser maseyên wan tenê nan, av, hêkên kelandî, zeytûn û çayê hatibûn danîn.

Demjimêr bû bû 12.30ê dû nîvro, dema Aramo ket hindir. Yek bi yek dest da mêvanan û li rewşa wan pirsî. Herdu çavên wî sor bû bûn, dengê wî wek mirovekî ku hema dike bigirî dihat. Aramo yê ku berê devkenok, porşehkirî û ligel bedena xwe ya girs jî sivik li ser lingan xuya dikir îroj xemgîn û porhinc bû, giran-giran dimeşiya. Ne porê wî hatibû şehkirin, ne jî rîhên wî hatibûn kurkirin; û simbêlên wî yên ku berê bi şimayê li hev dihatin badan a nuha bêxwedî mabûn, çilmisî bûn û bi ser lêvan de daketibûn. Ew hem wek kesekî fedîkar derketibe û hem jî wek mirovekî di bin barê xemên giran de binale dixewinî. Li dû ku rojbaşî li her heft mêvanan kir çû cem Rîso, bi wî re peyivî û dû re herduyan heşt sendelî li dor maseyeke guloverîne mezin bi cîh kirin. Aramo dîsa li mêvanan vegeheriya û ew vexwandin dor maseyê.

Aramo got: “Niza’ m çawa dest pê bikim!” Paketa cigareyan û heste ji beriya destê rastê hanîn der û berî yekê jê derîne û vêxe, ew dirêje mêvanan kir. Ji bilî Ronî Kaşanî û Perîşên hemî kesên li dor maseyê nuha cixgre vêxistibûn. Aramo dîsa dest bi axaftinê kir û got: “Ez ji we hemiyar bexşandinê dixwazim û di eynî demê de ji we re spas dikim ku we li me sebir kir û bêhnfireh man. Ev erdê ku çayxane li ser e berê şûna koşkeke Kaşan Begê bû. Kaşan Beg peyakî wêrek û welathej bû. Erê, pîrr kesan ew wek stemkar bi nav dikirin, lê rastî ne weha bû. Ew li hember serdestan, bêbextan, mirovên şerûd û dijminan stûr bû; lê li xelkê xwe xwedî derdiket û qedrê cotkaran, rêncberan, dostên dilsoz, bazirgan û firoşkarên rêpak bilind digirt û alîkariya wan dikir. Dewlet li hember wî bi nefret bû, lê peyayên wê jê ditirsiyan û xwe wek dost raber dikirin. Hinek ji wan rast jî dostên dilsoz bûn. Di dema Kaşan Begê de va herêma tenê *bi nav* di dest dewletê de bû. Di rastiye de karbidest Kaşan Beg û peyayên wî bûn. Bavê min tum digot ku wî di dilê xwe de meraqa birêxistina dewletekê kiribû, lê nedixwest herêma têxe bin hêrîşên hêzên dewletê; çimkî dizanibû hêza wî tere serkeftina li dij wan nedikir – dizanibû ku rewşa xelkê wî ji bo xwebirêvebirinê ne amade bû; haydar bû ku welatên din ê nehatana alîkariya wî û gelê wî. Heke bihatana jî amanca wan ê ne yeke pak bûya, û agahdar bû ku di nav milletê wî bi xwe de hinek

beg û şêx û axayên ji dewletê yan alîne biyanî re xulamî dikirin hebûn. Ew baş ji rewşa berfireh ya herêma xwe haydar bû. Bapîrê wî li sirgûniyê miribû, bavê wî çar caran hatibû sirgûnkirin, ap û bra û xizmine wî di şerên bi hêzên dewletê re hatibûn kujtin, milletê wî bi encama serhildanên beravêtî rastî dijwarî û zehmetiyên giran hatibû, pêşvaçûna herêmê eware bû bû. Loma, nedixwest bêyî tevdêr û amadebûn dest bi serhildaneke din bikira.”

Di vê bîstê de derî hat lêdan. Li dû ku Rîso derî vekir peyakî bejndirêjî bi temenê dora pênceh salan ket hindir. Bîstekê ew û Rîso bi hev re peyivîn. Dû re Rîso nêzikî li Aramo kir û di guhekî wî de kire kustepist. Aramo bexşandina xwe ji mêvanan xwazt, çû cem peyayê ketî hindir û rojbaşî lê kir. Yê hatî xwe wek Osikê ji gundê Tûzikê (gundekî di navbera Kaşê Kesk û Çiyayê Hîvê de ye), da nasîn. Ew wek mirovekî hejarî, ku cotkar yan şivan be, dihat ber çav. Simbêlên wî ji kişandina titûnê zer bû bûn û rîhên wî bi kêmasî hefteyekê nehatibûn kurkirin. Aşkere bû ku bêxew û birçî û mest e, lê ew bizava dikir ku weha raber neke. Mirovên wek wî, ligel hejarbûna xwe jî, kesên serbilind û xwediyên hêzeke hindirîn ya taybet bûn, hêzeke ku li nik wan arambûna di demên dijwar de û pêkaniya ku bi rojan bênan û bêxew bimînin, lê dîsa jî xwe li pêş xelkê biçûk nekin, bi cîh dikirin. Mirov dikaribû ta mirinê piştta xwe bi wan girê bida. Di kûraniya dilên va şêwe mirovan de çaviyeke dilsoziyê û xwedîderketina li dost û hevalan her zindî mabû. Dilpakiya bi nas û cînarên re li nik van mirovên çolî ta wê radeyê kûr bû ku kesên xasûk û cilq di nav bajariyan de bo vê yekê ew carine wek “bêçare” yan “xeşîm” bi nav dikirin.

Osikê du pelên kaxezî ji paşûla xwe derxistin û bêyî bipeyive ew derbasî Aramo kirin. Kaxez qermiçî bûn û ne di zerfan de bûn. Aramo yek ji wan vekir û dît ku navê Melle Boyar di binî de ye, lê ji wî re nehatiye şandin. Bi dîtina navê Melle Boyar re ew veciniqî, lê veciniqandineke bêtir hindirîn ku hîşt dilê wî bi lez lêbide. Di ber xwe de got, “Şukur hîn zindî ye.” Nameya din ji wî re bû:

*“Birayê hêja Aramo,*

*“Me Leheng wenda kir. Ez bi awakî nakeve aqilan, bi saya kek Leheng û Xwedê, ji mirinê filitîm. Lê li dû çûna birayê qedirbilind Lehengê Kaşan Begê azadbûna ji mirinê jî bo min her bi şîn dimîne. Wexta min rê nade her tiştî bi dirêjî ji te re zelal bikim. Lê ji dest hat ez bi saya wî peyayê dilsoz vê nameyê ji te re bişînim. Qedrê wî bigir, xwarineke xweş bidê û hinek pere jî, da ku bi wan tiştina li bajêr ji zarokên xwe re bikire. Ew ê peran negire, lê illeh bidê. Hêviya Leheng ew bû ku xwe bigihînim bajêr û em tev kombûnê bi rê xin. Ew ji bo derengmayîna wê û ewarebûna mêvanan gellekî xemgîn bû; lê tu dê bizanibî ku ez ê nema bikaribim werim bajêr.*

*“Eger ne şaş bim mêvanekî bi navê Rasîn ê li cem te be. Çenteyek bi wî re ye. Wek şana pêbaweyî jê re bibêje ku di çênte de şes ferhengên zimanan hene û Jan Bazirganiyan ew ji Leheng Axa re şandine. Wî çenteyî û nameya din bigihîne Locan Efendî. Rica dikim wan bi destê xwe bi wî gihîni. Çi bibe jî wan ji wî pê ve mede kesekî. Naveroka nameyan bila tenê di navbera te û Locan Efendî de bimîne. Ji kesekî re tişteki derheqê min de mebejin û bila kesek nizanibe ku Osikê name ji min gîhandin te. Eger kesekî pirsî, bibêje ew hatibû perene ji te deyn bike. Min li wî jî eynî tenbe kiriye. Hêvidar im hûn projeya Leheng bi ser xin. Eger mirin rê li me nebirre em ê rojekê dîsa hev bibînin. De bi xatirê te: Melle Boyar.”*

Aramo berî hatina Osikê haydare mirina Lêheng bû, lê wekî ku nexwazibe bipejirîne, wî va nûçeya nebixêr di nav dilê xwe yê şkestî de xistibû nav gorê û nedixwazt wê derbasî mêvanên xwe bike. Heta li dû vegera li maseya wan jî jê nehat ku rasterast vê nûçeya reş ragihîne. Dîsa ji wan re aşkere kir ku her tiştê bi mayîna wan ve girêdayî ji tevdêra Lehengî bû, ku wî, Aramo, tenê fermana wî bi çîh dihanî. Careke din bexşandin xwazt û bi dengekî nuha kelgirî got:

– Lehengê me ji nav me çû. Bêbextan şeva çûyî ew li ser rê kujtin.

Girî dengê wî di gewriyê de qurçifand. Ew nuha wek zarokekî digiriya. Vê nûçeyê mêvan hejandin, hemî xistin nav şîneke kerr û ji

wan yekî, Çeçanê Remo, bêhemdê xwe got, “Na lo!” Bi gotina “Na lo” re ew di şûna xwe de bû wek kevirekî. Li dû dora pênc xulekan ji nişkan ve orînê pê ket û dest bi girî kir. Nûçeya kujtina Leheng agir bi kezeba vî kalê delal xist, ew kezeba ku di jiyana xwediyê xwe de çendîn car hatibû şewitandin.

Ji babetên giriyê mirovan yê peyayên pîr bandoreke kûr li mirov dike. Çeçanê Remo bi tîn digiriya. Ji bo wî, bi mirina Lehengê re begê Tarê yê herî dawîn ji nav çûbû. Çecên di wî de qe nebe beşekî ji Kaşan Begê didît. Ew bi dilekî tiji şadî hatibû bajarê Tarê, ne tenê ji ber ku dê li dû salên dirêj bajar û dostine demên par dîsa bidîtana, lê her weha ji ber ku çavên wî dê pêş mirinê li Lehengê kurê Kaşan Begê, yê ku di dilê wî de xwediyê şûneke taybet bû, ketana. Va nûçeya malwêran meraqa di dilê wî de xist nav gorê û agir bi hêviya ku va bû bûn çend roj hestên bexteweriyê li nik wî vejandibû, xist. Hemî kesên li wir bi wî re digiriyan, heye ku bi encama giriyê wî yê ji dilekî agirpêketî. Li dû bîstekê Rêşin û Pîrên bi hev re xwe gîhandin wî û kirin ku wî ji nav agirê xemê û lehiya hêstiran derînin.

Li dû dora saeteke hema-hema bêdeng Aramo gote mêvanan ku ew ji vê bîstê û şûn ve azad in, lê di heman demê de ji wan tika kir ku xwe ragirin. Ragîhand ku dê nuha biçûya dîtina dostekî şareza bo axaftina derbarê pirseke gellekî grîng de û dê li dû vegeê ew derbarê wê pirsra grîng de agahdar bikirana. Mêvanan razemendiya xwe raber kirin û gotin ku ew ê li benda wî bimînin. Pêş xêtir ji wan bixwaze Aramo, Rasîn ber bi aliyekî ve bir û derheqê çênte de bi wî re peyivî.

## 12

Lehengê Locan Efendî berê derbarê tevahiya projeya xwe de agahdar kiribû û hemî kaxezên bo destpêkirinê pêwîst îmze kiribûn. Baweriya wî bi parêzerê qanûnî bêsînor bû; ji salan û vir ve



bû ku ew bi hev re wek du bran bûn. Wî ew bi şêweyeke fermî kiribû wekilê qanûnî yê hemî mulkên xwe. Locan haydar bû ku Kaşan Begê zêrekî pirr dabû Kêvorkê ku demekê wek Kêvoyê Bazirgan li herême dihat nasîn, da ku bi xwe re bibe Amerîkayê. Di navbera wî û Kêvork de pirseke nixamtî hebû ku ji wan pê ve kesek jê ne haydar bû. Bi derbasbûna demê re Kaşan Begê ew pirsra dabû aliyekî û dema ji nişkan ve miribû pirsra nixamtî mayî jî bi wî re ketibû gorê. Lê Kêvork berî mirina xwe hatibû serlêdana gora Kaşan Begê, her weha çend caran name ji kurên wî re şandibûn. Dû re peywendî di navbera wî û wan de hatibû birrîn. Berî demekê Lehengî Locan Efendî agahdar kiribû ku peywendiyê nehenî di navbera wî û Jan, kurê Kêvork Bazirganiyan, de heye, ku Jan li Amerîka dewlemendekî navdar e... Her weha ew agahdar kiribû ku Jan dê bi encama şîreta bavê xwe milyonek dolar ji wî re bişanda, ku herduyan li hev kiribûn ew pereyan ê beş bi beş bihatana rêkirin. Leheng ji parêzer re gotibû ku wî dê van pereyan li projeya bo Tarê xerc bikirana, projeya ku wî ew derbarê wê de agahdar kiribû.

Nameya ji Melle Boyar gihîştî Locan Efendî ew agahdar dikir ku "Beşekî emaneta ji Jan di çênte de ye." Li dû xwendina nameyê, wî li karmendên xwe tenbe kir ku ew û Aramo dê derbarê pirseke grîng de bi axaftana û navê kesekî kombûna wan ewarê bikira. Wî derî girt û çênte vekir; tê de şeş ferhengên zimanan hebûn. Li ser yekemîn rûpela her yekê ji wan *"To our dear friend Leheng: from Jan Bazirganiyan"* (Bo dostê me yê hêja Leheng: Ji Jan Bazirganiyan) hatibû nivîsandin. Çiqa herduyan li ser û bin û hindirê çênte niherîn û çiqa rûpelên wan pirtûkên qalind vir de-wê de birin û hanîn jî, ew rastî şopa çî pereyan nehatin. Gellekî xemgîn bû bûn, keser dikişandin û hema-hema li Rêsin ketibûn gumanan. Locan Efendî dû re cawbirek ji dexîleya maseya xwe hanî der û dest pê kir astarê çênte ji aliyekî ve bi wê biqetîne. Dema astarê binê çênte livand di bin de çermekî qalind hebû. Wî aliyekî çêrm hêdî-hêdî bi cawbirê birrî û naylonê di bin de bi aliyekî ve kişand. Ji nişkan ve çavên wî li tûrikên tiji pere ketin. Bi vecinîqandina wî re stuyê Aramo ber bi çênte ve kişiya û ahîni bi herduyan ket. Di çênte de 100 000 dolar hatibûn bicîhkirin. Deh desteyên her yek ji

wan bi sed pelên sed-dolarî di nav qabên zîv reng de hatibûn bicîhkirin û her yek ji wan qaban di nav tûrikekî cawîn de bû, tûrikê ku ji hemî aliyan ve hatibû dirûn. Şeş tûrik di binê çênte û çar di kêlekên hindirîn de hatibûn bicîhkirin. Bêguman va çenteya ji aliyê hosteyekî zîrek ve bo vê amancê hatibû çêkirin.

Ji bo aşkerekirina projeya Leheng Axa birêxistina kombûna dereng mayî pêwîst bû û divabû ji bo xatirê wan heft mêvanên Aramo zû cîh bigirta. Locan û Aramo ketibûn wê qeytê ku berpîrsê giştî yê dewletê li Tarê projeyê nepejirîne. Li aliyê din, guman tê de nebû ku TST û rêxistina bi navê Cemaeta Ummeta Muwehhed (CUM) ê mirîdên xwe li dij projeyê bihêvotana. Herdu peya bi tirs û xem bûn, lê di heman demê de, nuha ku Leheng ne li vir bû, xwe wek berpîrsên projeya wî dizanîn. Tevî tirs û xemgîniya di dilên wan de dilipitîn jî, çî guman li cem herdu dostan nebû ku ta ew li vê cîhanê zindî bûna dê bi her awayê ku ji dest dihat bo birêxistin û serkeftina projeya bo Tarê têbikoşiyana.

Herdu mirovên ku hev û din ji rojên zarokiyê ve dinasîn û dostaniyeke dilsozane di navbera wan de hebû, ligel ku gellek kes ji kûrbûna wê ne haydar bûn, dest pê kirin xwe bi tevdêrên bo bidarxistina kombûnê ve mijûl bikin. Kombûnê divabû êvara çarşemê di salona mezin ya Çayxaneyê Aramo de cîh bigirta. Hemî endamên Komîteya Amadekarên Kombûnan ê bêyî derengî bihatana agahdarkirin û kombûneke bi beşdarbûna wan dê îroj êvarê cîh bigirta. Tevdêrên bo kombûna çarşemê divabû bihatana birêxistin û şûn ji cîhgirtina çî şaşiyên re nehata hîştin.

Li dû vegera li çayxaneyê Aramo mêvan haydare kombûna çarşemê êvarê kirin, ji wan bi germî tika kir ku ta wê demê bimînin û soz da ku ji sibeha pêncşema li pêş û şûn ve ew ê serbest bûna. Wisa diyar bû ku mêvanên ta nuha hatinê ewarekirin jî dixwaztin xwe bigihînin binê va bîra ta nuha di tarîtiyê de mayî. Wan bi erênî bersîv dan, lê bi şertê ku ji vir ta çarşemê serbest bin û dema bixwazin biçin der. Zatî ew ê di rakirin û binaxkirina cenazeyê Leheng de jî beşdar bibûna. Tiştêkî Aramo li dij vê daxwaza wan

nebû, ji bilî wê yekê ku her tiştê xwe bi kombûnê û dema wê ve peywendîgir dikir nixamtî bimaya.

### 13

Termê Leheng Axa yekşemê dû nivro di sarinceke beşê terman yê nexweşxaneyê Tarê de hat bicîhkirin û veşartina wî bo roja sêşemê hat hiştin. Duşemê dû nivro her sê brayên wî tev jin, kur û keçên xwe gihîştin û ta êvara wê rojê dora 80 kesên din (ku bi pirranî hevalên Lêheng û dostên malbata wî bûn) ji şûnên cuda her weha xwe gîhandin Tarê. Sibeha sêşemê dora 300 kesên li goristana bajêr gihîştibûn hev, dema di bîsta dawîn ya ber binaxkirinê de otomobileke gewravîn gihîşt goristanê. Jineke bi kincên reş jê peya bû û bi meşeke xatûnî di navbera du peyayên ku her weha ji otomobîlê daketibûn de ber bi koma li ser gorê ve hat. Ligel ku şalek avêtibû ser serê xwe jî brayê Leheng Axa, *Şanî* ew nas kir û çû pêrgîna wê. Li dû ku herduyan rûyên hev û din maç kirin û çend hevokên kurt hanîn ser zimên herdu ber bi komê ve çûn. Bi gihîştina gorê re Şanî kefen ji ser rûyê termê Lêheng rakir. Li bervaciya jinên Tarê vê jinê ne kire qîrîn û ne jî li xwe xist. Ew bi ser termê di tabûta vekirî de xar bû û eniya yê mirî bi sivikayî ramûsa – ramûsana wê tişteki ku ne ligor erf û toreyên herêmê bû. Dû re şofêrê wê guleke sor ji nav kaxezeke naylonî derxist û da dest wê. Jinê gula sor li ser kêfen danî û Şanî dîsa rûyê yê mirî nixamt.

Gora Lehengî li teniştaya bavê wî, Kaşan Begê, bû. Li dû nimêja li ser têrm, ku tenê peyan kir, Melleyê Tarê, Melle Rayî, dest bi axaftinê kir:

“Lehengo, em bi navê Yezdanê gewre û dilovan te dispêrin xweliya pak ya vî xakî. Tu îroj li Xudayê bilind yê erd û asîmanan û li bavê xwe Kaşan Begê dibiye mêvane. Bavê te mêrekî lewend û

wek navê te leheng bû, bi sam, lê ne stûr bû. Tu nuha ji cîhana fanî xêtir dixwaziye û riya li pêş te dê te bigihîne cîhana herdemî. Riya te vekirî ye, çimkî tu mirovekî amancbedew û mebestpak bûyî. Herdu Melayîkeyên bihên pêş te dê bi wê yekê baş bizanibin, çimkî deftera kiryarên te li cem wan e.

Lehengo, însan bi hezaran sal li cîhana me bimîne jî dawî her mirin e. Mirinê xwe ji kesekî veneşartiye, heta ne ji pêxemberên Xwedê jî. Ew qas mirovên navdar li vî erdî bûn mêvan, ji welî û feqîyan bigir ta fîlosof û şarezayan, ji rêber û zanyaran bigir ta ronakbîran û nivîskarên afirmand yên mezin, mirin li pêş hemîyan bû. Xweristê bi daxwaza Yezdanî tu gîhandibûyî vê cîhanê, lê mirinê pêşî li te jî birrî û jiyana te bi encama reşkiryarekê bi dawî hat. Tu hîn ciwan bûyî di nav me de, bêzewac û bêzaro; lê qedera te weha hatibû nivîsandin. Ligel hemî şewat û jana li ser te di dilên me de, ma em kî ne ku bipirsîn, çima! Em tenê dizanin ku ji roja va gerdûna bêsinor ketî hebûnê û vir ve rindî û nerindî li kêleka hev di rê de bûne, wek roj û şevê. Bi dirêjîya dema hebûna mirovan li ser vî erdî gellek caran çakmerdan nêrxê reşkiryarên bedmerdan dane. Lê Xwedê tenê aliyê baş ji mirovan dixwaze û li ewên çakmebest û qencamanc xwedî derdikeve. Ew gunehkaran ji bîr nake û dê wan zû be, dereng be, bo nerindiyên wan bide sizakirin.

Em spasdaran Yezdanî ne ku fersenda jiyane da me û em bo kurtedemekê bi xweristê re kirin yek. Tu jî bibêje spas Xuda! Te êdî xwe gîhand aliyê bedew, aliyê ku lê bedmirov nikarin bi nerindiya xwe mirovan biêşînin û kesên şerûd nikarin mafên yên din ji wan bigirin. Tu êdî di nav yên ber xwe de yî, li cem day û bav û zizmên xwe, li wî aliyê ku em ê hemî rojekê lê bibin daniştvan.

Lehengo! Bi navê Yezdanê dilovan yê mehreban, bi navê xwîşk û birayên te yên tu li nik wan bêhempa nerxibilind û navşêrîn î, bi navê dostên te yên li vir û yên ne li vir û bi navên me hemîyan em giyanê te didin xweliya pak û canê te dispêrin Xudayê bexşmend û behušta wî ya herdemî. Bila Yezdanê mezin ligel te be û oxira te vekirî be. Em yên Xwedê ne û dê lê vegerin. Rehma Yezdanî li te be, Lehengê kurê Kaşanê Warî.”

Piraniya beşdaran peya bûn. Tenê neh jin û keçên malbata Kaşan Begê û jina nû hatî li wir bûn û ji gorê wê de rawestiyabûn. Hema-

hema çavên hemiyân, bi jin û mêran ve şil bûn û li vir û wir dengê girî dihat. Bi dawîhatina gotinên Melle Rayî re brayê Leheng yê mezin bexşandin ji Mileyî û beşdaran xwazt û van peyvên hanîn ser zimên:

“Lehengê me bi şêweyeke ku kesekî çaverê nedikir ji nav me çû. Gellek daxwaz û meroqên di dilê wî de dê bi wî re têkevin gorê, lê bila em li vir meroqeke wî bi cîh wînin û bila Kamoyê Çînoyê Deştî ku ji çakbextiya me di demê de gihîşt û bi me re hat Tarê bi dengê kencana xwe xatirê me hemiyân ji brayê me yê delal bixwaze. Zatî Lêheng jî li benda wê rojê bû ku Kamo vegeriya welêt û bi dengê kencana xwe xelkê Tarê şad bikira. De fermo xwarzê, fermo!”

Xortekî çelengî bi porê reşî ku xwe hema-hema digîhand ser milan, kemenceke xweşik di dest de, ji nav beşdaran xwe gîhand tabûtê, serê xwe bo rêzgirtinê bîstekê bi ser têrm de xwar kir, bi gavekê paş ve çû û dest pê kir bi kencana xwe re têkeve yariyeke hunermendî. Dengekî bi sihreke yezdanî dagirtî dest pê kir xwe di nav goristanê de belav bike û bigihîne guhan. Kemenc dinaliya, lê nalîna ji wê dihatî der hemî şanên hunera bedew û hestên wûjdanî yên ciwanmerdan di nav hev de dikelandin û bi meqamekî pîroz digîhandin guhan. Di vê nalîna di heman demê de bedew û xemafer de şopên trajêdî û hunerî yên gellek dem û şûnan xwe digîhandin hev, ji trajêdî û hunera demên Atênaya kevnar bigir ta bedewiya berhemên hunerhejên wek Beethoven û Mozart li dû xwe hîştî; û ew hemî tevli ava rûbara çanda xelkê Tarê dibûn, rûbara di rojên ronahîperestiyê de der bûyî û xwe gîhandî rojên îroyîn. Dengê ku Kamo ji kencana xwe dihanî der bû pireke ku dê jiyân û mirin bigîhandana hev, pireke ku li ser çemê hunerê zindî û miriyên goristanê bi hev re dixistin têkiliyê. Dengê kemencê hestên germ ji nav hişan û dilan dilivandin û ji kelexa wan hêstir bi çavan dixistin û bi ser gupan de dihanîn xwarzê. Nebûn di ferhengên zimanên mirovên li ser vî erdî de ew peyvên ku bikaribûna tevahiya nexê xwebêja vî dengî bidin.

Hunermendî hêstirên ji kûraniya hestên hindirîn der bûn û xwe ji navbera bijangên çavên qurç manî re gîhandin ser rûyê wî bi

destmaleke spî ziwa kirin, destmal û kemenc danîn ser kefenê li dor termê di tabûtê de û kelgirî xatir xwazt. Li vir keçeke zirave narîn, keçeke ji ewên ku ji meş û liva wan diyar dibe ew ji pašerehên malmezine arîstokratî ne, malbatên ku berê di nav xelkê Tarê de bi nav û deng bûn, lê çirayên wan yek li dû ya din bêşop vemirîn, xwe gîhand têrm, kaxizek ji beriya xwe hanî der û dest bi xwendina van rêzan kir:

“Apê minî hêja, me tu têt nedî malava! Ka ew sozê te dayî min? Te gotibû em ê bi hev re biçûna giraveke dût, giraveke ku dostekî te lê bû bû mêvanê wendabûnê. Te gotibû em ê mehekê li teniştê pêlên Deryaya Aram bi hev re bin. De ez ê nuha bi kê re biçim wê girava dût û ez ê çawa wî dostê te yê xwe lê veşartî bibînim? Te nav û navnîşana wî hevalê rûpelên nexşeya rê çirrandî û bi xwe biryara sirgûniya xwe girtî jî nedan min. Te jî heman biryar girtiye, apê hêja! Tu jî ji nav Tarê û tariyan diçiyê sirgûniyê! Me çi kiribû bi Yezdên, apo, ku qedera me tiji sirgûnî û dûrbûna ji hev kiriye!”

Brazêya Lêheng van gotinan dihanîn ser zimên, bêyî ku bigirî. Di nav dengê wê yê melayîkî de şanek hebû ku aşkere dikir çawa evîneke kûr di dilê brazêyekê de bo apekî hêvan girtibû. Heft çem û rûbarên ji gola hêstirên aşmenêzikan û qîrînen ji hezar jinên rojhilatî jî dê nikaribûna wek vî dengî şewatê têxin dilan. Wê domand:

“Apê li ber vî dilî weqa bi nêrx! Bi salan e ez li benda zemawenda te bûm. Min digot, apo ji xwe re bûkekê bibîne, yan bihêle ez ji te re li yekê bigerim, lê te her digot hîn dem nehatiye. Va ye tu xatirê xwe ji me dixwaziye û ez ê ta roja mirina xwe hêvîşkêstî li benda hatina roja daweta te bimînim. Ez ê bedewtirîn kulîlkên cîhana me sal bi sal ji te re di baxçeyê hewşê de biçînim û her bihar gurzek gulên reng-reng ji bo te biparêzim. Were serîlêdana me, di xewnên şevan de be jî were. Qe nebe rojeke biharê were li gulên min bibe mêvan.

“Ez ê li vir çi gotinên derheqê yên rê li jiyana te birrîn de nekim. Bila navên wan va bîsta me ya bi hev re gemarî nekin. Tu beşekî ji

rindiyê yî û rindî meraqa Xwedê ye. Ew kesên bed in û Xwedê ji bedan hej nake. De bi xatirê te apê delal, de bi xatirê te.”

Birayên Lehengî bexşandin ji dost û hevalan û ji giregirên Tarê xwaztibûn û tika kiribûn ku bila çî axaftinên zêde dema binaxkirinê cîh negirin. Lê di dema axaftina brazêya wî de pênc gundî gihîştin wir û mezinê wan li dû dawîhatina axaftina keça bedew çû dest da kurê Kaşan Begê yê mezin û bi wî re peyivî. Dû re gundiye kal û çar peyayên bi wî re çûn ser tabûtê û Fatîhe xwendin. Kalê, van gotinan hanîn ser zimên:

“Tu ciwanmêrekî dilpak bûyî, Lehengo. Xwedê rehma xwe li te bike û te têxe cenneta xwe. Şêniyê Soranê li ser te bi şîn e û ji min xwestin ji ber wan ve Fatîheyê li ser te bixwînim. Mizgînê bidim te ku Xezalê şûna te girtiye. Ew li dû hatina xebera reş pîr giriya, lê sibeha roja din me hew dît ku xûşka te bûye dêweke jinan. Bi Xwedê, tu dibêjî qey ruhê Kaşan Begê xwe di bedena wê de bi cîh kiriye. De bi xatirê te peyayê bi xîret û namûs.”

Termê Lehengî ji tabûtê hat derxistin û ligel kemencê, destmalê û gula sor di gora wî de hat bicîhkirin. Sê paliyan dest pê kirin gorê tiji xwelî bikin, lê gundiye îxtiyar ji wan tika kir ku wî karî bispêrin wî û hevalên wî. Gundiyan xweliya li wir hêdî-hêdî berdan gorê ta ku tiji bû û paliyan kevirên wê li ser û dorê bi cîh kirin. Yê li wir dest pê kiribûn ber bi deriyê goristanê ve bi rê kevin. Tenê Şanî, jina wî, du zarokên wan, jina dû re hatî û herdu peyayên bi wê re li wir man. Berî ew jî ji wir bi rê kevin Şanî jina mêvan bi jina xwe û herdu zaroyan da nasîn: Arîna Xatûn.

Gundiyan heft kavir bi xwe re hanîbûn Tarê, ew li wir serjê kiribûn û goştê wan li hejar û belengazan belav kiribûn. Li gund bi xwe şîn bû, rojê bi sedan kes ji gundên herêmê dihatin şûna Leheng Axa. Xwîşka wî Xezal, ya ku berê wek jineke weqa jêhatî nedihat nasîn, nuha bû bû xwediya kesayetiyeke bi tevahî ji ya berê der û şûna brayê xwe girtibû. Yê ew dinasîn li wê mat mabûn, çimkî “wek mêrekî” bi rola mazûvaniyê radibû. Rehekî xilmaş ji koka pêşiyar xwe di wê de vejandibû. Hinekan digotin, “Wah! Xezal bûye Kaşan

Beg, lo! Eynî şûna bavê xwe girtiye! Çi jin e! Wey xwîşka min kiribe!” Vê kesayetiya nû ya Xezalê gundî gellekî kêfxweş kirin û wan ji nuha ve dizanibûn ku ew ê bi hev re pêrgî siberojeke xweş bihên.

## 14

Tirsa amadekarên kombûnê ew bû ku TST, CUM, yan peyayên dewletê berî kombûna êvara çarşemê, yan dema cîhgirtina wê, kêşeyan bi rê xin. Ji ber ku Locan Efendî soz ji berpîrsê fermî yê Tarê bi dest xistibû ku kombûnên bijarte yên di Çayxaneyaya Aramo de dê bêyî çî serêşiyeye ji aliyên fermî ve bihatana hîştin, bi şertê ku wan xwe rasterast nekirana kombûnên li dij dewletê, û bi sozê ku di şeva sersalê de ew beşê Çayxaneyaya Aramo bibûya şûna ahengeke taybet bo wî û peyayên wî tirs bêtir ji TST û CUMê bû.

Berê TST'yiyan û CUMiyan nêzike kombûnên di beşê jorîn yê Çayxaneyaya Aramo de cîh digirtin nedibûn, lê di van demên dawîn de derîgirtina di rûyên hinekan ji kesên wan de êdî dijwar bû bû.

Di nav sê-çar salên dawîn de mirîdên herdu rêxistinên her demekê carê dibûn egera birêxistina reşebayekî bi encamên bed li Tarê. Ew bû bûn du talîzokên ketinî nav erf û toreyên xelkê Tarê, talîzokên ku di heman demê de bi hezaran kes wek mirîd bi ber xwe xistin û bo amancên xwe kirin zebanî. Tara ku wek qîzeke koçer bêxwendin mabû, lê di heman demê de ziman, tore û navê bapîran di xwe de



zindî û çeleng hîştibû, ji nişkan ve bû bû dîla van herdu rêxistinên ku bizava guherandina hema-hema her tiştê di wê de dikirin, ew jî bi navê xwedîderketina li wê û perîşanên wê. CUMê di destpêkê de xwe hêdîkan livandibû. Hemî raman û rêçikên wê bi rêya çend kesên, ku ber çend salan bo “têkoşana” bi navê “Xwedê” çûbûn welatekî bi navê Bêtarstanê û li dû biryara bexşandina giştî li Tarê vegeyabûn û hatibûn vê herêmê, hatibûn birêxistin. Berê wan bi dizî karê xwe kirin, lê ji dest wan nehat der ramanên xwe bi xelkê bidin pejirandin, çend kesên bêhêvî û bêheval manî û hinekên mêjîsuştî ne tê de. Lê li dû belavbûna navê TST bi salekê CUMiyan xebata xwe bi alkariya alîne derveyî, her weha bi hêvotina dewletê, zîz kirin û herdu rêxistin bûn hevrik. Yekê “bi navê Xwedê” û ya din “bi navê gel” karê xwe dikirin. Dewlet jî li hember wan bû afirmenda talîzokên ji yên wan bêtir tofanafir. Yên ziyana herî mezin ji talîzokên her sê aliyan didîtin Tar û xelkê wê bûn. Bi taybetî li gundên çiyayî yên nêzikî sînoran jiyayî bi encamê bo şênîyên wan bû bû dojeh. Ewên ku hîn koçî warên din nekiribûn bû bûn pênc beşan; beşekî bi TST re, beşekî bi CUMê re, beşekî bi dewletê re, beşekî li dij her sêyan û beşekî din, beşê mezintir, yê ku hewl dida xwe ji hemî aliyan biparêze û hêvî dikir ku bikaribe bi aramî bijî bêtî ku neçare reva ji welatê xwe bibe. Hevrikiya hinekan ji van aliyan û yên li paş wan ne tenê jiyayî li gundiyan tîrş û tahl kiribû, lê bi ser de ew carine rastî neheqiyên mezin dihanîn. Bo nimûne, leşgerên dewletê diavêtin ser hinek gundan û şênîyên wan bi hevkarîya bi vî yan wî alî re gunehbar dikirin. Bo vê “tawanê” ew neçar dikirin ku ji dewletê re secdeyê bikin, lê secdeyeke bi giyanên şîlf-tazî. Ger havîn yan payîz bûya divabû secdekirin li ser stiriyan bûya; ger zivistan bûya li ser berfê. Te digot qey vê stemê têrê nedikir, carine jî çekdarên vê yan wê rêxistinê hêrîş dibirin ser gundekî, bi sedema ku şênîyê wê ji dewletê re secde kiriye. Lê tehlûkeya mezintir û bêhûdetir ne di dojehkirina jiyana gundiyan, ne jî di kujtina mêran de bû. Xelkê van deveran ji sedsalan û vir ve bi caran ketibûn nav rewşên dojehî, lê dû re jê hatibûn der. Ew her weha gellek caran rastî stemkariya giran û kujtinê hatibûn, lê jinên wan li şûna sed peyayên hatibûn kujtin jiyayî didan pênc sed dergûşên ku ber panzdehsaliya xwe dibûn peya. Va yeka tiştêkî mathîştinê bû, çimkî ligel mirina ew qas

mêrên herêmê jî hejmara mêran her ji ya jinan bêtir dima û bi encamê wergirtina qelenê bo bûkan ne tenê di nav şênîyê tevahiya herêmê de zindî ma, lê her ku çû bêtir bû. Vê yekê zanyar û lêkolerên xwe bi jiyana civatan ve mijûl dikirin mat dihîştin.

Di demên par de qelenê qîzekê ligor kok û nav û dengê malbatê kêr yan zêde dibû; bêguman rola çelengiya wê jî hebû. Bo qîza begekî keriyên dewêr, hespên kihêl, zêr û zîvekî pirr, û heta carina zeviyên çak jî, wek qelen dihatin xwaztin. Bo qîzên serokeşîran û axayan kêmtir. Bo qîzên cotkar û şivanan, li milê din, çend bizin yan mî, hinek hirî û carine du-sê weqî titûn jî dihatin xwaztin. Lê di qonaxa îroyîn de nema kesekî lawir û tişt wek berdêla qelenan dixwaztin. Qelen êdf bi pereyan bû û carine ne her pere jî, lê dolar. Qelenê qîzên malbatên bi nav û deng, yan dewlemend, bi piranî bi dolaran bû û yên malbatên belengaz bi pereyên herêmî bû. Lê em vê pîrsê li şûna wê bihêlin û vegerin ser tehlûkeya bêhûdetir ku TST û CUMê hanîbû Tarê. Tehlûke dualî bû:

1. Guherandina sinçî û şanên kesayetiya mirovan, ku bi encamên erf û toreyên civatî dihatin rakirin.

2. Têkbirina sistêma bingehîn ya danûstendina bazirganî û civatî ya li herêmê.

Daniştvanên Tarê û deverên pê ve girêdayî ligel hemî guhertinên bi dirêjîya sedsalan li cîhanê cîh girtine, û tevî hatina ol û desthelatdariyên biyanî jî, xwediyan kesayetiyeke weha bûn ku dikaribû wek kesayetiyeke serbixwe û taybet bihata binavkirin. Çîqa Tar bi xwe ne xwediya dewleteke serbixwe bû jî xelkê wê mirovên serbixwe bûn. Va cudatiya kesayetiya tariyan û va serxwebûna hindirîn ya yekdayî di wan de ne tenê li cîhanê deng dabûn, lê her weha neyarên wan li hev şaş dikirin. Herdu rêxistinên di van demên dawîn de xwe li vî warî bi cîh kiribûn kesayetiya yekta ya vî gelî di gellek şûnan de diqetand û kirasê hatî qetandin bi paçikên biyanî pîne dikir.

Kesine ji dilpakiya xwe piştgiriya TST dikirin bi rastî jî weha bawer bûn ku Serkên ê behušta li ser erdê dameziranda. Hinekên din bi

wê baweriyê piştgirî lê dikirin ku bo dema wan çî berdêlên din nebûn û hêvîdar bûn tevgerê dê xwe di siberojê de ji aliyên bed rizgar bikira û ber bi aliyên çaktir bada. Yê CUMÎ, li milê din, bi dil û can bawer bûn ku ew ê bi rêya CUMÊ têketana behušta li dû mirinê. Hejmareke din ji piştgirên herdu rêxistinên, li milê din, navê rêxistina ew bo wê “piştgir” bo berjewendiyê xwe ya aborî, yan tirsandina yê li hember xwe, yan tew lêxistin û bizdandina xelkê, bi kar dihanîn. Di wê demê de ku xelkê vê herêmê bi jin û mêrên xwe ve bi dirêjîya sedsalan di radeya yekemîn de bo malbat, êl û şênîyê devera xwe dilsoz mabû, mirîdên rêxistinên dilsoziya yekemîn dabûn serdarê rêxistina xwe û dikaribûn ji bo xatirê wî malên bav û birayên xwe jî wêran bikin. Va sinçiyê nû di kesayetiyê mirovê herêmê de bû bû wek çengelekê û gellek tiştên din bi xwe re ber bi guherandinê ve dikeşandin. Lê hinek zanyarên civatî yê biyanî ev guhertin wek yeke xweristî didîtin. Bi dîtina wan, rêxistinên li hinek welatên li paş manî şûna eşîran û serdarên wan şûna serokeşîran girtibûn. Cudatî tenê ev bû: Serokeşîr dimirin, lê serokên rêxistinên wek “nemir” dihatin binavkirin.

Tehlûkeya duyemîn xwe bi jiyana berfireh ya tevahiya daniştvanên herêmên Tarê ve girê dida. Va bû bûn bi hezaran sal li vê deverê sistêmeke weha hebû ku ne dewletan û ne sînoran dikaribûn bidana guherandin. Li tevahiya deverê danûstendineke civatî û bazirganî di nav xelkê de hebû, û jê bêtir bihevgerîdaneke xizmî û mirovahî. Çiqa li herêmê neheqîya hinek axayan hebûya jî, bi milyonan ji xelkê deverê bi encama wê tevgerîdana hevbeş û bi saya berhemên zevî û lawirên xwe bi hev de mabûn. Hatina herdu rêxistinên ne tenê sinçiyên bo xelkê deverê biyanî bi xwe re hanîbûn, lê her weha bû bûn egera wê yekê ku benê tevgerîdana xelkî û herêmî dest pê kiribû ji hev vereşe û ev yeka li xweşîya dewletê hatibû.

Di van salên dawîn de sê gundên çiyayî bo demekê bi tevahî ketibûn dest CUMiyan. Ewên ne bi wan re yan ji tirsan xwe wek piştgirên wan raber kiribûn, yan jî her tiştê xwe li şûn hîştibûn û reviyabûn. Peyayên wan gundan hemî bû bûn yê rîhdirêj. Heta bi rêwiyên ku rêya wan bi ser wan gundan diket, ger bêyî rîh bûyana dihatin lêdan. Du koseyên gundî neçar mabûn ji mûyê bizinan rîhên dirêj çêbikin û li ser rûyên xwe bi cîh bikin. Jinên wir yê ku çî caran rûyên xwe ji mêran veneşartibûn hemî bû bûn rûnixamtî. Ji temenê sêsalî û şûn ve divabû porê keçikan bihata nixamtin û ji çar salî û şûn ve hemî beşên bedenên wan. Jinên ku lixwekirina cilên rengî bo wan bû bû toreyeke gelêrî nuha tenê reşcil bûn. Kiryareke ku xelkê Tarê bi piranî berê hay jê nebû û yê jê haydar ew wek yeke hov û biyanî bi nav dikirin jî li wan gundan dest pê kiribû bibe adet: “Sunnetkirina keçan.” Dengê jinan hatibû qedexekirin. Jinê tenê maf hebû di mala xwe de deng bike. Li derveyê malê dengê jinê wek “fahişe” hatibû binavkirin.

Nivîskarên dîrokê bi piranî tenê haydariya xwendevanên xwe dikişînin ser rûdanên “mezin.” Ew serdaran, dewletên wan, şerên cîh girtinî, serkevtin û têkçûna hêzên wan û bêtarên giştî dikin naveroka berhemên xwe, lê trajêdiyên bi ser kesan û malbatên belengazan de dihên ji rûpelên pirtûkên wan dûr dimînin û dihên jibîrkirin. Bêguman e ku hinek ji trajêdiyên dihên serên kesan û malbatan, her yek ji wan layiqe pirtûkeke bi serê xwe ye. Em li vir hema di nav çend rêzan de trajêdiya jineke bi navê Narê, ya li gundê Sîrikê, gundekî ji wan her sê gundên ketibûn dest CUMiyan, dima bi kurtî ragihînin, wekî ji aliyê çavkaniyeke pêbawer ve ji me re hat gotin:

“Narê bi xweşbûna dengê xwe deng dabû. Mêrê wê ji mêj ve miribû û wê li dû wî mêr nekiribû. Dema çêleka xwe dibir çêrandinê, yan bi serê xwe diçû berhevkirina pincarê, wê distra; gellek ji stranên gelêrî û kevnar ji ber kiribûn. CUMiyan çend caran

gef lê xwaribûn ku bila rûyê xwe binixime û dawiyê bide stranbêjiyê, lê Narê ne rûyê xwe nixamtibû, ne jî dest ji gotina stranên xwe berdabû. Li dawiya dawiyê ew hatibû girtin û wek “iblisperest” hatibû gunehbarkirin. Li navenda gund rêberêkî CUMiyan, ku mêrê sê jinan bû, bi xêzeranekî li wê xistibû û di heman demê de “du’ayên azadkirina wê ji iblîs” kiribûn. Narê berê bêdeng mabû, ne giriyabû, ne jî qîriyabû. Dû re mirîdine CUMî kirasekî reş bi ser wê de berdabûn, lê va kirasa ji jor ve girtibû û Narê ji sêrî ta binê lingan nixamtibû. Li vir qîrîn bi wê ketibû, wek miroveke bi cinan ketibe. Ew bi vê nixamtina di bin kirasê reş de bêhteng û hema-hema ziravqetî bû bû. Wê kiras ji xwe şeqitandibû û dest bi revê kiribû. Mirîdan dabûn dû wê û ew girtibûn. Hinekan ji kesên li navenda gund kom bûnî nuha tuf li wê kiribûn. Hinan gotibûnê, “Hey qehpikê!” û hinên din, “Hey kafir!” Narê, ya ku ew qas stran ji ber kiribûn, dikaribûye carine ji nik xwe ve jî stranekê bibêje û li vir, hema bêyî hemdê xwe, dest pê kiribû bistrê:

*Hawar Xwedê, ez bi qurban, va çi dem e,  
 Jiyana li me bûye dojeh, tiji şîn û tiji xem e,  
 Te zavayê sê salan bir, bi tenê mam,  
 Min qebûl kir, min go, gazindkirin şerm e.  
 Li vî warî bêxwedî me,  
 Belengaz im, bedena min hestî û çerm e.  
 Lê dîsa jî bo Te rêzgir,  
 Her dibêjim, şukur ji Wî re ku ez heme.  
 Bi qurban bim hezar carî,  
 Efû bike, bibexşîne,  
 Dem û dewran yeke reş e,  
 Jiyana me nema xweş e.  
 Ji nav rake bêwûjdanan,  
 Xezeba xwe wîne ser wan,  
 Yan jî amneta xwe bigir,  
 Bi qurban bim Gewre-Yezdan.*

Li dû vê stranê devê Narê tiji xwelî kiribûn û ew hatibû lêdan ta ku ji xwe çûbû. Roja din ew bi keviran hatibû recimkirin. Çiqa kevir lê

ketibûn jî wê ta ji dest hatibû berê xwe dabû asîmên û bizava peywendîgirêdana bi Yezdanî re kiribû. Ew jineke nexwende bû û xwendina peyvên pîroz yê jiberkirî bi zimanekî biyanî bo wê ne hêsan bû, lê ew bi peyvên çak yê ji zimanê xwe li ber Xwedê digeriya û guman di dilê wê de nebû ku Yezdanê dilovan ê bi zimanê wê jî baş bizanibûya. Li dû lêketina çend keviran ew ji xwe çûbû, lê bi lêketina kevirekî bêjimar re bo kurtebîstekê bi xwe hatibû, kesereke kûr kişandibû û bi nefesa dawîn re gotibû, “Şukur Xwedê ku Tu amneta xwe digiriye. Wey bêtara Te bi ser wan de were.”

Balkêş e ku van şêwe kiryanan berî bi sedan sal, di demên ku wek “sedsalên tarî” dihên binavkirin de, li welatine ewropayî cîh girtibûn. Li wan welatan bi hezaran keç û jin bi tawana ku “iblîs ketiye giyanên wan” ji aliyê olperestên rêhişk ve zindî hatibûn şewitandin. Lê li Tarê jin bi dirêjîya dîrokê nehatibû şewitandin, ne jî hatibû veşartin. Jina li Tarê di nav civata xwe de, di nav eşîra xwe de û li gund û bajarokên xwe bi serbestî û bêyî ku rû û bisk û guliyên xwe ji mêran veşêre, digeriya; mêran rêz û pesindarî ji jinê re hebûn. Erê, namûsa jinê giranbuha bû û carine ji bo pirsra namûsê ta’de li jinê dibû, lê jin nedihat merbendkirin û veşartin. Rola wê di nav civatê de roleke weha bû ku wê dikaribû şûna bavê xwe, brayê xwe, yan mêrê xwe bigirta. CUMiyan dixwaztin nêr û mêyên civatê ligor erfên biyanî ji hev biqetînin, jinê li paş dîwaran û perdeyan veşêrin, can û giyanê wê îhanet bikin û wê bikin evdal, ew jî bi navê Xwedê, Xwedayê ku çelengiya giyanî û bedewiya canî wek xeml û diyarî dabûn jinê. Heta bi keça zaro be, ewa ku gellek civatên cîhanê wek “melayîke” bi nav dikirin, wê jî para xwe ji vê bênerxkirina mirovahî digirt, dihat “sunnetkirin,” êşandin, veşartin û îhanetkirin.

Bi kujtina Narê re jiyana li wî gundî û herdu gundên dirawsê her ku çû melûltir bû ta ku rojekê reşebayekî ku kesek ne li bendê bû hema bîstekê ber rojava li wê deverê dest pê kir. Berê bayekî qebe hat û talîzokan xwe li her derê bi rê xistin. Dû re baraneke bayî bariya û hema bîstekê li dû destpêkirina wê lêdana brûskan bi rê ket. Brûsk yek li dû yekê ji nav ewran dipijiqîn û xwe li erdê

digirtin, wekî ku tîrên agirî bin û ji kevanên nêçîrvanên xweristê ji kûraniya asîmanî bihên avêtin. Di nav dora du saetan de 324 peya, jin û zarok bi brûskan hatin kujtin; 4700 mîh, bizin, ga û çêlek ji nav çûn. Bêtareke xweristiye bi vê nolê nedihat bîra kesekî.

Gelo girra Ehreman bû? Gelo sebra Hurmuz miçiqî bû û nema dikaribû xwe li hember CUMiyan û kiryarên wan ragire? Yan gelo Allah hêrs bû bû û bi vê xezebê şanek raber dikir?

Mirov carina biryarên xudayî fêhm nake! Bêguman di nav yên brûsklêketî de yên tawanbar hebûn, lê çima sizakirina bêtawanen? Di nav brûsklêketiyan de zarokine hebûn ku hîn heftsaliya xwe bi serî nekiribûn, yan tew li ber şîrê dayan bûn, heta bi giyanên wan be bû bûn rijik. Gelo wan jî nêrxê gunehbariya mezinên xwe didan, yan gelo bi biryareke asîmanî rê li jiyana wan dihat birrîn, jiyaneke heye ku ligor qedera wan yeke ziyaragîher bûya? Çêtir e mirov kûrtir pê ve neçe û dest ji pirsên weha berde, çimkî encameke bi mentiq jê nahêt der; û heye ku kûrlêniherîneke derbarê pirsên weha de tew bibe egera derxistina fetweyên ji “meşriq” û “mexriba” asotengan, derbarê nivîskarê bêtawan de, ku tenê ya ji wî re hatiye gotin radigihîne. Rastiya nikare bihêt nixamtin ew e ku bêtaren xweristî, wek yên dema cengan, her yên hejar û bêtawan dikin qurbanên kiryarên tawanbaran da ku bi xwîne, êşê û janê, yan tew bi jiyana xwe, berdêla tawanên bedmirovana didin.

Tevahiya êvarê û şevê baraneke bêhûde domand. Şîqînî û gurmîniya bi asîmên ketî, bayê wekî ji devê dêwekî veşartî vîze-vîz û fîskînî jê dihatî, û barana wek ji devên kunan bihêt dibariyayî CUMî bi kes û nekesên wan ve li hev şaş kirin. Ger tew bixwaztana jî, ne dikaribûn xwe li hember vê tofanê bidin teqandin, ne jî ji dest wan dihat ku yê tofan bi serê wan de hanî bitirsînin. Qîr û qara wan dengê jinan yê daxwaza hawarê di nav xwe de wenda kir. Tîrsê xwe di nav şevreşiyê de wek xwêya di nav ava germ de heland û xist dilê her kes û lawirê di vê şeva hêrs bûyî de zindî mayî. Kevîrek li ser kevîrekî nema, kelpîçên bi salan bi hev de gemitî mabûn di şûnên xwe de bûn celb û hatin xwarê, xaniyekî tenê jî li wan gundan bi hev de nema. Çiqa endamên malbatan ew

bizava kirin ku bi hev re bimînin jî, tarîbûna şevê jin ji mêr, zarok ji dayê, xwîşk ji birê û cînar ji cîrên veşartin. Her giyanê zindî mayî dest bi revê kir, hema bi ku ve bûya, lê yek li dû yekî û kom li dû komê li vir yan li wir bi ber ava lehiyê ketin. Şêniyê wan gundan û tevahiya CUMiyên li wir, rêberê wan yê xwe li wir veşartî Aşiqul-Axira jî di nav de, bi encama vê bêtara seyr ji nav çûn.

Li dû vê tofana kujer hinekan gotibûn: “Bêtara Xwedê bi ser wan da hat. Wey brûsk li her kesê zalim keve!” Dergûşekî tenê jî li şûna şêniyê her sê gundan nemabû. Bêtar bû, lê çi bêtar!

\*\*\*

Li dû jinavçûna serdar û rêberê CUMê rêxistin sist bû û tirsaxelkê ji CUMiyên kêmtir bû. Lê ligel wê jî ew her ma, çimkî rêxistinên weha ger tew rast carê ji holê rabin jî, alîne veşartî wan car li dû carê zû be, dereng be, dîsa vedijînin. Dirêj nekir yekî bi navê Muhelliluzzaman şûna serdarê birûsklêketî Aşiqul-Axira girt, lê karê rêxistinê her nehênî ma û endam û mirîdên wê nixamtî kar kirin. TST, li milê din, karê xwe nîvaşkere û nîvveşartî dikir. Serkên ji dûtir ve rêxistin dilivand, wek hunermendê bi benikan dest û lingên lîztikeke ji çêkirina xwe bilivîne. Ya rast ne Serkan bêyî TST hebû, ne jî TST bêyî wî, hebûna herduyan bi hev ve girêdayî bû. Şêniyê Tarê ta wê radeyê ji mirîdên herdu tevgeran ditirsiyan ku xwe bi xwe axaftina li ser wan û serokên wan qedexa kiribûn. Tirseke kûr ya nixamtî ji TST xwe li tevahiya Tarê, û heta li herêmine paş sînore wê jî, di dilên kesên ji Tarê de bi cîh kiribû, tirseke ger ji tirsaxelkê ne bêtir bûya dê jê kêmtir jî nebûya.

\*\*\*

Sêşemê bi şev, hema bi çend saetan li dû binaxkirina termê Leheng Axa, bûyereke ku kesekî çaverê nedikir qewimî û ragîhandina wê



sibeha çarşemê wekî ku erd li navçeyê hejriyabe li bajarê Tarê û seranserê herêmên tarî belav bû. Ligor nûçeyê, Serkan û Muhelliluzzeman li bajarekî mezin yê dewleteke dirawsê di xaniyekî li taxeke biçûk de gihîştibûn hev da ku di kombûneke nehênî de ew bizava bikirana ku hevrikiya li hember hev bidin rawestandî. Dihat gotin ku herdu ketibûn odayekê û nema jê derketibûn. Serkan û Muhelliluzzeman bû bûn xwê û heliyabûn. Bi gotinan, peyayên Serkên yên ew diparastin gotibûne, dema wan li dû destpêkirina kombûnê bi saetekê li deriyê odayê xistibûn da ku çaya germ bibin hindir wan çî bersîv nebihîstibûn; û ji ber ku tirsiyabûn Serkên hêrs bikin saeteke din û yeke din xistibûn navberê, lê li dû destpêkirina kombûnê bi sê saetan gumana ketî dilên wan ew tirsandibûn û wan derî bêyê rêdan vekiribûn. Lê! Lê ne Serkan û ne jî Muhelliluzzeman li wir bûn. Odeya ew tê de wekî ku dêwekî ji xeybê be ew daqultandibûn!

Dîsa bi gotinan, du peyayên çekdar yên li pêş deriyê odeya herdu serdar tê de bûne ji şûna xwe neliviyabûne. Ji wan wê de neh peya, şeş TSTyî û sê CUMî, daniştibûne. Li kêleka wan sê keçên bi kincên şervanan, ku di bin dareke biçûk de bi karekî ve mijûl bûne, di wan sê saetan de hema-hema ji şûnên xwe neliviyabûne. Ger herdu serdarên di kombûnê de derketibûna, guman tê de niye ku ew ê ji aliyê wan hemiyan ve hatibûna dîtin! Di odayê de çî taqayên ku mirov veke nebûne, ne jî çî derî û nêrdewanên ku mirovî bigihînin şûneke din. Serkan û Muhelliluzzeman ji odayeke girtî firriyabûn û wenda bû bûn! Wendabûn lê çî wendabûn!

Çarşemê taştiyan, roja ku di êvara wê de kombûna derbarê projeya Tarê de dê di beşê jorîn yê Çayxaneya Aramo de cîh bigirta, nûçeya wendabûna wan êdî li tevahiya herêmên wî beşê cîhanê belav bû bû. Berpirs û mirîd û endamên herdu rêxistinên di bîsta yekem de li hev ketin gumanê û li hev gef xwarin, lê ji ber ku serdarên herduyan wenda bû bûn, wan bêhna xwe li hember hev fireh kirin. Îcar hinan ji mirîdan digotin ku ew bi fermaneke ji xeybê bo “ezmanê heftan” hatine birine, da ku li wir alîkariya melayîkeyên Xwedê bikin, tevdêrên guherandina tevahiya cîhanê û nifşên siberojê bikin û melayîkeyan bi rêya bername û semînerên

derbarê birêvebirina erd û asîmanan de perwerde bikin. Hinên din digotin ku ew ji aliyê CIA ya amerîkî ve hatibûn revandin, çimkî CIA dixwazt wan ji ziyangîhandina berjewendiyên Amerîka bi dûr xîne û di heman demê de hêvî dikir ji zîrekî, pêzanî û hêza dûrbînê ya li nik wan sûdê wergire. Kesine din digotin, na, KGB ya sovyêti ew revandine, bi hêviya ku Yeketiya Komarên Sovyêti yê Sosyalîst bi alîkariya hêza wan ya ramiyarî di şerê sar de li dij Dewletên Yekgirtî yê Amerîka bi ser keve. Hinên din tawan dixistin stuyê MOSSADA israîlî û digotin ku “Va komployeke ziyonîstî ye.” Kes û komine din jî dewletine rojhilatnavînî gunehbar dikirin û “iddî’a” dikirin ku hîştina herdu serdaran li ser lingan nema di wê dem û şûnê de li berjewendiya wan bû. Tew di gotareke rojnameyekê de hatibû nivîsandin ku “Ligor çavkaniyeke ku nedixwazt xwe bi nav bike,” Serkên Muhelliluzzeman daye kujtin û bi xwe li Îrlanda ye, da ku piçekî ji hunera rêberiya xwe bide serdariya IRA û di heman demê de bo demekê xwe li Belfastê veşêre û ji stratêjîstên IRAYî fêrî rê û rêçikên şerê nav kolanên bajaran bike. Gotar di hejmareke taybet ya rojnameya ADIL-ATê de hatibû weşandin, hejmareke ku demjimêr 12ê nivro derket. Rojnameya FELAKET jî hejmareke taybet weşand, yeke bi wêneyên herdu serokên wenda mişt. Hemî agahiyên derbarê her tiştên wan de tê de bûn. Rojnameyê va bûyera wek yeke bo dewleta li Tarê desthelatdar baş bi nav dikir, lê di heman demê de dipirsî:

*Gelo wendabûna wan ne tektîk be û dû re encamên bed bo dewletê bi xwe re nehîne?*

Li dû xwendina gotarên rojnameyan ji aliyê hinekan ji CUMiyên ku dizanibûn bixwînin ve CUMî hêrs bûn û dîsa TSTyî bi kujtina serdarê xwe tawanbar kirin, lê demjimêr 3.30ê dû nivro rojnameyêke din, rojnameya navdar EMANET, hejmareke taybet weşand, bi sernivîseke reş ya tev wêneya Serkên tevahiya rûpela yekemîn tiji kiribû: SERKAN LI NIK HO ÇÎ MÎNH E!

EMANETê ew kombûna ku dihat gotin Serkan û Muhelliluzzeman tê de beşdar bûne bi ser û binê wê ve wek “derew” radigîhand û di rûpela duyemîn de gotara xwe weha didomand:

*Lêkolînên EMANETê raber dikin ku çi kombûnên serokên herdu rêxistinên çetayî bi hev re tê de beşdar bû bin cîh negirtine. Serkan û Muhelliluzzeman va demek e ji aliyê kesekî ve nehatine dîtin. Li milê din, her kesê di warê siyasetê de têgihîştê baş bizanibe ku rêxistinên wan ne ew rêxistinan in ku bikaribin bi hev re kar bikin. Hîn bi ser de, du dewletên ku cîh dabûn wan a nuha hevrikên hev in û dê rê nedabûna herdu rêxistinan ku bi hev re hevkar bin.*

*Rojnamevanê me M. S. îroj ji Saygonê bi telefonê em agahdar kirin ku Serkan ber du rojan li Hanoyê hatiye dîtin, ku ew ê dawiya vê hefteyê beşdare kombûneke bi Ho Çi Mính re bibe.*

*Berpirsekî rêxistina El-Mutewellî ya bi CUMê re hevkar, li milê din, li Bêrûtê bo hevkarê me G. G. Got. ku Muhelliluzzeman li Yemenê ye...*

EMANETê rûpelên xwe bi wêneyên Serkên, Muhellilüzzemên, Ho Çi Mính, serokê rêxistina El-Mutewellî, şûnên li Tarê, paytextê dewleta dirawsê, Bêrûtê, Viyetnamê û Yemenê tiji kiribûn. Lê ji aliyê rastiya naveroka mijarê ve, çi ragîhandinên ku bi bingehên rasteqîn bin û tiştêkî ku mirovekî aqilmend bikaribûya jê nûçeyêke pêbawer bi dest xista, raber nekiribûn. Ligel wê jî naveroka rojnameyê kelecaneke berfireh di nav xelkê de bi rê xist.

Di nav sê rojan de gotar û gotin û ragîhandinên corbikor û carine seyr, hatin belavkirin. Roja şemê dezgeheke ragîhandinê ji London ev nûçe di nav buletena radyoya xwe de belav kir:

*Serdarên du rêxistinên Tarê, ku va çar roj in wenda ne, zindî ne. Serokê TST Serkan di beyannameyê de nûçeya cîhgirtina kombûneke bi serdarê CUMê Muhelliluzzeman re wek "derew û komplo" bi nav kir. Beyanname şûna wî diyar nake, lê radigihîne ku wî dest ji siyasetê berdaye, çimkî di xwe de şanên "welîtiyê" dîtine û dê dest bi nivîsandina pirtûkên bi naverokên derbarê mijarên "cîhanîmebest" û "axîre-encam" de bike.*

*Serdarê CUMê Muhelliluzzeman, li milê din, duhinî di mizgefteke Bexdadê de hat dîtin. Ligor agahiyên di dest de, ew û hevaline xwe bi alîkariya rêxistineke mafên mirovan bizava bidestxistina mafê penaberiyê li welatekî rojavayî dikine.*

“Bizava bidestxistina mafê penaberiyê li welatekî rojavayî” ji aliyê Muhelliluzzeman ve bû bû egera matmayîna endamine serek yên rêxistina wî û bi encamê hindik mabû rêxistin bibe du beşan. Muhelliluzzeman û hemî berpîrs û serdarên rêxistinên wek ya wî, têkoşana ji bo azadkirina “ummetê” ji bandor û toreyan rojavayî bo xwe wek yek ji grîngtirîn amancan ditîtin. Lewma hinek matmayî bûn, ku çima bizava bicîhbûna li welatekî rojavayî û ne yekî musulman! Lê hinekên din gotibûn, “Ma bo çi li vê biryara Xwedê-jê-razî Muhelliluzzeman ecêb dibînin? Ma marksî û çepên welatên cîhana sêyem jî li welatên kapîtalîst nabin penaber û bi pereyan ku dewletên imperyalî bo bêkariyê didin wan têkoşîna li dij wan nakin? Heye ku Muhelliluzzeman jî bi amanca ku bi pereyan kafiran şerê wan bike ji welatekî wan daxwaza penaberiyê kiribe!”

Birayekî Muhelliluzzeman, li milê din, gotibû, “Dema komunîst ji bo penaberiyê çûn Çînê, Yeketiya Sovyêtî, Koreya Bakur û Kûbayê, wê wextê brayê min jî dê li welatekî misilman bibe penaxwaz!”

Melleyekî ku dostê Muhelliluzzeman bû, dû re fetweyek derxist:

*Bîma enne di nav ummetê de halîhazir dewleteke di riya musteqîm de niye, ew welatê ewropî bo nuha ji dewletên munafiqên me baştir e, çiqê bêîman û tiji fahişe be jî. Netîce: İltîca li wî welatî bo brayê ezîz Muhelliluzzeman helal e.*

Bi encama fetweyê CUMê ji beşbeşbûnê hat parastin. Va hevalê Muhelliluzzeman, Melle Nîdal, Melleyekî zîrek bû û di nav piştgirên wî de kesên bi şehadeyan bilind jî hebûn. Ligor çavkaniyeke pêbawer, ew berê komunîst bûye û demekê li Îngilzitanê penaber bûye. Wê demê di hevpeyvînekê de jê hatibûye pirsîn: “Tu çima li London, ne li Mosko yan Pêkînê, penaber î?” Wê çaxê ev bersîva

dabûye: “Sosyalîzma durist li wan welatan niye û hîn li tevahiya cîhanê jî cîh negirtiye. Ez ji London bo bidestxistina sosyalîzma resen dixebitim û têdikoşim.” Çavkaniya pêbawer nexwazt, heye ku bi encama tirsê, şîrove bike ka Nîdal çawa ji komunîstekî têkoşer û milîtan bû bû Melleyekî tundrê û navdar.

## 15

Em vegeerî dema destpêkirina kombûna li Tarê. Nûçeyên roja çarşemê sbaret bi wendabûna Serkên û Muhelliluzzman belav bûnî û encamên pê ve girêdayî tirsî ku piştgirên TST û CUMê heye ku astengan li pêş kombûnê bi rê xî jî holê rakir. Demjimêr 8ê êvara heman rojê deriyê salona mezin ya beşê jorîn ji Çayxaneyê Aramo vebû û li dû saetekê kombûnê bi şêweyê fermî dest pê kir. Dora 140 mêvanan, ku ji bilî endamên Komîteya Kombûnan û hevalên Leheng Axa bi piranî şareza û giregirên Tarê bûn, li wir bûn. Demjimêr 9.00 Aramo derket ser sehneyê, bixêrhatin li mêvanan kir û axaftineke kurt pêşkêş kir, tê de bi piranî li ser jinavçûna Lehengî rawestiya. Ber Locanî vexwêne ser mîkrefonê ji bo beşdarnebûna brayên Lehengî di kombûna vê êvarê de beşandin xwazt û got ku divabû bêyî derengî vegeeriyana bajarê mezin.

Balkêş bû ku Aramo Locan ne wek “Locan Efendî,” wekî ku berê dihat binavkirin, lê wek “Mamoste Locan” pêşkêş kir. Her weha balkêş bû ku wî li ser navê kurên Kaşan Begê beşandin dixwazt. Balkêş bû ji ber ku pêdivî bi daxwaza beşandinê nebû. Ji mêj ve bû ku xelkê dizanibû benê di nav wan û kurên Kaşan Begê de, Leheng ne tê de, tenê bi qasî deziyekî bi hev de mabû. Yê dest ji

warê xwe berde û li şûneke dûr bibe xwediyê malbatekê dê bi derbasbûna demê re nema bikaribe tamara di navbera xwe û civata warê kevn de mîna berê germ û zindî bihêle. Mirov bixwazew nexwaze ew tamara bi derbasbûna demê re her ku diçe ziravtir dibê. Çiqa ji aliyên wûjdanî û atifî ve germahiyek di dil de bimîne jî, dem û dûrbûn bo gellek kesan rola xwe dileyizin û benê di navbera kesan û koman de diqetînin, yan bi kêmasî sist dikin. Lê Aramo hîn jî di kûraniya dilê xwe de bi wê malbatê re dilsoz bû, heye ku bo xatirê demên par û peywendiya Leheng bi wî re. Ya rast, wî carina ew xweziya di nav hestê wûjdanî de vedijand ku bila kesekî wek Kaşan Begê li Tarê zindî bûya. Di navbera xwe û xwe de wî dem û dewrana beg û axayan, ligel hemî aliyên nerînî yên wan jî, ji rewşa Tarê ya îroyîn baştir didît. Çawa bûya, dema began û axayan erf û toreyên civatî xwediyên roleke mezin bûn û di encamê de rêzgirtineke dualî û pirralî di navbera endamên civatê de hebû, bi dîtina wî. Mirovan ji hev û din şerm dikirin. Mirov digot va kesê han kurê, xwarzêyê, brazêyê, kirîvê,... filankesî yan bêvan mirovî ye. Kesan bo xatirê kesan nêrx û rêz didan hev. Mirovên vê qonaxa demî, li milê din, ligor Aramo, bû bûn koleyên pereyan û bidestxistina tiştan, dê bikaribûna “bo xatirê malê dunyayê bavê xwe jî bidana kujtin.” Bi dîtina Aramo, tevî ku di demên par de hestê neteweyî li nik xelkê sist bû jî jiyana wan, rabûn û rûniştina wan û zimanê wan xwe bi Tarê û bi rehên wê ve girê didan. Hêviyeke melûl her di dilê wî de vêketî dima ku bûyerine kesek ne li bendê bû dê rojekê biqewimiyana, hemî mirov û her tişt ê bi encamê bihatana guhertin û Tar ê dîsa bibûya War.

Aramo birêketina rêxistinî di destpêkê de wek “nîşaneke ferecê” bi nav kiribû; heta hewl dabû xwe nêzike TST bike, lê dû re xwe zû badabû û gotibû dostekî xwe, “Bavê min, ser û binê te dixwazin! Heke tu bişemîtî û di nav wan kevî tu dibî mulkê wan; lazime qebûl bikî ku ew hem xwedî û hem jî mêjiyê te bin; û derketina ji sîtila wan êdî bo te ne mumkun e.” Dû re ew bo kurtedemekê bû bû hevalê rêxistineke ku nav hebû û şan nebû, lê li dû demekê ji heman dostê xwe re bi ken gotibû, “Bi Xwedê eşîrên me tev hemî xirabî û kêmasiyên xwe ji van çêtir bûn.” Ji bo Aramo rêxistinî modeyeke ji eşîriya nûjen bûn. Wî rê û metodên wan ji zihniyeta

xwe dût hest dikir, heye ku bi encama wê yekê bû, çimkî ew ji nifşê “par” bû û bi gellek terfên berê re dilsoz mabû. Bo wî û yên wek wî diponijîn, eşîran ziman û tore parastibûn, peywendiyên mirovahî di nav tevahiya civatê de zindî hîştibûn û li mirovan xwedî derdiketin, ne ji bo egerên ezoyî, lê bêtir ji ber ku ew mirovên ji heman herêmê bûn, kur û qîzên filan kesan, xwarzê û brazêyên bêvan kesan bûn. Ger rêxistinekê dikira şûna eşîran bigirta divabû pêş her tiştî bi kirinê û li ser erdê ew yeka piştrast bikira ku dikare ji eşîran bêtir xelkê nêzikî hev bike, aramiyê misoger bike û jihevhezkirinê berfirehtir bike. Bo wan, divabû rêxistinana xwe wek pireke di navbera demên par û yên dihatin de bi cîh bikirana da ku mirovan ji aliyekî derbasî aliyê din bikin; ew jî bi perwerdekirinê, haydarkirinê, organîzekirinê û xwedîlêderketinê, ne ku wan bi zimantûjiyê, hêvotinê, mêtîjşuştinê, yan bi neçarkirinê û tirsandinê bo xwe bikin mirîd û bo rêxistineke din bikin pizotên şerûd. Aramo wisa bawer bû ku yê bixwazta Xwedê razî bikira divabû berê aştî û aramî di nav civata xwe de, li ser erdê, belav bikira. “Ma ne Xwedê pêxemberê xwe şand bo xatirê ku rewşê li ser erdê baştir bike,” Aramo derbarê CUMiyan de carekê gotibû dostekî xwe. Dilsoziya wî bi malbata Kaşan Begê re ne ji ber wê yekê bû ku ew ji wan ditirsiya, lê bi encama wê yekê bû ku ew bi wî re dilsoz mabûn, wek kesekî ku ji malbatê be pê re didan û distandin, bêyî ku çi baweriyên li dij baweriyêke din li ser wî “ferz bikin.”

Aramo ne mirovekî siyasî bû, lê di dema kombûnên di beşê jorîn yê çayxaneyê wî de cîh digirtin baş guh dida axaftin û gotaran. Wî ramanên yên din hema li bayê bezê bo xwe nedikirin Incîl û Qur'an, lê di nav mêtîjyê xwe de ew dipîvandî, didan hember baweriyên din û ew bizava dikir ku xwe bigihîne encameke durist û sûdê ji wê encamê bigire.

\*\*\*

Mamoste Locan vê êvarê ji advokatekî bajarekî wek Tarê bêtir wek profesorekî zanîngehan xuya dikir, ew jî zanîngehên xweperest. Ew li paş maseyêke li navenda sekuya salonê hatî bicîhkirin danîşt,

deftereke di destekî xwe de vekir û li ser wê danî. Dû re demşadî li beşdaran kir û dest pê kir bipeyive:

*Birêz û nerxbilindên Tarê, mêvan û dostên dilsoz, divabû li şûna min kekê me yê hêja Leheng daniştibûya. Ez leqeba "Axa" bi paş navê wî naxim çimkî dizanim ku wî bi xwe va yeka nedixwazt. Va kombûna ku wî ji mêj ve tevdêrên wê bi rê xistibûn bi encama cîhgirtina bûyer û kiryarine ku kesek ne li bendê bû hat ewarekirin û li dawiya dawiyê kek Leheng li ser rê ket dehfa aliyên bedamanc û xêrnexwaz. Hevalê wî Melle Boyar jî nikaribû xwe bigîhanda me. Ji ber ku amancên vê kombûnê li ber dilê Leheng gellekî nerxbilind bûn divabû kombûna me cîh bigirta. Û li vir ez derheqê derengmayîna cîhgirtina wê de ji ber Leheng ve ji mêvan û dostan beşxandinê tika dikim û di heman demê de ji wan û hevalên bo amadekirin û birêxistina kombûna vê êvarê westiyayî re spas dikim.*

*Birêzan, warê me ji demên kevnar ve warê evînê bûye. Milletê me bi ciwanmerdî û mazûvaniya xwe navdar e. Di dîroka gelê me de niye serpehatiyeke ku raber bike wî hêrîş biriye ser warên yên din. Ger xwîna vî gelî li ser vî erdî rijiyabe ew ji bo berxwedanê bûye. Bapîrên me ji vî welatî re digotin War, lê salên dûr û dirêje bi tenî dan dû hev û bi derbasbûna demê re navê War bû Tar. Di wan salên bo welatê me bi tenî de ne tenê pirên di navbera gelê me de hatin wêrankirin, ne tenê peywendiyên di navbera wariyan de hatin diywarkirin, lê zimanê me, erf û toreyên me û heta kesayetiya me dest pê kirin ji hev biqetin. Tehlûkeya herî mezin ku xwe bi mayîn û nemana me ve girê dide ne beşbeşkirina Warê ye, heta ne jihevqetandina xelkê vî warî ye, lê guherandina şexsiyeta vî gelî, têkbirina erf û toreyên Warê û jihev cudakirina şanên kesayetiya wariyan e.*

*Bala xwe bidin japoniyan. Japona ku berî sedsala 20'emîn wek welatekî weqa pîşesaz nedihat nasîn dest pê kir makîne, otomobîl û hacetên elektronî yên weqa pêşkevî û di heman demê de bo muşteriyên balkêş çê bike. Lê va pêşkevîna pîşesazî, ekonomî û modeyî li hember çanda japoniyan, erf û toreyên wan nebû*



tehlûke. Guman tê de niye ku bi derbasbûna qonaxên demê re guhertin dikevin nav çand û toreyên gelan, lê va guhertina gav bi gav cîh digire, ew û çand û toreyan di nav hev de dihên helandin. Li Tarê, li milê din, guhertin dibe zeng û dikeve nav çand û toreyên me, wan dide wendakirin û bi encamê kesayetîya me bi xwe jî, wek endamên gelekî, ber bi helandinê ve diçe. Millet bi ziman, çand û toreyên xwe hene. Daniştvanên welatekî ku endamên xwe xwediyên ziman, çand û toreyên ji hev cuda bin, ger tew hevvelatîyên heman welatî bin û bo parastina wî welatî hev bigirin jî, nikarin wek yek millet bihên hesabandin. Lê dema ziman û tore û taybetmendiyên komeke, ku em ê li vir wek Kom A bi nav bikin, ji nav biçin û çanda komeke din, Kom B, bibe ya wan jî, wê demê Kom A nema dikare wek komeke serbixwe, wek “millet,” bihêt binavkirin, çimkî ew jî dibe beşekî ji Kom B.

Li milê din, bala xwe bidin rewşa me ya îroj, ku dikare hîn xirabtir jî bibe. Ne tenê zimanê warî li cem hinekan ji hevvelatîyên me di sikrana mirinê de ye, lê her weha şanên kesayetîya wan jî li hinek deverên welatê me. Guhertinên demê hema-hema dawî dan eşîriyê. Di jiyana eşîrvaniyê de aliyên çê û yên bed bi piranî ji çanda wariyan bi xwe bûn. Lê van rêxistinên ku şûna eşîran digirin çanda xwe ji golên biyanî wergirtine û di heman demê de bo berdewambûna xwe aliyên herî bed yên eşîriyê di nav xwe de zindî dihêlin. Bo hinekan ji wan, parastina îdyolojiya siyasî ya rêxistinê ji parastina hevgirtina me wek milletekî grîngtir bûye. Bo nimûne, li nik hinan ji wan dilsoziya bi Yeketiya Sovyêtê yan Çînê re ji dilsoziya bi amancên gelê xwe re kûrtir e; bo hinên din dilsoziya bi “terîqet”eke olî re ji dilsoziya neteweyî zêdetir e.

Mixabin me ew hêz û derfetên ku me ji hemî nexweşiyên li Tarê bi cîh bûnî di nav roj û şevêkê de azad bikin nînin, lê pêwîst e em bi ranana gavan, çîqa biçûk bin jî, tevde ra badana rewşê ber bi aliyê durist ve bikin. Bapîrên me carina bi şûr û tîfingê bizava ranana gavan kirine û piraniya caran li şûna serkevtinê li ser piştê ketine û nexekî bilind dane. Gelê me ne xwedan dewlet bû û bi encamê ne xwedan dezgeh û karxane û pîşesaziyeke rêk-û-pêk bû. Di demên serhildanan de serok û rêxistinên me bi hêviya piştgiriyê berên xwe didan dewletên din û van dewletan yan rûyên xwe wê de badidan,

çimkî qezenca wan di piştgiriya wan de nebû, yan jî bo demekê alîkariyeke bi sînor didan û li hember wê alîkariyê ew wek maşeyekê bi kar dihanîn, bi wê maşeyê agir radikirin û bi wî agirî neyarê xwe dax dikirin, lê dema navbera wan û neyarê wan baş dibû wan maşe li cîh dihîştin. Çawa efendiyeke bajarî gundiyeke belengaz bi kar dihîne û dihêvoce ku li neyarê wî xe, lê dema digihê amanca xwe nema dixwaze wî li pêş mala xwe bibîne, hinek dewletan jî pîrrianiya rêxistin û serokên me bi vê şêweyê bi kar hanîn. Lewma ew helwesta ku “em ê bi darê zorê mafên xwe bi dest xin” nema bi serê xwe sed ji sedî di cîh de ye. Êdî dem bi ser wê helwestê ketiye û hêza me ya îroj têrî bikarhanîna wê metodê nake. Di nav hinek qonaxên dîrokî de, wek demên cihgirtina şerên cîhanî, ew ramana dê di cîh de bûya, lê mixabin pêşiyên me nikaribûn ji fersendên dîrokî sûdê werbigirin û gelê me nikaribû xwe li dor helwesteke yekgirtî di demên bijarte de bike yek giyan. Ger em pakkirina Tarê û bidestxistina mafên xwe bixwazin, divêt em li rê û rêçikên nû bigerin, rê û rêçikên ku me ber bi amancên me ve bibin, bêyî ku gelê me perîşan û welatê me tarûmar bikin; rê û rêçikên ku me bi hev de girêbidin û Tarê bo me bikin xweşwar. Em nikarin cîhanê biguherin, lê em dikarin xwe biguherin. Yek ji çekên ku em dikarin bo gihîştina amancan bi kar wînin zanistî ye. Divêt em rûbarên wê di nav gelê xwe de bi rê xin. Va zanyariya divêt xwe bi hemî aliyên jiyane ve girêbide, haydariya derbarê xwenasîne, grîngiya xweperwerdekirinê, xwedîderketina li çandê, baweriya bi yekgirtina xelkê hemî beşên Tarê, qe nebe di warê naveroka çandî û perwerdeyî de, destberdana ji şerûdbûnê û guherandina rêyên bikarhanîna zorê bi rê û metodên şaristanî, pakkirina gund û bajarok û bajarên me, birêxistina bizavên afirandina kar bo hevvelatiyan jî di nav de.

Berî her tiştî divêt em zimanê xwe vejînin û li seranserê deverên Tarê bikin hacetê danûstandina devokî û nivîskî. Ger em li benda hatina bihara bi xêr û bêr bimînin heye ku em berî gihîştina wê ji birçîna bimirin. Bi gotineke din, em nikarin tenê benê qedera xwe bi wê yekê ve girê bidin ku belkî dewlet rojekê van amancên me ji me re bi cîh bihîne. Na! Çîqa dijwar be jî, divêt em bi xwe, bi kes û komên xwe ve, êdî dest bi tevdêrên birêxistina wan gavan bikin.

*Hinek ji we birêzan ê bizanibin ku va demeke di kombûnên me yên bi beşdarbûna Leheng de axaftina li ser van şêwe pirsan dibû, lê me li ser erdê çî gav ranenan. Mebest bi cîhgirtina vê kombûnê ranana gavekê bû. Mixabin birayê me yê nerxblind Leheng nema di nav me de ye, lê em ê bûka xwe bi rê xin...*

Di kombûnê de her heft mêvanên Aramo: Rasîn, Pîran, Bêwar Ramanî, Kadirê Rojperest, Ronî Kaşanî, Çeçanê Remo û Perîşan bi hev re daniştibûn. Bi meraq guh dabûn Mamoste Locanî û her yek ji wan li bendê bû ku tiştêkî derbarê rola xwe de ji wî bibihîse. Piraniya beşdarên ku parêzgerê qanûnî Locanî dinasîn, li milê din, li naveroka gotara wî mat mabûn, çimkî wan ew wek kesekî siyasî texmîn nedikirin.

Mamoste Locanî domand:

*Ez ê li vir mizgînekê bidim we: Weqfa Kaşan Begê dê li bajarê Tarê gavekê rane ku em hêvîdar in bibe rûbareke ji ewên ku dê xelkê me rojekê bigihînin deryaya amancên mezin. Weqfa me, ku hinek ji we birêzên hêja endamên wê ne û pê re alîkar in, û birayê me Leheng hemî mûl û pereyên xwe wek diyarî pêşkêşê kirine, dê Navenda Çanda Tarê damezirîne...*

Dema yên di salonê de ji Mamoste Locanî bihîstin ku Leheng mûl û pereyên xwe bi tevahî ji weqfê re hiştine ew rabûn ser xwe û bi germî li çepikan dan. Wan matmayî li rûyên hev dinihêrîn û gotinên pesindanê dihanîn ser zimên.

Mamoste Locanî ji beşdaran re spas kir û li dû daniştina wan dîsa domand:

*Bi pereyên ku nuha di xizneya weqfa me de ne avahiyek, navendeke çandî, ê bihêt lêkirin û baxçeyekî mezin ê li paş wê be. Navê baxçe dê Baxçeyê Ronahiyê be. Navend û baxçe dê li rojavayê bajêr li ser pênc hêktar erd, ew zeviyê ku berê yê kurê Kaşan Begê Şanî bû û nuha di dest min de ye, bihên avakirin. Bila tê de*

*hevvelatî kom bi kom bihghên hev, bila tê de axaftinên bi naverokên corbikor bihên pêşkêşkirin, derbarê jiyane de, derbarê çihane de û derbarê Tarê de – ku navê wê dê ji vir û şûn ve, qe nebe bo me, War be, warê evîne, hêvîdar im.*

*Yek ji kêşeyên rêber û rêxistinên me her dem ew bûye ku wan amancên mezin dabûne ber çavan, lê ji ber nebûna derfet û kadirên bo bidestxistina wan pêwîst, wan beşên grîng ji amancên xwe bi dest nexistine. Navenda me dê bi amancên ji pêkanî û derfetên xwe mezintir dest pê neke. Berî her tiştî pêdiviya me bi wê yekê heye ku em bizanibin çawa wek kes û kom bi hev û din re kar bikin û çawa li hember dîtin û ramanên ji yê me cuda bi tolerans bin. Me pêdivî bi wê yekê heye ku demokrasiya resen fêhm bikin û ji prensibên wê re rêzgir bin. Me pêdivî bi wê yekê heye ku xwe ji metodên zîrteşewe azad bikin û toreyan wek mirîdiyê û pûtperestiyê ji nav nefsiyeta xelkê xwe derînin. Ger em berê van amancan bi dest nexin, em ê nikaribin tevdêrên bidestxistina amancên me mezintir bikin.*

*Hêjayan, yekemgava li pêş me ew e ku em dest bi tevdêrên avakirina şûna navendê bikin. Lewma me pêdivî bi berpirsan, pîsporan û komîteyan heye ku wan tevdêran amade bikin û projeyê bi rê xî. Di nav roj û mehên dihe de em ê ji bo van amancan kar bikin (...).*

Axaftina Mamoste Locan ta demjimêr 10.30ê şevê domand. Wî derbarê pereyan ji Amerîka hatine de tiştêk negot, lê heft mêvanên Aramo yek bi yek bi nav kirin, ji wan re spas kir û got ku Leheng ji wan ew hêviya dikir ku bo navendê û amancên wê, her yek li şûna ew lê, bibin hevkar û balyoz. Ya rast, Leheng ew agahdar nekiribû ka ji bo çî amancan van kesan bijartibûn. Va yeka bi wî re ketibû gorê. Locên xwe gellekî bi vê pirsê ve mijûl kiribû û derbarê wê de bi Aramo re jî peyivibû, lê ji dest herduyan nehat ku xwe bi şeweyeke rêkûpêk bigihînin mebesta Lehengê derbarê vexwandina van kesan de. Mamoste Locan dû re vekirî bi mêvanan re li ser vê yekê peyivî. Wî ew hêviya ji Pîrên û Rêsin kir ku di proseya birêxistina tevdêran û bidestxistina amancan de ne tenê

bibin hevkar, lê rolên berpirsiyê jî di siberoja nêzik de li Tarê bi dest xin. Ronî Kaşanî û Perîşan Pêzan ê bikaribûna di nav hevvelatîyên Tarê yên li Ewropayê de rol bileyztana. Kadirê Rojperest dê ji bo destpêkê bibûya pira di navebera Navendê û Tariyên rojhilat de, Çeçanê Remo dê li herêmên jêrîn yên Tarê bi rola xwe rabûya û Bêwar Ramanî dê bibûya pira di navbera navendê û herêmên başûr de. Mamoste Locan di kombûneke bi wan re de, ku sibeha roja din cîh girt, ew hêviya ji wan kir ku van rolan ji bo xatirê Tarê, pêşiyên wê û nîfşên siberojê bipejirînin.

Li dû axaftina Locên xwarineke sivik û çayê li beşdarên kombûnê hatin belavkirin. Dû re bernameya hunerî dest pê kir.

Xuyabûna Kamoyê Çînoyê Deştî li ser sehneyê mêvan dilşad kirin û ew bi çepikên germ çûn pêrgîna wî. Kemenca hunermendî dest pê kiribû beşdaran têxe bin bandora sihra xwe, dema ji nişkan ve Arîna Xatûn ji deriyê paşîn ve derbasî ser sehneyê bû. Beşekî ji mêvanan matmayî, di heman demê de bi meroqeke kûr û bêyî hemdê xwe, rabûn ser lingan. Mêvanan bi peyvên nerxgirtinê û çepikên germ pêşwazî li wê kirin.

Kirasekî dirêjî bi rengê reş li wê bû. Beşekî ji porê wê yê soravîn bi şarpeke moravîn hatibû nixamtin. Wê spasiya beşdaran kir, serê xwe daxist û destekî xwe ber bi Kamo ve dirêj kir, wekî bibêje ku bila spasiya wî bikin û rê bidin kemenca wî.

Mûzîka ji kemencê dihate der û dengê Arîna, wekî du rûbarên li ser zeviyê deştêkê bi aramî bigihên hev û ava xwe di nav çemekî de bikin yek, xwe digîhandin nav hiş û dilên guhdaran. Wê bi zimanê Tarê distra; peyvên strana wê yên ji helbesteke Leheng bûn. Ji mêj ve wê bizava fêrbûna zimanê Tarê dikir, lê çî xwendeghên fêrbûna wî zimanî li bajarê mezin nebûn. Ew bi alîkariya Leheng û dostine wî fêrî hinek peyv û hevokan bû bû û va demek bû bizava jiberkirin û strana vê helbesta Leheng dikir:

*Di nav mij de ez ji day bûm  
Her bo rojê mam nêçîrvan*

*Dema jê nêzik bûm gêj bûm  
Ketim xwarê hiş ji min çûn  
Çaxa dîsa bi xwe hatim  
Min hew dît roj li ava ye.*

*Li rawestgeha dîrokê  
Ez di nav rêwiyan de bûm  
Dema trên hat nêzik bû  
Ber bi pêş û ber bi paş çûm  
Hew min dît ew bi rê ketiye  
Hey wax ez tenê mam li dû.*

*Li baxçeyê hêviyên xwe  
Bûm evîndarê gulekê  
Min meraq kir wê bêhn bikim  
Wek aşiqê ciwan-keçekê  
Gul bişkifi û keniya  
Lê tenê ji bo carekê.*

*Digerime li yarekê  
Wenda bûye di şevê de  
Gelo kengê wê bibînim  
Pê re vexwim piyalekê  
Herdu lêvên wê ramûsim  
Xuda, qe nebe carekê!*

*Min got jiyan bêsinor e  
Kûr-fireh e wek derya ye  
Ez ê yara xwe bibînim  
Kulîlka xwe jî biçînim  
Lê jiyan tev bû xewnekê  
Xewn firiya wek kewekê.*

*Ey rêwiyê siberojê  
Ger hat û te yara min dît  
Bêjê evîna min bo wê  
D'nav tîrêjên rojê de ye*

*D'nav stêrkên şevê de ye*  
*D'nav bêhna gulê de ye.*

Wateya peyvên helbestê û dengê hunermenda navdar yê bi dengê kemenca Kamo re bû bû yar, beşdar xistin nav gola aramiyeke hindirîn û di heman demê de nav pêlên wûjdanî yên bûnî egera birêketina keseran û barandina hêstiran.

Li dû dawîhatina kombûnê û derçûna pîrraniya beşdaran, du koman xwe li du koşeyên salonê bi cîh kirin. Komek ji Locan, Aramo û endamên komîteyeke ku dê xwe bi projeya Leheng ve mijûl bikira pêk dihat û ya din ji heft mêvanên ku va bû bûn 12 roj - bo Rasîn 8 - li vir bûn. Endamên komîteyê bi hev re qehwe vexwarin û derbarê dema kombûna xwe ya yekemîn de li hev kirin. Endamên koma din li hev kirin ku destpêka sibeha roja pêncşemê firavîna dawîn bi hev re bixwin û her yek ji wan bi rêya xwe ve biçe.

16

Çiqa têkiliyeke nêziktir di navbera her heft mêvanan de nebû jî, ew di nav çend rojên derbas bûnî de qe nebe bû bûn rêheval. Di roja dawîn de, berî xêtir ji hev bixwazin, pîrraniya wan xembar bûn ku dê va lihevraştatîna seyr têxistana gorê. Çeçanê Remo kelgirî bû û va lihevraştatîna wek bûyereke “li ser eniya me gişkan hatî nivîsandin” bi nav kir. Va kalê hêja rast jî xembar bû, çimkî dizanibû ku rêya wî û yên wan şeş kesan ê nema li hev rast bihatana, ew kesên ku wî dest pê kiribû wek hevalên ji xwe nêzik bihesibîne, wek bran. Perîşên rexne li hemiyar girtin ku çima “wa bi hêsanî” dest ji hev berdidan. Kesek negihîşt mebesta wî. Ligel ku bi salan li derve mabû jî, ew di gellek aliyên xwe de kêm-zêde hîn

119

gundiye dema zarokiya xwe bu. Di nav Tariyan de kesen weha ne hindik in. Dema ew ji gunde xwe dican der dem ji bo wan radiweste. Tevî hinek guhertinên derveyî jî ew di hindirê xwe de her wek gundiye berê dimînin. Lewma gellekî mat dimînin dema li dû salên dût û dirêj dican serîlêdana gunde xwe û dibînin ku gellek gundiye dem û dewrana îroj ji hinek aliyan ve ji wan bêtir pêş ve çûne. Ronî Kaşanî kê-m-zêde bêdeng ma û wa diyar bu dixwazt rojekê berê xwe ji nav vê rewşê derîne, zû serîkî li xizmên xwe xe, ji bo xatirê erf û toreyan û egerên wûjdanî, û xwe dîsa bigihîne bajarê pê-nûsa wî lê, ne ji ber ku ew bu bu yekî ji bajarvaniyên bûrciwaziya navend ya wî bajarê li bakurê Ewropayê, na; ew jî ji hinek aliyan ve her wek gundiye demên par mabû. Daxwaza zûvegera li bajarê ewropayî bêtir bi encama wê yekê bu ku jiyana wî, li dû salên bi teqereqê û axekufê dagirtî, “xweş” û aram bu bu. Tevî ku wî carine digot, “Xweşbûna jiyana li bajarên Ewropayê wek xweşiyêke naylon e” jî, wî baş dizanibû ku vegera wî û zaroyên wî li Tarê dê tenê wek xewn bima. Bêwar Ramanî ji yên din hêvî dikir ku rojekê bihên serîlêdana herêma ew lê niştecihe. Wî, qe nebe di dilê xwe de, daniştvanên herêma xwe ji yên vê deverê pêşkevîtîr didîtin. Kadirê Rojperest, li milê din, got ku di vê bûyera qederî de kesekî ji wan, Halo ne tê de, bizava guherandina qedera xwe nekiribû û va yeka bi serê xwe encameke balkêş bu bi dîtina wî. Ji ber ku li herêma wî karbidestiyêke ku xwe wek beşekî ji qedera xudayî didît hebû, Rojperest bi her awayî, û bi tundî, li dij wê yekê bu ku mirov qedere hema wisa bi hêsanî û bêyî berxwedan bipejirîne, tevî ku qedera giştî li wî beşê Tarê kê-m-zêde hatibû pejirandin jî. “Qeder” û axaftina derbarê wê de hema-hema bu bûn nan û ava Rojperestî. Lê wî li vir negot ku encamên serhildana li dij qedere ne her dem erênî ne, ku dikarin carine bed bin jî, çawa ku ya Halo ew ber bi mirinê ve bada. Pîran ketibû qeyta bicîhnekirina çend sozan, sozên ku di nav du hefteyên derbas bûnî de êdî dem bi ser bicîhkirina wan ketibû. Her weha di wê yekê de diponijî, gelo bikaribûya rast vegeriya Tarê û di projeya Leheng û hevalên wî de rolek bigirta! Lê çawa be jî wî va lihevraştatina û rûdanên di nav çend rojên derbas bûnî de cîh girtinî balkêş didîtin. Rasîn, li milê din, ketibû qeyta malbata xwe, çimkî va bu bûn bêtir ji du hefteyan wî ji wan re telefon nekiribû. Ji ber ku jina wî amerîkî



bû, vegera li Tarê bo wî ne amanceke di cîh de bû. Wî hêvî dikir ku li dû derketina teqawîtê, dema temenê wî 60 derbas kir; bêguman ta wê demê zimanê tariyan jî dê hatibûya serbestkirin; li Tarê vegeriya û 5 salan di zanîngeha wê de dersên xwe bi bernamêyên kompiyûteran ve peywendîgir dikin bidana. Wî jî va lihevraştatina, wek Pîrên, balkêş didît, lê rastî ew bû ku wî hevaliya bi rêhevalên din re, Pîran û Bêwar Ramanî ne tê de, meraq nedikir, ne jî dixwazt peywendiya xwe bi wan re zindî bihêle. Weha dizanibû ku raman û helwestên wî û wan ê nikaribûna di nav heman herqê de bi hev re bimana.

Demjimêr 9ê sibehê mêvan çûn rûyên hev û hev hambêz kirin. Aramo û Rîso jî li wir bûn. Herduyan bi çavên tiji hêstir mêvan yek bi yek hambêz kirin, rûyên wan maç kirin û ew yeka ji wan hêvî kirin: “Eger kêmasiyên me hebin bibexşînin.” Di çend rojên derbas bûnî de ew heft kesan bû bûn wek endamên malbata wan bi xwe û lewma ew bi çûna wan xembar bûn. Va şêwe hestên germ yê mirovî yek ji şanên xelkê Tarê bû û hîn îroj jî, ger ne wek berê li nik her kesî payî mabe jî, di dilên piraniya danîştvanên Tarê de zindî dimîne. Mixabin ew li cem yê ji Tarê diçin der sal bi sal hinekî ji xwe wenda dike. Dema ew beşîne lawaz û bed ji toreyên kevn li şûn dihêlin û hinekên ji çanda xelkê welatên ew lê werdigirin, di navberê de ew bi kêmasî hinekan ji tore û taybetmendiyên çak yê pêşiyên xwe jî wenda dikin. Bi encamê germahiya lihevxawedîderketina ji nêzik ve; ku li welêt di rojên zarokî û ciwanîyê de di kûraniya dilên wan de reh vedabû; dibe qurbana dûrketina ji welêt. Va jî proseyeke xweristî ye, ger em bipejirînin ku va şêwe xawedîderketina li hev û din û erfên mêvanhejiyê, bêtir di nav civatên xwe bi çandîniyê ve mijûl dikin de, di nav civatên gundî de, zindî dimînin. Bicîhbûna li welatên biyanî û bajarên mezin van şêwe toreyan ji holê radikin û mirovan ber bi ezotiyê û “îndîvîdualîstiyê” badidin; çimkî li bajarên mezin şert û mercên jiyanê dihên guhertin. Bajarvanî rewşa aborî ya xelkê diguhere û jiyanê wan ligor bernamêyeke rojane yan heftane dixê rê. Bi encama guhertina rotîna jiyanê, bicîhbûna kesan di xaniyên teng û girtî de, û ji ber jiholêrabûna berpirsiyariya komî ya endamên

civatê, peywendiyên mirovahî yên germ sal li dû salê qe nebe beşekî ji germahiya xwe wenda dikin.

Rasîn û Pîran bi hev re ji Çayxaneyaya Aramo derketin. Tevdêr kiribûn ku tev otomobîlekê bigirin da ku wan bigihîne gundên meriyên wan. Herdu gund jî bi ser Avdarê ve dihatin hesabandin û ji hev ne pirr dûr bûn. Ew ber bi navenda otobûsan ve di rê de bûn û dê li wir yek ji wan şofêrên ku amade bûn ji bajêr biçûna gundên dûr bidîtina. Yek ji şofêran, şofêrê taksiyêke xweşike ku pak û ne weqa kevn xuya dikir, mirovekî zimanxweşî ciwan, amade bû wan bigihîne gundên wan, lê ji ber karekî din nikaribû wan pêş nivro rake. Şofêr pêşniyaz kir ku li “Qehweya Otêl Alan” danîşin ta ew dora demjimêr 12.30 wan ji wir radike.

Otêla Alan li rojavayê navenda otobûsan bû. Otêleke nû bû û ya yekemîn bû li Tarê ku kafêtêryayêke bi makîneyêke espresso bi ser xwe xistibû û beşekî wê kafêtêryayê li derve bû, beşekî bi darên biçûk û sîwanan.

Pîrên got: “Me nêzîkî du hefteyan wenda kir, lê ne bêyî sûd bû.”

Rêşîn got: “Bûyereke seyr bû; bi rastî jî li Tarê qedera mirov dikeve dest yên din.”

“Heke tu rastiyê dixwazî, min berê texmîn kir ku destê alîne xêrnexwaz tê de hebû. Ez ji wê ditirsiyam.”

“Min jî berê ew texmîna kir, lê min ew dîtina xwe guhert, çimkî danûstendina Aramo û Rîso bi me re ne wek danûstendina alî û kesên xêrnexwaz yan tundrê bû.”

Pîrên got: “Di roja me ya yekemîn de, dema Halo serînizm li salonê vegeriya, ez piçekî tirsiyam, çimkî min bi xwe re digot, ger em li dij vê serpêhatiyê derkevin ew ê serê çu raber me bikin. Lê dû re kê-m-zêde guman li cem min nema ku destê Leheng di vê pîrsê de heye. Aliyê axan jî carina serê çu raber dikin”

Rêşîn got: “Berê weha bû, lê çoyê wan nuha kurt bûye, dem û dewrana wan êdî çu. Çendek ji wan li vir yan li dera han hîn xwedan çoyekî biçûk in, lê hêdî-hêdî mafya dê şûna wan bigire. Ev jî şaneke çûna ber bi bajarvaniyê ve ye li hinek waran.”

Herduyan qehwe û ava sar xwaztin û va atmosfêra ew tê de bêhna wan fireh kir. Ji nişkan ve Rêsin serê xwe ber bi Pîrên ve bada û pirsî:

“Tu çi dibêji? Gelo TST, CUM, yan rêxistinên çep yên nû li Tarê bi ser kevin?”

“Bawer nakim. Heye ku di destpêka xwe de hinek piştgirên ji xwe re bibînin. Hinek ji wan ê bi metodên rêxistinên rêhişk serên hinekan li vir bişkênin û mêjiyên hinekên din li dera han bişon, lê li dawiya dawiyê bi ser nakevin, çimkî hîm û bingeha wan ji nav xelkê Tarê derneketine; felsefe û teoriyên wan ji derve hatine û ew ji derve ve dihên livandin, çîqa xwe wek ji Tarê raber bikin û bizava dotina bizinên Tarê bikin jî. Lê heye ku hinek ji wan xwe bi rê ve bidin guhertin. Ger guhertineke erênî û ligor pêdivî û mercên Tarê û xelkê wê be, heye ku hêviya serkevtinê ji bo wan hebe. Bivêtnê hinek ê bikaribin mêjiyên gellekan bişon û wan, qe nebe bo demekê, bikin piştgirên dilsoz.”

Rêsin got: “Bo Tarê rêxistineke weha divêt ku ji nav newalên çand û toreyên xelkê wê hatibe der, li wan û pêşiyên wan xwedî derkeve, wan pêş ve bibe û xelkê neêşîne. Lê mixabin li piraniya deverên cîhana me zûguherandina civatê xwe bi rêya zorê daye pejirandin. Tenê di nav hinek civatên bijarte de guherandinê bêyî êş û jan, bi aramî û bi gavên li dû hev cîh girtiye. Ha bala xwe bide şoreşa bolşevîkan li Rûsistanê. Bi milyon mirov hatin kujtin bo xatirê guherandina rewşê! Bi milyon perîşan bûn! Ligor propagandaya sovyêtê, her hevvelatî bi encama guherandinê bextiyar e. Lê gelo rast weha be û rast weha bimîne, ew tiştêkî din e.”

“Dizanî? Dibêjine li Tarê rêxistineke biçûk nuha heye ku piştgira siyaseta Yeketiya Sovyêtî ye û yeke ji wê biçûktir, yeke ku xwe wek *Rêxistina Şoreşgêriya durist* bi nav dike, hevrika wê ye û piştgira siyasat û dîtinên Mao Tsî Tong e.”

Rêsin got: “Wah! Bi Xwedê Tar a nuha rast bû Tar (û keniya). Lê çawa be jî heye ku hebûna wan ji bo guherandinê bi sûd be. Hêvîdar im tenê li hev nexin.”

Pîrên got: “Belê, çend aliyên wan yên erênî hene, lê destkeftiyên wan ê bi sînor bin, ger rewş weha bidomîne. Ez wisa

bawer im ku TST dikare bibe xwediya hêz û derfetan û xwe bigihîne armancên mezin, ger hinekên ji aliyê siyaseta herêmî û navneteweyî ve zîrek û xwediyan ramanên ligor demê bikaribin şûna Serkên û hinek mirîdên wî bigirin, demokrasiya durist di nav rêxistinê de têxin rê, piştgirên xwe ligor pîvanên rêxistinên welatên pêşkeftî perwerde bikin û tirsê û tirsandinê ji nav tevgera xwe derînin.”

Çavên Pîrên li du jinan ketin ku ji aliyê rojava ve ber bi şûna ew lê ve dihatin. Ji meş û kincên wan ve diyar bû ew ji çîna navîn ya xelkê Tarê bûn; tew heye ku ji malbateke mezin ya dewlemend. Ew ne wek jinên gundî, ne jî wek jinên bajarî yên ji bajarên mezin hatibin Tarê dihatin ber çav. Ew ji wê koma jinan bûn ku di navbera gundîtiyê û bajarvaniyê de di rê de bûn, ewên li nik wan hem toreyên resene çak yên gundiyan û hem jî şanên bajarvaniye bi zewq dihatin dîtin. Ji wan ya ciwantir kirasekî dirêjî qehweyî lê bû û beşekî ji porê wê bi şarpeke rengîn nixamtî bû. Dema herdu nêzîktir bûn Pîrên li rûyê wê niherî û çavên herduyan bo bîstikekê li hev rast hatin.

Li bajarekî rojavayî bûya heye ku çav ne ji beşên herî balkêş yên jinê bihatana dîtin. Lê li Tarê bedewtirîn û balkêştirîn beşên giyanê jinê çavên wê bûn. Çavên keça Tarî deryaya evîne bûn, çaviya dilovaniyê bûn, dîmeneke ji wêneyeke bi hezar rengî bêtir şadmendîfafer bûn. Reşbelek û di şêweya peyamê de bûn çavên vê keçê, xwedan deryayeke kûr bûn ku tê de bêhejmar sirr hebûn; du stêrkên bedew bûn û li ser rûyekî şêrînî ku mirov hişmekar dikir lê binihêre şûn girtibûn.

Pîran ne yek ji wan kesan bû ku ji hevaliya bi jinan re bêpar mabû, lê bêyî hemdê xwe bi lihevraştatina çavên wê û wî re ket bin bandora hêzeke nehênî ya sihirafer, ta wê radeyê ku dilê wî dest pê kir bezatir lêbide. Ger ne ji şerma ji Rêşîn û rêzgirtina ji erf û toreyên Tarê re bûya, ew ê di cîh de rabûya ser xwe, bi dû wê keta û jê re bigota: “Ez aşiqe te bûm.”

Herdu jin ji kêleka kafêtêryayê derbas bûn û bi dora panzdeh gavan ji wir bi dûr ketin. Pîrên, sendeliya xwe piçekî bada û hîn li dû wan dinihêrî, dema çavên wî li ciwanekî ketin ku ji aliyê navenda otobûsan ve bi lez ber bi aliyê herdu jinan ve dihat. Bêyî tê de biponije vê yekê bala wî weqa kişand ser xwe ku ew bêhemdê xwe ji şûna xwe rabû û ew dîmena bo çavên xwe kir amanc. Rêsin jî nuha lawê ber bi aliyê wan ve direviya bo çavên xwe kiribû nêşan, çimkî reva wî beza û bi kelecana bû. Di heman demê de balkêşiya li nik Pîrên hatî holê bala wî kişand ser xwe. Lawê ciwan, ku nuha kêrek di destekî de xuya bû, nêzikî li herdu jinan dikir. Dema çavên ya ciwantir lê ketin, ew di cîh de di şûna xwe de rawestiya û qîrîneke kurt jê hat der; lê qîrîna bi dengêkî qebetir ji jina din hat. Ya ciwantir dû re çend peyvên bi girr ji xwe hanîn der. Pîran, wekî ku hevsarê wî ketibe dest hêzeke ji xeybê, pijiqî û wek pizotê ber bi wan ve reviya. Lawê ciwan û Pîrên hema-hema bi hev re gihîştin keça ku bi dengêkî qebe digot, “Hîvo tu çi dikiye, dîno? Raweste, meke!” Lawê ku “çav di sêrî de direqisîn,” ciwanekî ku simbêlên wî hîn nû xuh didan, piyê rastê bi jor ve hilda û kêr ber bi keçê ve vewêşand, lê di vê kurtebîstê de Pîrên xwe xist navbera herduyan. Xortê ku hesabê vê yekê nekiribû veciniqî û piçekî ber bi aliyê xwe yê rastê ve lukumî. Pîrên bi herdu destan piyê wî bi jor ve rakir û ew rawestand. Di navberê de Rasîn jî gihîşt wir. Çû alîkirina Pîrên û ji dest hat kêrê ji nav lepê xort derîne. Lawê ciwan berê bêdeng ma, lê dû re dest pê kir bi girr biqîre, “Xûşka min e, min berdin, min berdin!” Herdu peya di cîh de têgihîştin ku rûdana li pêş çavên wan cîh digirt yeke ji wan serpêhatiyên “pirsa namûsê” bû. Pîrên bi dengêkî qebe gotê, “Dest ji vî karê cahilan berde, lawo! Zû ji vir here, berî polîs bigihên û te bigirin. Ma tu dîn bûye ku dixwazî xwîşka xwe bikujî, kuro?! De zû here û careke din tiştêkî weha meke.” Xort matmayî li Pîrên niherî û li dû ku Rêsin jî bi girr gotê bila zû ji wir biçe û xwe wenda bike, ber bihêt girtin, berê xwe bi rev da aliyê rojava, xwe bada taxeke teng ya li aliyê rastê û wenda bû.

Pîran nuha bi janê dihesiya. Milê wî yê çepê brîn bû bû, lê brîn ne yeke kûr bû. Kêr li kêleka mil ketibû, saqoyê wî çirandibû û çerm seqitandibû. Jina ciwan jî brîn bû bû, lê brîna wê hîn ji ya Pîrên

siviktir bû, çimkî hêza lawî li dû ku Pîrên xwe xist nabvera wî û xwîşka wî hatibû sînorkirin û berî kêr bigihê milê wê ew li milê Pîrên ketibû. Tevî ku kincên herduyan li doraliyên brînê piçekî şil û sor bû bûn jî xwîn ji brînan nedirijiya.

Pêlên hêrsê xwe di nav deryaya hestên jina ciwan de bilind kiribûn, lê ji girr bêtir şermezariyê ew weqa biçûk kiribû ku dê ji erdê re spasdar bûya ger ew di bin xweliya xwe de bida veşartin. Jina din jî ketibû nav pêlên şermezariyê û nedizanibû çî bikira. Koma kesên li wir gihîştibûn hev mezintir dibû. Pîran di nav hişên xwe de li rêyekê digeriya ku herdu jinan zû ji wir bi dûr xîne. Di vê bîstê de taksiya ku dê herdu heval rakirana nêzikî li kafêtêryaya Otêlê dikir. Şofêr Pîran û Rasîn nas kirin, xwe ji otomobîlê avêt der û bi lez ber bi wan ve hat, wekî ku tirsiyabe ew ketibin nav kêşeyekê. Pîrên xwe gîhand jina bi temen mezintir û bi hurmet gotê:

– Xwîşka hêja, fermo bi me re were. Teksiya me gihîşt, bila şofêr me bigihîne tixtor.

– Na, em ê bi xwe Teksiyekê bigirin; Xwedê ji we razî be.

– Xwîşka delal, me wek birayên xwe bihesibîne, fermo bi me re were, em ê tev de biçin tixtor.

Rasîn çû hawara Pîrên û got:

– Tu ji ku yî xwîşka min?

– Em ji malbata Zêroyê Çelşanî ne.

– Wey wax, xwîşkê! Em meriyên hev in. Ez Rasînê kurê Şemdînê Remdilî me. Gundê me û we li kêleka hev in.

– Ser seran birayê Rasîn. Me bihîstibû ku tu li riya welêt î. Ez Sarîna qîza Zêroyê Çelşanî, bermaliya Dr Roger im. Va jî xwarzêya min Lorîn e. Wey li min rebenê! Va çî rûreşî bû! Hela binêr em di çî rewşê de rastî hev hatin.

Jin nuha bêtir, bi encama şermezariya ji Rêşîn, kelgirî bû û nema dikaribû gotina xwe bi serî bike. Lê Rêşîn zû got:

– Na, na, Sarîn, heyfa te, lê! Em yê hev in, xwîşka min! Tişteke nabe, em ê bi hev re herin û fêhm bikin ka va çi mesele ye.

Pîran kêfxweş bû ku Rasîn hat hawara wî, lê hîn bextewertir bû dema va encama ku ne li bendê bû xwe raber kir. Her çar li taksîyê siwar bûn û ji wir bi dûr ketin. Tew nehat bîra Rêşîn û Pîrên ku pereyên kafêtêryayê bidinê.

Bi rê ve Pîrên ji şofêr xwazt ku wan bigihîne şûna pijîşkê, lê Sarîne ew haydar kirin ku mêrê wê bi xwe pijîşk e. Va yeka bi carekê ve ji bîra Rêşîn çûbû. Nuha hat bîra wî ku brayê wî yê mezin ji mêj ve, hema bi kurtedemê li dû derketina wî ji welêt, jê re nivîsandibû ku Sarîna Zêroyê Çelşanî dabûn Dr. Roger, Rogerê kurê Erdelanê Bozikî.

Rûyê Sarîne zer bû bû, lê ew wek jineke ku hêza xwe wenda kiribe nedixewinî. Wek jineke ji tevaxaftina bi mêran re natirse û xwe ji wan biçûktir nabîne dipeyvî, tevî ku berê bi encama şermezariyê kelgirî bû bû jî. Zerbûna rengê wê bêtir ji ber fedîkirina ji rewşê, brînbûna Lorîne û encamên bi bûyera cîh girtî ve girêdayî bû. Rûyê Lorîne, li milê din, ne zer, lê sor bû bû. Ew nedigiriya, lê hêstir ji çavên wê dipijiqîn. Di binê kaniya hestên wê de goleke volkaniye bi girr dagirtî dikeliya. Wê di dilê xwe de dipirsî: “Bo çi va kirina dînan?” Wê namûsa malbatê û eşîrê di erdê nedabû, bi kesekî re nereviyabû, navê bapîran gemarî nekiribû, leke li şerefa binemalê nexistibû! Ji xwe dipirsî: “De çima bavê minî serhişk va brayê remtele bi dû min xistiye? De çi ye va riswakirina di orteya bajarê Tarê de?” Pîrên xwazt tişteki bibêje, lê gotineke bo mebesta xwe di cîh de nedît. Agirê bi dilê Lorîne ketibû alawiya xwe digîhand can û giyanê wî jî, lê nedizanibû wî agirî çawa vemirîne. Sarîne xwe ber bi xwarzêya xwe ve bada, ew ji aliyekî ve hembêz kir û rûyê wê maç kir. Dû re bi dengêkî nizm, lê di heman demê de bi hêz, gotê, “Xwe bi hev de Lorîn, xwe bi hev de!” Lorîne kesereke kûr kişand û

bi dengekî nizm tenê got, “Ax, va çi hal e, xaltiya delal, va çi hal e?!”

Taksî li pêş koşkeke biçûk rawestiya û Sarînê herdu peya vexwandin hindir. Rêsin ji şofêr xwazt ku li benda wan bimîne. Li dû ku Sarînê herdu mêvanên xwe di odeya mêvanan de bi cîh kirin wê zû ji mêrê xwe re telefon kir û dirêj nekir wî, çenteyê dermên di dest de, xwe gîhand mala xwe. Jina wî ew zû haydarî serpêhatiya li navenda bajêr qewimî û herdu mêvanên nuha li mala wan kir. Dr. Roger jê xwazt ku zû hinek av bikelîne û berî biçe cem mêvanan derziyek li piyê Lorînê xist. Dema Rasîn û Pîrên di odeya mêvanan de dîtin keniya, dest da her duyan û got, “Va jî lêrasthatineke ji wan lêrasthatinên ku Mamoste Rojperest di gotara xwe de hanîbûn ser zimên e, ne weha ye?”

Dr. Roger ji mêj ve Rasîn nedîtibû û lewma ew di kombûna li beşê jorîn yê Çayxaneyê Aramo cîh girtî de nenasîbû. Ew hevaleyê ji hevalên nêzik yên Leheng û Mamoste Locan bû û yek ji endamên koma birêvebirina projeya Leheng bû, ku nuha wek Projeya Baxçeyê Ronahiyê dihat binavkirin.

Li dû pêçandin û dermankirina brînên Lorînê û Pîrên xwarina navreyê jî edî amade bû. Dema xwarin bi dawî hat, axaftina di navbera mazûvên û mêvanan de germ bû. Xelkê Tarê çîqa bi salan hev û din nedîtibin û çîqa ji hev dûr mabin jî, dema li hev rast dihên û li kîbûna hev dipirsin diyar dibe ku ew ji dûr yan ji nêzik ve hev û din dinasin. Dr. Roger meriyên Rêsin, ku endamên êla xezûranên wî bûn, baş dinasîn. Wî meriyên Pîrên jî dinasîn û rêza wî ji malbata wan re hebû – malbata ku rehên xwe digihîştin eşîra Kaşan Begê. Di navberê de kurê Dr. Roger, lawekî yanzdeh salî yê bi navê Lewend, çayê hanî hindir. Dr. Roger dest pê kir mêvanên xwe derbarê serpêhatiya Lorînê de agahdar bike:

“Xezûrê min, Zêroyê Çelşanî bi rehmêtî, bavê neh qîzên ji du jinan bû. Peyakî, Xwedê rehma xwe lê bike, xwedan zevî û pez bû, lê mixabin ji dest nehat xwe ligor guhertina dem û dewranê bide guhertin.



“Bo bi rehmetî xezûrê min ‘qîz heta roja zewacê belaya serê bavan bûn.’ Ya grîng bo wî ew bû ku bila qîzên wî ‘herin bisitirin.’ Hema kê qîzeke wî bixwazta, bila tenê ji malbateke ‘bi kok û benate’ bûya, nedigot na. Wî qîza xwe Karîn da Moroyê Medo. Moro ji malbateke mezin e û rêza xelkê jê re heye, lê mixabin di mala xwe de hem serhişk û hem dilhişk e. Wî sozê ku dê Lorînê, dema hîn deh salî bû, bide kurekî brayê xwe Salo dabû. Brazêyê wî, navê xwe Segvan e, dema Lorîn hevdeh salî bû çû eskeriyê. Feqîrî hema du-sê hefteyan berî were berdan rastî qezayekê hat û bi encamê ji navê û jê ve kût bû. Xwediyên ew birin bajarên mezin û ber destên tixtorên navdar, lê fayde nekir. Sal zû derbas bûn, temenê wî bû bîst û çar û yê Lorînê bîst û du. Hinek li dû seqetbûna Segvên hatin ser Lorînê, lê bavê wê her got, ‘Na, min carê soz daye birayê xwe û însellah biraziyê min wê rihet bibe.’ Xwediyên Segvên hîn jî şêx û seyda dihanîn ser wî.

“Lorîn keçeke gellekî zîrek e...” Li vir Dr. Roger dengê xwe daxist û bi nivhenekî, bi dengekî kenok, domand:

“... çîqa piçek serhişkî ji bavê xwe girtibe jî. Wê hema-hema bi enatiya xwe xwendina ta dawiya sinifa 10an domand. Bav çîqa li dij bû jî, diya wê hat hawara wê û bi encamê Lorîn ta hevdehsaliya xwe di dema vebûna dibistanan de dihat Tarê û li mala xaltiya xwe Fato û mêrê wê Locan Efendî dima.”

Van peyvên dawîn, wekî ku agahiyeke mathîştinê ragîhandibin, serên Pîrên û Rêsin piçekî bi jor ve livandin. Dr. Roger domand:

“Erê, ez û Locên ji heman malê zewicî ne. Xwîşka Sarînê Fato jineke jêhatî û fêde bû. Ew keça sêyemîn ya bav û diya xwe bû, bêtîrs bû û ya tenê bû ku dikaribû li ber bavê xwe sêri hilde. Wê jî umrê xwe da we. Feqîrê berî sê salan bû qurbana şêrpençeyê.

“Lorîn wê demê di nav Koma Folklorî ya Tarê de bû jî. Nizanim heke bala we kişandibe, ew yek ji wan keşan bû ku berî çend rojan di salona jorîn ya Aramo de di dîlanê de bûn.”

Li vir jî Pîran bi encama matmayînê veciniqî û bêhemdê xwe got:  
“Na lo!”

Dr. Roger got: “Belê! Tevî ku ew nuha ne di nav koma folklorê de ye jî, hevalên wê xwestin ku illeh ew jî bi wan re be. Dirêj nekim, ber du mehan Moro û birayê xwe tevdêr kirin ku zewaca Lorînê û Segvên êdî bi rê xin. Ligor bavê wê, va yeka qedera wê bû û kuramê wê hewcedarê jinekê bû bo xizmeta wî bikira. Çiqa Lorînê ber xwe da, çiqa giriya û çiqa li ber bavê xwe geriya jî fayde nekir. Wê şand dû xaltiya xwe, kebanîya min, û em çûn me ew hanî, bi huceta ku em ê jê re li bajêr hinek tiştan bikirin û kincan bidin dirûn. Dema bavê wê dû re şand dû wê, îcar Lorînê bersîva wî da û got, ‘Hûn min bikujin jî ez bi Segvên re nazewicim.’ Dema bavê dît ku Lorîn venagere...”

Li vir jî Dr. Roger dengê xwe daxist û domand:

“... ew gellekî hêrs bû. Bi rastî ez jî ketim nav du agiran. Ji aliyekî ve neheqiyeye mezin li Lorînê dibû, lê li aliyê din Moro bavê wê bû. Li dawîya dawiyê bav hat mala me. Min çiqa jê re got jî, nuha li wî qert bû bû û min nikaribû wî wînim ser rê. Wî got, ‘Xwedê jî were, ew ê illeh vegere mal.’ Lorînê ji aliyê xwe ve baş dizanibû ku vegera li mala bavê zewaca bi Segvanê kût re bû. Wê jî got, ‘Hûn min bikujin jî ez venagerim û bi Segvên re nazewicim.’ Moro li dû bihîstina vê gotinê xwe ji erdê ber bi jor çekir, bi telaq û dîn û îmanê sond xwar û got, ‘Keçê, heke tu di nav sê rojan de ne li gund bî, bira diya te xûşka min be, bira Xwedê min kor bike, eger ez te sax bihêlim! Heke ez nikanibim te bi saxî bibim mal, ma ez ê nikanibim te mirî li mal vegeînim, hey bêterbiya!’ Li dû va gotina xwe ew ji hindir derket.

“Min û Locên, me tevdêra xwe dikir ku em tev çend meriyên xwe biçin mala bavê Lorînê, lê pîrsa kombûna li Tarê, serpêhatiya Leheng û encamên pê ve girêdayî em eware kirin. Mixabin Moro di navberê de kurê xwe yê dîwane rêkiriye Tarê û we dît çî bû. Xwedê kir ku hûn li wir bûn û elhemdû-lîllah tiştek nehat serê Lorînê. Lê

bêguman em hemî bi vê kiryara ehmaq li pêş xelkê fedîkar derketin.”

Herdu mêvanan kirin ku bêhna mazûvanê xwe fireh bikin. Wan serpêhatî bi ser û binê wê ve wek “serpêhatiyeke trajîke ku ji aliyê bed yê toreyên me tê” bi nav kirin. Pîrên pirsî ka berê vê pirsê nuha bi ku ve bû. Dr. Roger got ku wî Mamoste Locan agahdar kiribû û ew ê berbanga roja din tev dostine xwe biçûna gundê Moroyê Medo, bi hêviya dîtina çareyekê. Ligor wî, Locên ê bikaribûya biryara Moro bide guherandin. Ta nuha wî xwe bi şêweyeke rêkûpêk nexistibû nav vê pirsê, lê nuha ew jî gellekî êşiyabû û gotibû, “Divêt va pirsê sibe were çareserkin.” Her weha gotibû ku qîza wî pirr xemgîn bû û dixwazt xaltiya wê Lorîn bo çend rojan bi wan re bimîne. Vê gotinê dilê Pîrên aram kir û Rasîn dilşad kir. Herdu hevalan spasiya Dr. Roger kirin û daxwaza rêdanê kirin ku rabin, lê mazûvên çûna wan di vê bîstê de di cîh de nedît û got, “Na, na, nabe. Êdî esrê teng e, dereng e. Brîna Pîrên jî lazime bi kêmasî du-sê carên din were dermankirin û paçê li ser were guhertin.” Got ku ew ê kurê xwe bi şofêrê wan re rêbîke mala Moro da wî haydar bikin ku sibe mêvanên wî hene. Dû re pêşniyaz kir ku ew jî sibe bi wan re biçin û ji gundê Moro herin gundên xwe.

Rêsîn xwazt tiştêkî bibêje, lê Pîran ber wî peyivî, ji Dr. Roger re spas kir û dû re li Rêsîn zivirî û pirsî: “Te çi got, Rasîn? Em ê sibe bi Dr. Roger û Mamoste Locan re serî li mala bavê Lorînê xin û ji wir biçin gundên xwe.” Rêsîn ya di dilê Pîrên de hest kiribû û dema li şûna bibêje “mala Moro” got “mala bavê Lorînê,” wî bi kenekî li ser lêvan diyar bûyî bersîv da û got, “Ez gellekî ji te re spas dikim birayê qedirbilind Dr. Roger; ez ê bi ya te û Pîrên bikim.”

Ber Dr. Roger xêtir ji mêvanên xwe bixwaze, divabû biçûya dîtina nexweşine xwe, xwarzêyê wî Berhan, yê ku li bajarê mezin di zanîngehê de bû û di dema tatîlê de dihat Tarê, gihîşt. Dr. Roger ew û herdu mêvan bi hev dan nasîn. Dû re bang kurê xwe kir û ew gîhand şofêrê ku berê, dema xwarina navreyê, pê re peyivîbû. Wî jê xwaztibû ku kurê wî bibe gundê Moroyê Medo û vegefirne û di berbanga roja li pêş de dîsa bizivire mala wî. Dr. Roger gotibû, “Em

ê bi rojhilat re bi rê kevin û herin mala Moroyê Medo. Ji wir tu dê Rêsin û Pîrên bigihînê gundên wan; û ji bîr meke, hesabê te li cem min e; peran ji wan megir.” Sarîne li kurê xwe tenbe kiribû ku bila xaltiya xwe û bixaltiyên xwe agahdare wê yekê bikirana ku rewşa Lorîne baş bû û tenê milekî wê piçekî şeçitî bû.

Li dû çûna Dr. Roger her sê kesên li mala wî manî li ser erf û toreyên civatan peyivîn. Ew gihîştin wê encamê ku ne hemî erf û adetên xelkê Tarê bed bûn û ne jî tevahiya yên civatên li welatên “pêşkevî” baş bûn. Di nav civatên bajarên rojavayî de, bo nimûne, lihevxdîderketina endamên civatê, bi şêweya ku li Tarê hebû, hema-hema nemabû.

Li Tarê mirov xwe bi mirov re eleqedar didît. Dema du mirovan li hev û din xistana, bo nimûne, yên li dora wan diketin navbera wan.

Pîrên got: “Li bajarên mezin yên rojava tişteki weha kêma-zêde nemaye.”

Rêsin got. “Li bajarên mezin yên wan welatan tew yê bixwaze jî newêre têkeve navbera kesên li hev dixin. Heta ji aliyê qanûnî ve be jî yê navberiyê bike dikare xwe bi encamê têxe nav kêşeyan. Bi kêmasî heye ku wek şahid bihête xwaztin. Gellek kes ne dema wan heye, ne jî dixwazin xwe têxin nav kêşeyên navbera xelkê.”

Pîrên got: “Li welatekî wek Tarê nav û rûmeta komê û berjewendiya giştî ji yên kesan grîngtir in. Kes bi hêsanî dikare ji bo komê bibe qurban. Lê di nav civatên bajarên rojavayî de rûmet û berjewendiya kesan dikarin bi rêyên qanûnî bihên parastin, heta eger li dij berjewendiya giştî û fermî be jî. Kesek dikare li komekê û heta li hukûmetê jî gilî bike. Li rojava “individualizm” heye. Di ferhenga zimanê Tarê û yên gelên dine li vê herêmê de peyveke wateya tevahî ya ‘*individualism*’ê bide tune.”

Berhên got: “Va yeka bi encama erf û toreyên eşîriyê ketiye nav xelkê Tarê. Eşîriyê gellek erf û adetên xirab xistin nav wan, lê hêza eşîran dest pê kiriye sist bibe.”

Rêsin got: “Rast e, eşîriyê hinek toreyên ku em îroj wek ne baş dibînin bi xwe re hanîn, lê bicîhbûna erf û adetên eşîrî di dema xwe de bo amancên erênî bûn. Demên par dewlet û qanûn li gellek

herêmên Tarê ne desthelatdar bûn. Ger ne bi saya erf û toreyên eşîran bûya xelkê dê hev zindî bixwarana. Van erfên eşîran qanûn û zagona di nav civatê de bûn. Bi saya wan bû ku asayiş û aramî li herêmê hebûn. Mirov dikare wan erf û toreyan di heman demê de wek peymaneke di nav endamên eşîran de bihesibîne, peymaneke ku wan dipejirandin û rêz jê re hebûn.”

Pîrên got: “Lê heta di rojên îroj de be jî gellek ji wan adetên kevn bi sûd in. Binihêrin, ger bûyera îroj çih girtî li bajarekî mezinî rojavayî qewimîbûya encamên wê dê bi awayekî din bûna. Xizm û dostên kesên eleqedar ê xwe bi vî awayî têkilî vê pirsê nekirana. Li vir mirov hîn qedr û qîmeta hev digirin, ne bi encama rêzgirtina ji qanûn û dûzanan re, lê bi encama xwedîderketina li hev û din. Çiqa baş e ku mirovine ji vir di rê kevin û biçin mala bavê Lorînê – wek mînak, bi amanca ku vê pirsgirêkê çareser bikin.”

Rêsîn got: “Çareserkirineke bêyî proseyeke dadî, bêyî bûrokrasî û bêyî rijandina pereyan.”

Berhên got: “Lê ji bîr mekin ku li Tarê dewlet dikare xwe têkilî pirseke weha bike. Ger pirseke weha têkeve dest polîsan û cendirman ew ê ji hebek şorbeyekê çêbikin.”

Pîrên got: “Weha ye, lê va jî bi encama gendeliya di nav dewletê de ye.”

Rêsîn got: “Mixabin bi derbasbûna demê re van erf û toreyên çak jî dê bi ber lehiya guhertinê kevin. Ne tenê dewlet û qanûn û bûrokrasî dê zû-dereng xwe li tevahiya Tarê jî bi çih bikin, lê daniştvanên wê dê ji vir û şûn ve bi gavên bezatir ber bi guhertinê ve biçin. Dirêj nake radyo, televizyon û kompiyûter ê xwe bigihînin gund û bajarokên ta nuha, em bibêjin ‘pareastî’ manî jî. Heta bi wan komên ku bi dirêjiya sedsalan di nav çîyan de ziman, çand û toreyên xwe parastinibûn, ew jî dê nema bikaribin rê li bayê ji derve dihêt bibirrin.”

Berhên got: “Va jî ne tiştêkî xirab e, ji paşvemayîn û kevnepereştiyê baştir e.”

Pîrên got: “Ne her tiştê ku wek “kevn” tê binavkirin illeh xirab e. Di nav wan tiştên “kevn” de gellekên baş jî hene. Guhertin baş e, lê guhertina ku tenê ji bo xatirê guhertinê be heye ku bi ziyar be.”

“Û guhertina tenê ji derve ve jî bi serê xwe ne guhertineke erênî ye. Guhertin divêt ji bo xatirê baştirkirina rewşê be û ta mumkûn

be guhertineke bi bawerî be, ne ku tenê rakirina yên din,” got Rêşîn.

Dû re her sê derbarê mafên jinan de peyivîn. Lê ji axaftina wan baş diyar bû ku nedixwaztin xwe têkile kûraniya pirsê xwe bi “azadiya jinê” ve peywendîgir dikir, bikin. Gelo “azadiya jinê” tenê ew bû ku bikaribe mêrê xwe bibijêre? Gelo ew bû ku rêdana bo leyztina rolên civatî/siyasî bo wê hebûya? Yan gelo “azadiya jinê” bêyî sînor bû? Qe nebe heman azadiya bo mêran hebû bû?

Ya seyr li vir ew bû ku helwestên herdu peyayên ji salan û vir ve li bajarên rojavayî dijîn û xwediyên şehadeyên akadêmî bûn, derbarê hinek pirsên civatî de ji yên ciwanê bi wan re danîştî bêtir “xweperest” bûn.

Berhan li bajarê mezin ketibû nav komeke ku endamên wê xwe wek “pêşverû” dizanibûn. Hinek pirtûkên marksî-lenînî xwendibûn û wek hevalên xwe hema-hema hemî toreyên civata li Tarê wek “kevneperest” didîtin. Ew hatibû guhertin, lê gelo rast guhertineke bingehîn bûya? Heye ku wî bi xwe jî fersend nedabe xwe ku derbarê bersîva vê pirsê de kûr bîponije. Bi gotinê bi tevahî ligel “azadiya jinê” bû, lê ger yekî bihata li gundê wan bi xwîşka wî re hevalî bixwazta, bo nimûne, bêyî guman ew ê li dij bûya, meraqa xwîşka wî çî bûya jî. Ew kesê bibêje, “Ez bi tevahî ligel azadiya jinê me,” ger rast wateya gotina xwe fêhm bike û bi wê xwebêjê re dilsoz be, wê demê biryara derketina xwîşka wî ya gihîştibe temenê guncav bi dostekî re dibe ya wê bi xwe, ne ya wî! Mirovê “bi azadiya tevahî ya jinê bawer” maf niye şert û mercan bi “azadiya jinê” ve girê bide. Ger Berhan, bo nimûne, azad e bi keçekê re derkeve, û ger di heman demê de bibêje ku ew bi azadiya tevahî ya jinê bawer e, wê demê xwîşka wî jî dibe xwediyê mafên ku bo wî hene, ligor wê prensîbê. Li vir duristiya mirov û neduristiya wî aşkere dibe. Ger kesek rê nede xwîşka xwe ku hevaliya mêrekî bike, wê demê divêt vê berbendkirinê bo xwe û mêrên din jî bixwaze, yan na, navê ew xwe wek “bawermendê bi azadiya tevahî ya jinê” bide nasîn. Ger va kesa nexwaze, yan nikaribe, azadiya xwe û ya xwîşka xwe, yan jina xwe, ligor heman

pîvanan binase, wê demê baştir e diyar bike ka azadiya jinê li nik wî ji ku dest pê dike û li ku radiweste. Bi encamê divêt bêyî xwebadan bi wêrekî bibêje ku ew bi wekheviya tevahî ya jin û mêr ne bawer e, ku azadiya jinê sînor jê re heye; yan divêt bi kêmasî bipejirîne ku civata wî ji bo wekheviya tevahî ne amade ye. Dema hinek ciwanên Tarê li bajarên mezin bi serbilindî piştgiriyê li “azadî û wekheviya jinê” dikin, ew ligor atmosfêr û rewşa ku ew li wî bajarê mezin di nav de ne diaxafin, ne ku ligor atmosfêr û rewşa di nav komeke ku endamên wê hev dinasin de, komeke bi erf û toreyên êlî û olî ve girêdayî.

Hinekên din ji Tariyan, li milê din, bi taybetî ewên ku fersenda xweperwerdekirineke rasteqînî bi dest xistine û civata Tarê ji nêzik ve dinasin, ligel ku ew bi xwe piştgirên azadiya jinê ne jî, vê pirsê wek koma din hêsan nabînin, çimkî hem şert û mercên civatên ku tê de jinê “azadî” bi dest xistiye de ji nêzik ve dinasin, hem jî derbarê erf û toreyên ku hîn li Tarê zindî ne de xwedan zanistiyêke kûr in. Lewma ew wêneyên herdu aliyan zelaltir dibînin û herduyan fêhm dikin. Endamên koma din bi encama guhertineke tenê derveyî, razîkirina yên din, yan bo xwepesindana bi peyva “pêşverû” xwe wek bawermendên bi “azadiya jinê” raber dikin, bêyî ku rast pê bawer bin; yan heye ku ew wê “azadiyê” ji jinên xelkê re dixwazin, ne ku ji yên malbata xwe re.

Hatina Lorînê û Sarînê axaftina her sê peyan birrî. Sarînê hinek şîranî û tirî li ser maseyê danîn û Lorînê qehwe li wan belav kir. Li dû ku Sarînê çenax danîn ber mêvanên xwe ew li cem wan ma. Lê Lorîn dîsa çû der û hêviya Pîrên ku hema bo kurtedemekê bi wan re danîşe bi cîh nebû.

Sarînê got: “Bibexşînin, birayên hêja...”

Rêsîn got: “Ya rast, em bexşandinê ji we hêvî dikin. Ma em ê çi kêmasiya ji we bibexşînin?”

“Çi heyf ku em bi encama wê qezaya rûreşiyê li hev rast hatin.”

“Çi rûreşî xwîşka delal? Em yên hev in û tiştên weha li Tarê dibin, de em ê çî bikin!”

“Welleh em li hember te û Pîrên fedîkar derketin. Lorîn weqa bi ber xwe dikeve ji bo vê yekê. Dibêje, brîna min ne tişt e û Xwedê wî brayê nezan di erdê ke; heta bi kiryara wî be jî min weqa nediêşîne, wekî şermezariya li pêş Rêsin û Pîrên.”

Pîran bi bihîstina navê xwe kêfxweş bû, bi taybetî dema bihîst ku Lorînê ew bi nav kiriye.

Pîrên gor: “Bawer bike em jî wek we êşyan. Malbat malbata me ye û êşêşa me ye jî.”

Sarînê got: “Xwedê ji we razî be. Xweziya bûyerên weha cîh negirtana, lê em çî bikin! Ew jî wê were çareserkin.”

Rêsin got: “Bêguman. Em jî dest ji Tarê bernadin ber çareserkirina vê pirsê.”

Pîrên got: “Brayê doktor ji me xwazt em sibe bi hev re biçin mala bavê Lorînê.”

“Baş dibe, lê me hûn ji riya we jî eware kirin,” got Sarînê û pirsî, “Berhan, tu jî bi me re naçî?”

“Na, bi Xwedê sibê kombûneke min bi hinek hevalan re heye,” Berhên bersîv da.

Pîrên got: “Çawa be jî, wê bûyera ne bi xêr encameke baş ji bo me hebû. Me hûn dîtin û me hev nas kir.”

“Em jî bi dîtina we kêfxweş bûn,” Sarînê lê vegerand.

Dirêj nekir Dr. Roger jî hat û mêvanên xwe agahdar kirin ku Locan, Aramo û sê dostên din ê ji bo xwarina şîvê bi wan re bin.



\*\*\*

Roja din, roja îniyê, 3 otomobîl bi rojhilat re ji pêş mala Dr. Roger ber bi gundê Moroyê Medo bi rê ketin. Di otomobîla Dr. Roger de ew, Sarîn, kurê wan yê ciwan û Lorîn daniştibûn û di ya Mamoste Locan de ew û sê dostên xwe: parêzgerê qanûnî Ihsan, bazirganê li Tarê navdar Rewanê Warî û birayê îmamê Tarê Şêx Safî. Rasîn, Pîran û Aramo di taksiya hatî kirêkirin de bûn, lê şofêr ne bi wan re bû. Aramo, yê ku ji ajotina otomobîlan hej dikir, hinek pere xistibûn destê şofêr û jê re gotibû bila ji xwe re rojekê vêsî bike, ku ew ê bi xwe taksiya wî biajo. Aramo ji şofêr re gotibû, “Danê êvarê were otomobîla xwe ji çayxaneyê rake; û ger te xwazt here li wir navreya xwe jî bixwe û bbiêje Rîso min tu rêkirî wir.” Aramo ne tenê ji bo ajotina otomobîlê va yeka kir, lê her weha ji ber ku dixwazt di Taksiyê de vekirî û bi serbestî bi hev û din re bipeyivin. Şofêr Aramo baş dinasî. Ji aliyekî ve dê nikaribûya bigota na û ji aliyê din ve bi wê pêşniyaziyê kêfxweş bû. Taksî ya wî bi xwe bû û wî dizanibû ku Aramo ne tenê mirovekî pêbawer e, lê her weha di ajotina otomobîlan de hoste ye.

Her sê siwarên otomobîla dawîn derbarê Tarê, rewşa ew tê de û amancên dilsozên wê de gellekî peyivîbûn, dema Rêsin ji nişkan ve pirsî: “Pîran, bêje, tu li Berlînê ji jiyana xwe razî yî?” Pîranê ku ne li benda vê pirsiyarê bû ber bersîvê bide piçekî ponijî û dû re got:

– Bersîva pirsî te ne hêsan e. Jiyan li Berlînê bêguman xweş e. Ez ji karê xwe jî razî me, lê min li wir ne jin û ne zaro û ne jî çi mulk hene. Ya rast min çi tevdêrên ji bo siberojê jî li wir nînin; ez her dibêjim xwe: roj bi roj û sal bi sal gavan rane.

Rêsin got: “Baş e, tu bo çi venagerî Tarê? Bawer bike, ger jina min ji Tarê bûya, yan bi kêmasî erd û mulkê min li Tarê hebûna ez ê vegeyriyama. Te jin û zaro li Berlînê nînin. Li milê din, zeviyên te yê baş li vir hene û ger ne şaş bim xaniyekî we jî li bajêr heye. Wekî te bi xwe ji min re got, ta wê roja tu bi xwe serpereştiya

zeviyên xwe nekî brayên te ji xêra wan tiştêkî nagihînin te. Hatina te dê ji bo Tarê, projeya Navenda Çandî û Baxçeyê Ronahiyê jî bi sûd be.”

Aramo bi germî got: “Bêguman wa ye; em ê bi vegera te gellekî kêfxweş bibin, Mamoste Pîran.”

“Hela em binêrin çi dibe,” Pîrên bi keser got.

Rasîn’ê ku bi encama hestê tawanê dihat êşkencekirin, ji ber ku bi xwe nikaribû vegere, bi kêmasî ne nuha, berê di vê pirsê de ponijî bû û biryar girtibû ew ê her tiştê ji dest dihêt bike ku Pîrên li Tarê vegevine. Dengê ku wî di odeya xwe de bihîstibû, dengê ku gotibûyê “Tarê dîsa bikin war” ji bîra wî nedîçû. Qe nebe, ger Pîran vegeriya ew hestê tawanê dê piçekî siviktir bibûya. Li milê din, wî dê bikaribûya bi saya vegera Pîrên û bi rêya peywendiya hevbeş ji Amerîka alîkariya Projeya Baxçeyê Ronahiyê bikira. Di kûraniya dilê wî de hestê tawanê ew dax dikir. Nîvê wî digotê, “Kuro vegere welatê xwe; ma dûrmayîna bo xatirê sê zaroyan û diya wan rast berdêleke bi heman giraniyê be?” Lê nîvê din, ku di bin bandora ramanên rojavayî de mabû, jê re digot, “Na, her sê zaro û diya wan nuha malbata te ne û navê tu dest ji wan berdî û biçî Tarê.” Lê di kûraniya dilê wî de sedemeke din jî hebû. Dizanibû ku zihniyeta wî û ya xelkê Tarê êdî bi gellek şêweyan ji hev dûr ketibûn, wan ê nikaribûna bi hêsanî bi hev re kar bikirana û ji hev tehmûl bikirana. Wî dixwazt Pîran li welêt vegere. Kî dizane? Ger vegera wî encamên baş bidana û Pîran bi xwe bi wan encaman dilşad bûya, heye ku vê yekê di siberojê de vegera wî jî hêsantir bikira.

Li nik Rêsin çi guman nebûn ku dilê Pîrên bi çavlêketina yekem re ketibû Lorînê. Ew hebekî ponijî û li dû bîsteke bêdeng got: “Pîran, ger tu biryara vegeirê bigirî, em ê Lorînê ji te re bixwazin..”

Bihîstina vê hevokê Pîran veciniqand, lê veciniqandineke bi hestên bextewer. Xwazt tiştêkî bibêje, lê piçekî fedî kir û peyvên guncav nedîtin.

“Tu dê bi hêsanî wezîfeyekê jî li Tarê bi dest xî. Di heman demê de tu dê roleke sereke di Projeya Baxçeyê Ronahiyê de bilîzî. Bi

zewaca te û Lorînê re bi rastî jî gavên yekem ber bi Warê Evînê ve dihên ranan,” Rêsin domand.

– Rasîn, bi rastî te ez xistim dehfê, lo! Nizanîm çi bibêjim!

– Biryar ya te ye; tenê bibêje erê û xwaztina Lorînê ji te re li min.

Aramo got: “Çi ji dest min were ez ê jî bikim. Lorîn layiqe her tiştî ye, bi Xwedê. Pîr kêm in li dunyayê ew keçên ku di eynî wextê de hem şêr û hem xezal bin. Lorîn yek ji wan e.”

– Malavano, ma Lorîn hema bi min qayil be! Mixabin ez nikarim bi xwe jê bipirsim. Ger bi xwe ne qayil be bav bibêje erê jî ji bo min pere nake. Ê hîn bi ser de kêşeya bi pismamê wê re...

Tu hema bibêje erê, ez kefilê her tiştî me,” got Rêsin.

Dr. Roger ji Rêsin re gotibû ku ew bi mebest Lorînê bi xwe re dibine. Vegera li mala bavê dê devê xelkê bigirta û bavê wê aş bikira. Locên dê ji nuha ve rêdan ji Moroyê Medo bixwazta, û Moro gotina wî paş ve venedigerand, ku ew ê li dû hefteyekê otomobîlê bişîne pê Lorînê da ku çend rojan li Tarê bi wan re derbas bike, berî vegera zaroyan li xwendegehê.

Tevdêra Rêsin ev bû: Agahdarkirina Mamoste Locanî ku meraqa wan li xwaztina destê Lorînê bo Pîrên hebû û ew derbarê vê yekê de alîkariya wî dixwazine. Ger bersîva wî piştgir bêt, dê jê tika bike ku Pîran li mala wî Lorînê bibîne da ku berê bi xwe jê bipirse ka zewaca bi wî re bi dilê wê ye. Ger Lorînê bigota erê, wê demê brayên Pîrên, Locan, brayên Rêsin bi xwe û hinek kesayetiyên Tarê dê biçûna destxwaziya Lorînê ji bavê wê.

Pîrên razemendiya xwe, çîqa piçekî bi şermokî be jî, diyar kir. Aramo, te digot dê ji kêfxweşiyê bifire, bêyî hemdê xwe dest ji dîreksiyon berda, xwe paş ve bada û bi herdu destan destê Pîrên guvaşt. Rasîn kenîya, lê tirsîya û dest avêt dîreksiyonê.

Mêvan taştîyan gihîştin gundê Morayê Medo. Bi gihîştina otomobîlan re Moro, jina wî Karîn, zarokên wan, her weha çend peya, jin û zarokên ji malên din ber bi wan ve hatin. Karîn ber bi qîza xwe ve reviya, ew hembêz kir û sê-çar caran maç kir. Dû re çû rûyê xwîşka xwe û kurê wê. Moroyê ku ew bizava dikir şanên rûreşiyê û şermê ji ser rûyê xwe rake çû rûyên Mamoste Locan û Dr. Roger û dû re yek bi yek dest da mêvanan. Dr. Roger Rasîn û Pîrên bi wî dan nasîn û Moro bixêrhatineke germ li wan kir.

Odeya mêvanan mişt bû bû. Bavê Segvên jî di nav cema'etê de bû. Tenê kurê Moro Hîvo ne li wir bû. Li dû ku mêvanan û mazûvanan li hev û merivên hev pirsîn, derbarê herême û rewşa wê de piçekî peyivîn û bo demekê li ser kujtina Leheng Axa rawestiyar; Mamoste Locan li Moro niherî û bi vê hevokê deriyê pirsra ew ji bo çareserkirina wê hatibûn vekir: "Va kirina ku Hîvo kir ne layiqe we bû, brayê hêja. Em hemî şermezar kirin di nav xelkê de, bawer bike!"

Mamoste Locan bi mebest gotina xwe weha hanî ser zimên. Bi vê gotinê wî ji Moro re hêsan kir ku tawanê bi tevahî têxe stuyê kurê xwe, wekî ku "ew tolaza," ne ku ew bi xwe, berpirsiyar be.

Moro xwe da hev û bi dengekî ku diyar bû bi şermezariyê dagirtî ye got: "Bawer bike ku em hemî bi kirina wî lawê dîn êşîyan. Ha binêrin ew ne li vir e. Ji tirsan çûye çiyê. Erê, em ji Lorînê piçekî dilsar bûn, lê ma tiştê wî remteleyî kirî tiştê kirinê bû? Me bibexşînin; ez berî her kesî ji te û Dr. Roger fedîkar im."

Gotina Moro ji rastiyê ne vala bû. Erê, wî gef li Lorînê xwaribûn, lê ew gotinan bîsteke hêrsbûnê ji devê wî hatibûn der û ew bi xwe dû re li wan poşman bû bû. Wî çî caran rasterast ji kurê xwe re negotibû ku bila biçe di navenda bajêr de bi kêrê li xwîşka xwe xîne, tevî ku hinekan weha bawer dikirin jî. Ya rast, ya li paş vê kiryarê diya Segvên bû. Wê Lorîn di çavên Hîvo de kiribû ma'r û heta carê gotibûyê, "Hîvo! Kuro ma tu ne peya yî?! Kuro, xûşka te li bajêr wek qehpan diçe û têye, we jî xwe li vir kerr kiriye û serî

berdaye erdê! Ma hûn ji xelkê jî fedî nakin? Bi Xwedê ez qîza xwe Şîrînê nema didim te.” Va gotina wê bû ku Hîvoyê berê piçekî har hartir kiribû û ber bi Tarê ve bi rê xistibû.

Mamoste Locan li Dr. Roger niherî û got: “Em hatine ji vê pirsê re çareyekê bibînin.”

Dr. Roger got: “Kekê hêja Moro, tu û Bavê Segvên wek brayên me ne. Bêguman brazêyê me Segvan xortekî ji wan xortên hêja û delal e, ew û Lorînê layiqe hev in. Lê mala felekê bişewite! Wek em hemî agahdar in û derheqê wê yekê de gellekî bi xem in, hezar heyf ku Segvan nema dikare ji wê seqetbûna malwêran xelas bibe. Min bi xwe raportên hemî tixtorên lê niherîbûn xwendin. Mixabin ku çare tenê li cem Xwedê ye!”

Mamoste Locan li Bavê Segvên niherî û got: “Ji ber vê encama diltezîne ye, brayê hêja Bavê Segvên, ku em hatine ji te û brayê me Moro rica bikin, ku hûn girêka benê destgiriya Lorînê û Segvên vekin. Lorîn wek brayekî hêja ji Segvên hez dike û dilê wê li ser rewşa wî bi şewat û êş e, lê zewac tiştekî din e û neheqîkirina li wê jî ne durist e.”

Gotina dawîn rewş di odayê de bo kurtedemekê kerr kir, lê her sê mêvanên ku Mamoste Locan bi xwe re hanîbûn, ew jî bi şîret û peyvên nerm çûn hawara Mamoste Locan û Dr. Roger. Berî xwarina navreyê bihêt danîn herdu bra bo bîstekê derketin derve. Bi danîna sifreya sor û gihîştina babetên xwarinê re ew vegehiyan hindir û mazûvên mêvanên xwe vexwandin ser sifreyê. Li dû xwarinê û belavkirina çayê Moro dest bi axaftinê kir:

– Girtina biryara ku dê nuha ji we re aşkere bikim ne hêsan bû. Min carê soz dabû brayê xwe û va bûn çend sal Segvan û Lorînê destgirtiyên hev in. Lê kesek nikare qederê biguhere, her hal qedera wan wa ye. Lorîn qîza min e. Min jî dizanibû ku zewaca wê û Segvên wê tiji zehmetî û fidakarî be, lê min carê soz dabû. Min digot qîza min wê qayil be xwe ji bo xatirê me û kurmamê xwe bike qurban. Lê dunya hatiye guhertin, û belkî heqê wê be jî. Ji bo

xatirê we mêvanên ezîz, ez ê wê bibexşînim. Min û brayê xwe biryar girt ku ji nuha û şûn ve Lorîn nema destgirtiya Segvên e.

Bavê Segvên bi dengê nizm got:

– Ya rast ji we mêvanên delal re bibêjim, Segvên deh çaran ji min xweziye ku em dest ji vê tevdêrê berdin. Ew bi xwe jî zewacê wek neheqiyeye li dotmama xwe dibîne. A va cara yekê ye ku ez vê gotinê di nav cema'etê de dikim.

Mamoste Locan, Dr. Roger û dû re mêvanên din rabûn ser xwe û çûn rûyên Moro û brayê wî ramûsan û ew hembêz kirin.

Êdî bêhna mêvanan û mazûvanê wan fireh bû bû û axaftin dîsa germ bû bû dema Mamoste Locan, Dr. Roger û Moro derengê dû nivro rêdan xwaztin û ji bo demekê çûn aliyê jinan. Li wir Lorîn çû destê bavê xwe û bavê rûyê wê ramûsa. Êdî qeşaya li ser ava cemidî şkestibû û ken bi ser lêvên endamên malbatê ketibû. Karîne ji Mamoste Locan û Dr. Roger re ji kûraniya dilê xwe spas kir. Hemiyan careke din li halên hev pirsîn û rêdan ji Moro hat girtin ku Lorîn li dû hefteyekê dîsa vegere bajarê Tarê û çend rojan bi xwarzêyên xwe re derbas bike.

Dema xatirxwaztinê Lorîn jî li derve bû û wê yek bi yek dest da mêvanan. Çavên wê û Pîrên dîsa rastî hev hatin û her çar çav bi hev re ketin nav danûstendineke nehênî ya bi meraqa li evîndariyê dagirtî, danûstendineke ku ligel kurtbûna xwe jî bi hezaran peyvan ê nikaribûna wateya naveroka wê bi duristî ragihînin. Ligel ku kenekî sivik li ser lêvên Lorînê diyar bû jî, ew di dilê xwe de bi xem û keder bû, bi encama baweriya ku dê nema Pîran bidîta, yan heye ku ew li dû salên dûr û dirêj li şûnekê rastî hev bihatana, di demekê de ku nema ji bo xewnên hevbeşe rengîn alîgir bûya.

Va bû bûn du roj Lorîn li mala Mamoste Locanî bû. Heyşt rojan li dû serîlêdana mala bavê wê, wî kurê xwe û kurê Dr. Roger di otomobîlekê de şandibûn da ku wê bihînin Tarê.

Rêsîn li dû vegeza ji gund di cîh de Mamoste Locan haydar kiribû ku wan biryara xwaztina Lorînê ji Pîrên re girtine û alîkariya wî derbarê vê pirsê de tika dikin. Mamoste Locan gotibû ew vê yekê wek nûçeyeke şadkirinê dibîne û dê tê de biponije. Roja din wî Rasîn û Pîrên vexwandin mala xwe. Rêsîn ber wê jê tika kiribû ku bila fersendê bidin Pîrên da ku berê bi xwe ji Lorînê bipirse ka destxwaztina wê bi dilê wê bû. Mamoste Locanî pêş gihîştina herdu mêvanan Dr. Roger û Sarînê derbarê mijarê de haydar kiribûn û Sarînê ji aliyê xwe ve Lorîn agahdare wê yekê kiribû ku Pîranî dil hebû bi wê re bipeyive.

Va roja li Lorînê bû bû wek salekê. Di nav hişên wê de weqa raman li nav hev diketin û dilê wê carina ji pêdiviyê bezatir lêdida. Van çend rojên derbas bûnî wek xewnekê bûn bo wê, xewneke bi alîne reş, lê her weha bi çend aliyên geş. Nuha dizanibû Pîran ji ku ye û endamê kîjan malbatê ye, lê ligel ku dilê wê jî bo Pîrên bi meraq bû, wê ew ji nêzîk ve nedinasî. Dilê wê jê re digot: “Qayil be, vê fersendê wenda meke!” Lê wê meraq dikir ku wî bi şêweyê çaktir binase. U’mrê wê bû bû bîst û sê sal û hinekan ê ew nuha wek “keçeke qert” bi nav bikirana. Li Tarê keç bi piranî di navbera

16 û 19 saliya xwe de dibûn bûk. Dizanibû keç her roj li kesên wek Pîrên rast nedihatin. Ew mirovekî ronakbîr bû, malbata wî ji eşîra Kaşan Begê bû û ew ne tenê xwedan şehadeyên bilind, lê her weha xwediyê xanî û zeviyên bû. Lê li milê din, ew ditirsiya Pîran dû re li xwaztina wê poşman bibûya. Di çavên wê de mirina wê dê ji encameke weha pirr baştir bûya.

Lorînê ji xaltiya xwe tika kir ku ew jî bi wê û Pîrên re be, dema herdu bi hev re daniştin, lê Sarînê jê xwazt ku bila wêrek be û xwe “wek kukumekê” raber neke. Dû re soz dayê ku dê wan tenê bo bîstekê bi tenê bihêle û dû re dîsa li wan vegere.

Pîrên û Rêsin baştir dîtibûn li Otêl Alan bimînin. Dizanibûn girtina vê biryarê dê li xatirê Aramo bimaya û lewma lêborînê jê xwaztibûn. Bijartina Otêl Alan ne ji ber wê yekê bû ku ew otêleke nûjen bû û tê de kafêtêrya û bar hebûn, lê bi encama wê yekê bû ku herdu ji vegera li odayên xwe ditirsiyan, odayên li qatê jorîn yê Çayxaneyê Aramo ku wan tê de xewn û xeyalên seyr dîtibûn.

E’srê teng yê heman roja ku dê êvarê li mala Locên bibûna mêvan bû. Rasîn û Pîrên li kafêtêryaya otêlê daniştibûn. Rêsin di çav xwe re kir ku Pîran xemgîn e. Lê niherî û got:

– Malava, xêr e! Tu çima weha ketiye hev?

– Bi Xwedê ne hêsan e, lo! Ma ez ê ji Lorînê re çî bibêjim? Ez ê çawa hema rasterast jê bipirsim ka min dixwaze?

– Heyfa te! Weqa sal in tu li Ewropayê dimînî û hîn newêrî bi keçekê re bipeyivî!

– Axaftina bi keçên ewropayî re ne wek axaftina bi keçên tarî re dijwar e; û hîn bi ser de pirskirina derheqê zewacê de li dû du-sê hevdiştinên hema-hema bêyî axaftin!

– Çawa be guhertinê êdî li vir jî dest pê kiriye. Li Ewropayê jî berê wek Tarê bû. Hema çel-pênçeh salên din bide Tarê, li vir jî



xusetê xelkê dê were guhertin, heye ku bi qasî guhertina li welatên rojavayî di nav sedsalekê de cîh girtibû.

– Lê em vegerin Tara îroj. Tu dibêjî çawa baştir be? Ez çawa jê bipirsim?

– Tu ji min çêtir dizanî, bawer bike! Dema hûn bi hev re danîştin peyvên bedew û ligormebestê dê bi xwe wek ava rûbarê bi rê kevin.

Hema rasterast li dû rojava Dr. Roger herdu heval ji otêlê rakirin. Jina wî Sarîn berê li mala Mamoste Locanî bû û hema-hema tevahiya wê rojê, tev Lorînê û dota Locên Şanayê, keçeke hevdeh salî ya di pola 11emîn de, xwe bi amadekirina şivê ve mijûl kiribû.

Mamoste Locan rûkenok çû pêrgîna mêvanên xwe û ew birin odeya mêvanan. Pîran berê şermok û bêdeng bû, lê dirêj nekir hey li xwe kir û deriyê aliyê xwe yê şên û wêrek vekir. Peyan xwe bi axaftinê têkilî rewşa Tarê û ya cîhanê kiribûn dema Şana û Sarînê ketin hindir, dest dan mêvanan û ew haydarî amadebûna şivê kirin. Rasterast li dû wan Lorîn ket hindir. Bi xuyabûna wê re Pîran û Rêsin bêhemdên xwe û bi hev re rabûn ser xwe. Keçeke bejndirêje çeleng û rûkenok bû Lorîna nuha. Kirasekî morî dirêj li wê bû. Porê wê yê ji şevê tarîtir ji hev hatibû vereşandin û bi ser herdu milên wê de wek pêlên ava rûbareke berî li jêr hatibû xwarê. Çavên wê yên reşbelek dibişirîn. Bi dengê ji wan dengên jinên Tarê yên xweş got, “Hûn bi xêr hatin,” û dest da herdu mêvanan. Pîran nema wek kesekî ku ketibe hev xuya dikir. Bi germî dest da Lorînê û got, “Spas Lorîn, spas ji we hemiyar re ku we va fersenda da me.” Di cîh de li karhanîna peyva “fersend” poşman bû, lê xwe lê nekir xwedî. Rasîn ketibû bin bandora sihra çelengiya Lorînê û di kûraniya dilê wî de meroqeke wek zarokekî mirî ji dayê bûbe xwe xist nav hişên wî. Ew carê li derve zewicîbû û baş dizanibû ku ji bo wî zewaca bi Lorîneke ji Tarê re dê di vê jiyane de ne pêkan bûya. Dema ji bo zewacê amade bû ew û keçên tarî ji hev dûr bûn û nuha ku ew, heta li derve be jî, rastî keçine tarî dihat ku hinekan ji wan ê bikaribûna dilê wî bi firrînê xistana, dem êdî bi ser

ketibû. Li berevaciya hinek hevalên xwe, wî dê nikaribûya dest ji jina xwe berda da ku hêlînek ji xwe û keçeke tarî ya ji xwe biçûktir re ji nû ve ava bikira. Jina wî ya amerîkî jiyana xwe dabû wî, jê hez dikir, di ber wî de westiya bû, piştgiriya maf û amancên gelê wî dikir û sê zarokên hêja dabûnê. Çiqa dilê wî bi ser Lorînên Tarê de biqaqijiya jî, hêlîna wî carê hatibû çêkirin. Wî jî li dû Pîrên bi germî dest da Lorînê û bi meraq li rewşa wê û xizmên wê pirsî.

Li dû xwarina şîvê Locên pêşniyaz kir ku paşşîvê li derve bixwin. Li aliyê paşîn yê hewşa wî baxçeyekî biçûk hebû, li navendê hewzekî bo çivîkan hatî çêkirin hatibû danîn û îskemeyên textîn li wir hatibûn bicîhkirin. Dema Şanayê qehwe hanî tişteki ku kesek ne li bendê bû qewimî. Locên ji qîzan re got: “Şana qehewya Pîrên û Lorînê bibe bin dara hanê, bila li wir danişin. Bawer dikim dixwazin bi hev re bipeyivin.”

Vê gotina Locên heta bi Sarînê be mat hîşt, ne ji ber ku wê Locan wek kesekî kevnepereşt dihesiband, lê ji ber wê yekê çimkî ew bi xwe hîn tê de difikirî ka fersendeke weha ji bo her duyan çawa pêkan bike. Lorîn û Pîrên herdu jî bêyî ku hîn ji bo tişteki weha amade bin hatin girtin, lê Sarîn çû hawara wan û got: “Erê, erê, em ê herin li wî alî di bin dara han de danişin – min jî dixwazt li halê xwişkên Pîrên bipirsim.”

Li dû daniştina hersêyan li şûna nû, Sarînê berê li hal û rewşa xwişkên Pîrên pirsî, dû re got: “Kekê Pîran, ji bo malbata me serbilindî ye tu destê Lorînê bixwazî. Lê helbet hûn herdu bi xwe berî her kesî xwediyên biryarê ne. Ez ê we bi hev re bihêlim.” Dû re ji qîza xwe Şanayê re, ya ku nuha her weha li wir bû, got, “Were Şana, em herin hinek meylê amade bikin.”

Ji bo çar-pênc xulekan herdu jî bi tirs bûn. Lorînê dixwazt Pîran dest bi axaftinê bike û Pîran li peyv û hevokên ji bo mebestên guncav digeriya:

– Lorîn, bi rastî ez ji bo zewacê nehatibûm Tarê. Ya rast çî tevdêrên min û zewacê nebûn. Lê dema min tu cara yekem dîtî, te

digot qey ya ku ez tevahiya jiyana xwe li bendê bûm ji nişkan ve hat ber çavên min...

Herdu hevokên destpêkê piçek tirs û guman xistin dilê Lorînê, çimkî tirsîya dilê Pîrên bi wê şewitîbe û lewma wê dixwaze, lê dema hevoka dawîn bihîst gumanê xwe da aliyekî û rûyê wê ji şermê, di heman demê de ji ber hestên evîndariyê, sor û germ bû. Pîrên domand:

– Dixwazim tu bizanibî ku ez bi heft-heşt salan ji te mezintir im. Dema tu bibî pênceh salî min ê nêzikî li şêstî kiribe...

Li vir Lorînê bi ken got:

– Hele bila berê em bigihên wî u'mrî. Peyane şêst salî hene ku ji hinek jinên pênceh salî ciwantir xuya dikin. Lê, ma ne tu li Berfînê û ez li gundekî Tarê me!

– Ez ê vegerim. Tenê bibêje erê, ez ê di nav şeş mehan de vegerim. Min li wir ne mal e, ne malbat e. Çend meh divên bo agahdarkirina şûna kar û bo firotina çend tişt-miştên xwe. Ger te got erê, merî û dostên min ê destên te ji bavê te bixwazin û ger wî got erê, em ê bikaribin li dû şeş-heft mehan bizewicin. Te çawa xwazt em ê weha bikin, lê tenê daxwazeke min ji te heye, Lorîn: Mebêje erê, ger sed ji sedî ne bi dilê te be. Baş tê de bifikir û ger te xwazt, bersîva xwe bihêle sibê yan dusibe. Xweziya me bikaribûya hev û din baştir binasiya, lê wek tu dizanî erf û toreyên me li Tarê rê nadin hevdfîtina bi tenê.

– Ger tu min dixwazî bila ne ji ber wê yekê be ku dilê te bi min dişewite...

– Ma dilê min ê ji bo çî bi te bişewite? Ne her mêr layiqî te ye. Lorîn, li Tarê gotineke weha di navbera peyan û jinan de pirr kêr rasterast tê gotin, lê ez ji te re bibêjim: Ez ji te hez dikim. Çawa ku min tu dîtî min ji te hez kir, wek ciwanekî panzdeh salî dilê min ket te!

Kenekî sivik li ser lêvên Lorînê xuya kir, ku bexteweriya di dilê wê de çih girtî raber dikir. Wê bi çavên Pîrên ve niherî û got:

– Te jî bala min kişand dema çavên me li hev rast hatin. Dû re, dema te ez ji kêra brayê min xelas kirim, dilê min bi ser te de keliya, lê Tar azadiya jinê berbend dike û heta ger bixwaze jî nikare gotina ku rast dixwaze bike wîne ser zimên. Bersîva min erê ye. Ez xwe qencbext dibînim ku qedera me em rastî hev hanîn.

Dilê Pîrên bi germahiya evîndariyê tiji bû bû. Çavên Lorînê, dengê wê, delaliya wê, şêweya axaftina wê û ew atmosfêra taybet ya dema axaftina mêrekî bi keçeke rojhilatî re dihat holê, ew bi şahiyêke sihrî serxweş kiribûn. Hestên ji dilên wî dihatin der meraqek li nik wî bi rê xistin ku rabe ser xwe, Lorînê hambêz bike, xwe û wê di nav lehiya ramûsaneke evînê de bide helandin, lê hişên wî ew hestên ji dil wek rûbarekê bi rê ketibûn berbend kirin û hanîn bîra wî ku ew li mala Mamoste Locan e, ku erf û toreyên Tarê dê kiryareke weha wek zêdegaviyêke mêvanekî tolaz li mala mazûvanekî hêja bihesibanda; û heye ku Lorîn jî ji wî dilsar bikira! Wî hestên xwe di nav keserekê de helandin, li çavên Lorînê niherî û got:

– Lorîn, xweziya min bikaribûya hestên dilê xwe ji te re bi peyvên resen û bi şêweyêke vekirî aşkere bikirana. Bersîva te dilê min bi şadiyê tiji kir û siberoj di çavên min de rengîn kir. Ez ji te hez dikim û ez ê ta roja mirinê ji te hez bikim, û em ê bi hev re deriyê malbateke bextewer vekin û li Tarê bi hev re kal û pîr bibin. Qe nebe destê xwe bide min da ku ramûsim û ji te re spas bikim bo bersîva te. Te riya jiyana min bi wê bersîvê guhert û te ez ji siberojê di nav mij de li yeke bi hêviyên mezin dagirtî vegerandim.

Wî destê wê yê rastê rakir û ramûsaneke ji dil li ser çand. Peyvên Pîrên û ramûsana destê wê dilê Lorînê bi bexteweriyê mişt kir, lê wek keçeke wî warî ya ji binemaleke mezin baştir didît hestên xwe lîwan bike. Di aliyekî wê de beşekî wêrekî ku meraq dikir xwe wek

pepûleyekê bi ber bayê evîndariyê xe û bifirre hebû, lê wê Pîran baş nedinasî û nedizaniyê ka ew ê zûfirrîna pepûleyekê ji dilê keçeke vê herême wek şaneke bedew yan wek kiryareke bed têxe pîvanê. Peyvên bi dengê Pîrên xwe gîhandin guhên wê hestên di dil de weqa germ kirin ku alawiya ji wan hêstirên dilşadbûna wê ji çavan bi rê xistin. Hîn li bersîvekê digeriya Sarîn û Şanayê gihîştin wan û dirêj nekir her çar bi hev re li koma din vegeyan.

Bêyî Pîran û Lorînê devên xwe vekin hemiyan dizaniyên ku bersîv erênî bû. Tenê kurê Locên yê ciwan hay ji tevahiya vê pîrsê nebû. Dilê Sarînê zilxitek xwazt, lê dizaniyê ku berî gihîştina amancê hîn çiyayekî din li pêş bû: Razîkirina bavê Lorînê Moroyê Medo. Wê dest da Rêsin, rûyê xwarziya xwe maç kir û tenê got, “Pîroz be, Xwedê ya xêrê bike.” Rasîn jî hat rûyê Pîrên, ew bi germî pîroz kir û dû re dest da Lorînê. Mamoste Locan, Dr. Roger û Şana’yê, wan jî rûyê Lorînê ramûsan û dest dan Pîrên.

\*\*\*

Roja çûna Pîrên û Rêsin nêzik bû û divabû tevde ra xwazgîniya Lorînê bihata kirin. Dema Rasîn derbarê vê pîrsê de bi Mamoste Locanî re peyivî, wî got, “Baştir e em zû nekin.” Pêşniyaziya wî Pîran piçekî veciniqand, çimkî dema wî û Rêsin hindik mabû û divabû vegeyana ser karên xwe.

Mamoste Locan ne ligel wê yekê bû ku xwazgîncî weqa zû biçûna xwaztina Lorînê. Wî kiryareke weha ji “usûlê der” dît û pêşniyaz kir ku bila bi kêmasî sê meh di navberê ketana, berî ranana gava ji bo nîşankirina wê ji Pîrên re. Rêsin dîtina wî sed ji sedî di cîh de dît. Dema Pîran bi kûranî tê de ponijî, wî jî mentîqa di pêşniyaziya

Locên de dît. Hem wî, hem Rêsin pejirandin ku bi encama dûrbûna ji Tarê wan hinek şert û mercên civakî yên xelkê xwe ji bîr kiribûn.

Dema brayên Pîrên bo xatirxwaztinê hatin bajarê Tarê, Pîrên herdu birin mala Mamoste Locanî û hemiyar li hev kirin ku li dû sê mehan bi hev re wek xwazgîncî biçin mala Moroyê Medo. Pîrên Lorîn, xaltiya wê û mêrê wê jî derbarê vê yekê de agahdar kirin û hemiyar pejirandin vê pirsê nehênî bihêlin ta roja xwaztina destê Lorînê.

Êvara dawîn li Tarê Pîran û Rêsin çûn mala Mamoste Locanî û xatir ji wî û endamên malbata wî xwaztin. Bi germî ji wan re spas kirin ji bo dilsozî û mêvanhejiya wan. Berî ji hindir derkevin Pîran û Lorînê dora nîv saetekê di hewşa malê de bi hev re danîştin, li ser rojên li pêş peyivîn û li hev kirin ku bi rêya Mamoste Locanî nameyan ji hev re bişînin, derbarê tevdêrên daweta wan û bicîhbûna li bajarê Tarê de. Lorîn hîn ditirsiya ku bersîva bavê wê nerênî be, lê Pîrên bêhna wê fireh kir û dîsa da zanîn ku Mamoste Locanî û brayên wî, her weha birayê Rêsin yê mezin, soz dabûn ku dê her tiştê ji dest dihat bikirana, û li nik wan guman tunebû ku bersîv dê erênî bûya. Birayekî wî heta gotibû, “Xwedê hûn ji bo hev dane, hûn herdu jî layiqe hev in.” Vê gotinê rûbareke bi ava şadiyê dagirtî ji dilê Lorînê gîhand hişên wê. Li dawiya vê hevdiîtinê herduyan hev hembêz kirin û aliyên rûyên hev maç kirin. Bêguman dilê Pîrên dixwazt wê bi germahiyeke ligor evîna di dilê wî de dikeliya hembêz bike û ramûsaneke lêvîne germ li ser lêvên wê yên bedew mohr bike, lê xwe ragirt, ji bo xatirê rêzgirtina ji toreyên Tarê re û bi encama tîrsa ku kiriyareke weha bi Lorînê ve guncav nehêt dîtîn. Wê jî dixwazt wî bi germî hembêz bike, lê ji bo xatirê rêza ji erfên malbatî re û ji ber tîrsa ku îcar Pîran kiriyareke weha di cîh de nebîne weha nekir. Dema her duyan dû re li pêş çavên yên din bo cara dawîn dest dan hev hêstir ji çavên Lorînê hatin xwarê û yên Pîrên şil bûn. Te digot qey hev û din bi salan dinasîn û dê ji nişkan ve bo demekê ji hev veqetiyana.

Roja din herdu heval di heman otobûsa ew pê hatibûn Tarê de bi rê ketin, da ku ji bajarê mezin bi firrokê vegerin warên ew lê

diman. Li rawestgeha otobûsan dora bîst û pênc kesan bo xatirxwaztina ji wan gihîştibûn hev: Mamoste Locan, Dr. Roger, Aramo, Rîso, Çeçanê Remo, Kamoyê Çînoyê Deştî, du brayên Pîrên, brayek û sê kurmamên Rêsîn û dostine wan.

Rasîn ji demên xatirxwaztinê gellekî nerehet dibû. Nîvê wî ji bo Tarê û tariyan digiriya û dixwazt bi wan re bimîne, lê çavên nîvê din ji wî li warê wî yê din bûn. Wek kes, ew di demên weha de ji hev diçirriya û bi encamê janeke kûr di hîmê hebûna xwe de hest dikir, janeke hindirîn ya wûjdanî ku bi rojan, carina bi hefteyan, didomand ta ku rojekê rotîna ew li Amerîka di nav de ew jê bi dûr dixist.

Otobus bi rê ket. Giyanên herdu hevalan tê de bûn, lê ji her yekî beşek di nav koma li dû wan mayî de ma. Dora nîv saetekê deng bi herduyan neket. Ew dema ku wan li Tarê derbas kiribû di serên wan de bû bû wek xewnekê, xewneke ku wan ê ne tenê ta roja mirinê ji bîr nekirana, lê dê di siberoja wan de bibûya xwedîya roleke grîng û mezin.

18

## DESTPÊK

Bihareke xweş bû û di nîvê duyemîn yê vê roja îniyê de bi hezaran kes li Baçxeyê Ronahiyê bûn. Li beşekî bêxçe komên mirovan li dor kesên ku derbarê mijaran de dipeyivîn kom bû bûn. Ciwanekî endamên koma li dor xwe derbarê hawîrdorê de agahdar dikirin. Yekî ji wî wê de derbarê xwepewerdekirana ramyarî de diaxaft. Peyayek li ser felsefeya Sartre dipeyivî, yekî din beşine ji berhema

151

Xanî, *Mem û Zîn*, bi şêweyeke şanoyî dixwend, jinekê girtina tevdêrên malbatî û kêmkirina zaroyan pêşniyaz dikir... Koma herî mezin li dor peyayekî bi por û rîhên spî kom bû bû. Temenê wî li ser 60 salan bû, porê wî xwe digîhand milan û rîhên wî bi qasî bihustekê dirêj bûn.

Pîran, Lorîn û her sê zarokên xwe jî îroj li Baxçeyê Ronahiyê derketibûn seyranê. Ji zarokên wan ya mezin, Lora, çardeh salîn bû. Ew 6 salan li dû zewaca her duyan ji day bû bû. Brayê wê Kaşan yanzdeh salîn bû û xwişka wan ya biçûk Zeryan heft salîn. Lorîn hîn jî çeleng û lihevhatî bû. Li berevaciya hinek jinên Tarê, ku li dû hanîna du-sê zaroyan qelew dibûn, ew hîn bejnzirav û rûciwan mabû. Her pênc bi hev re dimeşiyan dema li Mamoste Locan û Aramo rast hatin. Herdu jî êdî pîr bû bûn. Hemiyar dest dan hev, li halên hev pirsîn û bi hev re ber bi koma herî mezin ji koman ve meşiyar.

Pîranê ku nuha serdarê Zanîngeha Azad ya Bajarê Evînê bû Pîremêrdê li Baxçeyê Ronahiyê dipeyivî dinasî. Pîremêrî li herêmê wek zanyarekî mezin deng dabû. Mamoste Locan û Aramo, tevî ku ew bi nav dinasîn jî, ev yekemîn car bû wan ew didîtin û dengê wî dibihîstin. Navê pîremêrî wek Pîrê Zanyar belav bû bû. Di van demên dawîn de Zanîngeha Azad karekî beşdemî di şaxê felsefeyê de dabû wî û mala wî nuha li avahiya bicîhkirina mamosteyan bû. Rojên îniyê dihat Baxçeyê Ronahiyê û her carê derbarê pirseke civatî, felsefeyî yan olî de dipeyivî. Berî bîst salan toleransa ji bo raman û felsefeyên ku îroj li Baxçeyê Ronahiyê aşkere dihatin ragîhandin nebû, lê dem nema ya berê bû. Bajarê Tarê êdî bû bû Warê Evînê. Ew û tevahiya Tara ku nuha ji aliyê hevweletiyên wê ve wek War dihat binavkirin ber bi guhertinê ve di rê de bûn. Ne şêxan, ne serokên rêxistinên, ne jî dewletê dikaribûn wek berê hinekan ji wan weqa bi hêsanî bo xwe bikin mirîd û robot û berdest. Mirovên warî êdî bi piranî xwediyên hêza ponijandinê û ramyariyê bûn, zû bi zû nedihatî mêtîşuştin û xapandin. Ew li xwe, çanda pêşiyar û siberoya welatê xwe xwedî derdiketin, berjewendiyar giştî ya siberoya Warê û wariyan didan ser hemî berjewendiyar. Nakokî di nav wan de kêmbû bû, rêzgirtina ji hev



û din re zêde bû bû, û wan meraq li jiyaneke bi şaristanî dikir. Jê bêtir, Wariyan nuha ne tenê bi zimanê xwe dipeyvîn, lê her weha pê dixwendin û dinivîsandin.

Dema hinekên ji koma li dor Pîrê Zanyar Mamoste Locan û Pîrên di nav xwe de dîtin, bi rêz şûn dan wan û yên bi wan re. Pîrê Zanyar jî mêvanên nû gihîştinî di çav xwe re kirin, bi livandina destê rastê û serîhejandinê pêşwazî li wan kir û weha domand:

*Min got, kesê ku rêzê ji xwe re negire nikare bi şêweyêke rêkûpêk bo yên din rêzgir be. Di heman demê de, mirovê rêzê ji xwe re negire maf niye ji yên din bipê ku bo wî rêzdar bin. Derbarê malbatekê de heman gotin di cîh de ye. Derbarê civatekê de jî heman gotin di cîh de ye. Derbarê neteweyekê de jî heman gotin durist e.*

*Birêzan! Di beşê duyemîn yê gotara îroj de ez ê bi kurtî derbarê mirovan û behuştê de bipeyvim.*

*Ji hezaran sal û vir ve ye ku mirov meraqê li behuştê dike. Ji destpêka hebûna mirovî û vir ve ye ku şev û roj, jiyana û mirin, behuşt û dogeh hebûne. Çawa ku ronahî bêtî tarîti beşekî mezin ji xwebêja xwe wenda dike, behuşt jî bêtî dogehê wateya xwe wenda dike. Em ji bîr nekin ku jiyana bi xwe dikare behuşt yan dogeh be. Mixabin piraniya mirovan behuştê wek war û rewşeke amade çaverê dikin. Mirovê bijarte yê têgihîştî, li milê din, xwe bi xwe dixwe nav behuştê. Heye ku hinek ji we hêjayan bi vê gotinê weha texmîn bikin ku van mirovên bijarte di jiyana xwe de serkeftî bin, dewlemend bin û di koşkan de niştecîh bin. Dewlemendî û koşkên mezin û bedew behuştê bi xwe re nahînin. Behuşt ber her tiştî di nav hiş û dilê mirovî de ye. Tenê divêt ji dest mirov bihêt ber ku deriyê wê bibîne. Behuşt ne bi dewlemendbûnê ye, ne jî bi hêzdarîyê ve girêdayî ye. Behuşt bi hestên mirov ve girêdayî ye. Mirovê bikaribe di nav dil û hişên xwe de xwe bextewer û dilşad hest bike û ji jiyana xwe razî be, mirovê bikaribe xwe ji rik û girrê azad bike û ji mirovan hej bike, ew mirova dikare xwe bigihîne wê*

*behušta hindirîn. Tenê ew behušta ye ku didomîne. Yên din xeyalî ne, demdemî ne û dirêj nake gellekan ji şanên behuştî wenda dikin.*

*Bawermendên bi behušta li dû mirinê, li milê din, nimêjê dikin, rojiyê digirin, zekatê didin, diherin serîlêdana şûnên pîroz, diçin mizgeftan û dêran, bi hêviya ku li dû mirinê ji nû ve bihên vejandin û têkevin behuştê. Lê qe nebe beşek ji wan bi xwe dikenin û bi Yezdanê Mezin re ne dilsoz in, çimkî ew bo cîhana xwe û mirovên lê ne rêzgir in, derewan dikin, diziyê dikin, û dilên wan bi rik û nefretê dagirtî ne. Yezdanê Mezin bi amanca ku mirov ji hev û din re rêzgir û rind bin pêxember rêkirine, ne ku ji bo ew roj bi roj biqîrin: “Bijî Xwedê.” Yezdan pêdivî bi wê niye, çimkî bi xwe dizane ew yê nemir û yê mezintir e. Van kesan di nav gola têngîhîştinê de û bi encama xasûkiya xwe, bi zanibûn yan bêzanibûn, wê bizavê dikin ku li Xwedê jî dek û dolaban bikin. Çawa endamên hinek civatan di dîroka xwe de bi encama tîrsa ji serdar û padîşahên stemkar dest û lingên wan ramûsane, dûrîşmên pesindana wan hanîne ser zimên, li ber wan geriyane û carine li ber lingên wan tobe kirine, bi amanca ku serdar û padîşah wan bibexşînin yan ji wan re rind bin, wisa jî hinek dixwazin heman kiryaran ji Xwedê re bikin, wekî ku padîşahêkî stemkar be. Lê haşa ji Yezdên re! Ew ne li benda pesindan û destramûsana mirovan e, çimkî ji amanceke weha bêrûmet gellekî mezintir û hêjatir e. Ji bo Xudayê dilovan grîngtirîn kiryara ew ji mirovan dipê ew e ku ji hev û din re qenc bin, bo hev û din û bo cîhana xwe çakmebest bin.*

*Hêjano! Tevahiya gerdûna em tê de li ser hîmê mentiqê hatiye damezirandin. Yezdanê Mezin ji bo jiyane rêzgir e û lewma mirovê ji bo jiyane rêz nebe naxe behuştê, ne behušta rasteqîne ya dema jiyane, ne jî ya li dû mirinê. Yezdanê gewre afîrmendê her mirovî ye, û ger va ramana wek mentiqê bihêt pejirandin, wê demê kujtina mirovekî yan mirovekê kiryareke li dij Afîrmendî ye, ziyangîhandina amancên Wî ye û neheqîkirina li Afîrmend bi xwe ye. Lewma di behušta Yezdanî de şûn bo kesê kujer niye.*

*Bi dîtina min, mirovê bilind û bijarte pêdivî bi îmam û keşe û rêberên olî niye. Mirovê bilind û bijarte dikare rik û nefretê ji dilê*

xwe derîne û rindiyê û nerindiyê ji hev veqetîne. Mirovê bilind û bijarte nakuje, nadize, ziyane nagihîne mirovahiyê û xweristê, neheqiyê nake û her wê bizavê dike ku wek mêvanê ser vî erdî jê re rêzgir be. Bi encamê mirovekî weha dikare xwe hem li vê cîhanê di nav behuştê de hest bike û hem xwe bike layiqê behušta li dû mirinê, çimkî di kûraniya hebûna xwe de bi xwe bawer e, aram e, ji jiyana û cîhana xwe hej dike û ziyane nagihîne kesekî. Mirovê bilind û bijarte dikare dema bixwaze peywendiyê rasterast bi Xwedê re jî deyne û jê re spasdar be, heta bêyî ku lingê xwe bi mizgeft û dêr û perestgehan bike, heta bêyî ku îmamekî, keşeyekî yan oldperestekî binase. Mirovekî weha di çavên Xwedê de ji îmam û keşe û rêberên olan yên nedurist mezintir e.

Ji bo kesê ku ne xwediyê şanên mirovê bilind û bijarte ye, heye ku oldarî ji neoldariyê baştir be. Bêyî ol, bi taybetî di warekî bêqanûn û bêasayiş de, kesê weha rêya rast û ya şaş ji hev dernaxe; yan derdixe, lê bêyî tirsê ji Xwedê û zora li ser erdê xwedî li rêya durist dernakeve, û bi encamê dibe kelemek di nav civatê de. Civatên ku kesên weha tê de pîrr in xwe dikin layiqê karbidestiya desthelatdarên stemkar, çimkî ew wan bi raberkirina serê çû û di nav tirsê de dikin rêzgirên ji rê û qanûnên xwe re. Ji bo mirovê ku nikare xwe bi xwe rindiyê û nerindiyê ji hev derîne, yan nikare xwe bi xwe peywendiyê bi Afirmend re deyne, çûna perestgehê û nimêjkirina li dû rêberên olan çêtir e, lê tenê ger ew rêberan rast di rêya Xwedê de bin û rast bo berjewendiya mirovahiyê kar û xebatê bikin. Rêber, oldar dibin yan ne, ger agirê hevrikiyê û hevkujtinê di nav mirovan de gurr bikin, ew bi encama van kiryanan mirovan dixin nav dojeha dema jiyana wan û di heman demê de dojeha li dû mirinê bo xwe û yên didin dû wan misoger dikin. Mentiq vê encamê diyar dike, çimkî Yezdanê mezin rindiyê ji mirovê hêvî dike, qencyê li ser erdê dixwaze, ji aramiyê, çakiyê û aştîyê re rêzgir e.

Behušta me di nav dil û hişên me de ye, di mala me de ye, li warê me ye, lê bi şertê ku em bikaribin wê bibînin, xwedî lê derkevin û biparêzin. Ger em ne layiqên behuştê bin, em ê warê xwe bikin dojeha xwe. Dema War bû dojeh, em ê tê de bişewitin.

*Hinek ji me heye ku birevin û weha texmîn bikin ku behuşteke amadekirî dê li şûneke din hebêt, lê ew wê behušta amade û herdemî li çi şûnan nabînin. Bo me behušta ku tevahiya jiyana me bidomîne û ji yên li dû me re bimîne War e. Ger tu rast behuşte meraq dikî wê berê di xwe de bibîne, dû re di mala xwe de û dû re li warê xwe. Dema te ew di xwe de, di mala xwe de û li warê xwe dît, deriyê behušta li dû mirinê jî dê ji bo te li ser piştê vekirî be...*

Li dû kutabûna axaftina Pîrê Zanyar hinekan ji beşdaran nêzikî lê kirin, da ku pirsiyarekê jê bipirsin yan spasdarî û rêza xwe jê re ragihînin. Mamoste Locan, Aramo, Pîran û Lorîn jî çûn û dest dan wî. Çavên kalê bi dîtina Mamoste Locanî re kenîyan û şil bûn, wekî ku bi dîtina dostekî kevn li dû gellek salên hevwendakirinê dilşad, û di heman demê de bi encama hestên germ kelgirî, bûbe. Mamoste Locan jê tika kir ku yekşemê êvarê bibe mêvanê wî. Pîrê Zanyar va yeka bi kêfxweşî pejirand. Got, “Bêguman serokê zanîngeha me Dr. Pîranê hêja jî dê bi me re be.” Mamoste Locan got, “Bêguman! Her weha Lorîn, Dr. Roger û Aramo jî.”

Wê êvarê Mamoste Locan nikaribû rakeve. Her ew pîremerdê hêja yê bi por û rîhên spî li ber çavên xwe didît û rojên salên li paş manî bi bîr dihanîn. Li dû dîtina Pîrê Zanyar û bihîstina dengê wî li Baxçeyê Ronahiyê, bêhemdê xwe di cîh de weha hest kiribû ku ew wî dinase. Dû re li helwesta xwe ketibû gumanê, lê dema dest dabûyê, bejna wî ji nêzik ve dabû pêş çavên xwe û ji nêzik ve baş guh dabû dengê wî, hêdî-hêdî di nav kûraniya hişên xwe de hest kiribû ku wî bêguman va mirova berê di jiyana xwe de dîtiye û bihîstiye, lê kî bû, ji ku bû û kengê dîtibû! Wê êvarê ew hîn di kîbûna wî de diponijî û vê yekê xew ji çavên wî dizibû. Ji nişkan ve gola bîrhanînê vebû û wî tê derxist! Wêneyeke kevn xwe di nav hişên wî de raber kir, wêneyeke ku ew bi kêmasî bîst salan bi paş ve vegerand. Hindik mabû bi encama vê yekê ji kêfxweşiya xwe bifirre, yan ji ber matmayînê biqîre, lê xwe ragirt. Lêdana dilê wî bi encamê bezatir bû û tirsiya ji xwe biçe. Rabû ser xwe, piyalek ava sar vexwar û bi dengê qebe gote xwe: “Wey lo! Li ku mabû va kalê delal van salên dûr û dirêj?!” Bi meraq û kelecana ji xwe dipirsî, gelo wî li ku xwe weha perwerde kiribû; çawa dikaribû xwe

ji malbata xwe, meriyên xwe û ji dostan demeke dirêj veşartî bihêle, û çito ji dest hatibû bi nav û kesayetiyê nû, bêyî kesekî pê bihesîne, xwe li Warê Evînê bi cîh bike! Nikribû têbigihîştta çawa vî mirovê nerxibînd xwe ji Melleyekî gundî wergerandibû filosofekî zanyar!

Mamoste Locan sond xwar ku dê kîbûna Pîrê Zanyar ta roja mirinê di dilê xwe de veşartî bihêle û dê vê dîtina xwe çî caran ji kesekî re aşker neke. Lê di kûraniya dilê wî de meraqekê xwe livand: ku rojekê di navbera xwe û wî de jê tika bike bila wî bi xwe re vegeêne êvara wî tê de xatir ji Lehengî xwazt. Ew nuha di kûraniya dilê xwe de dikeniya. Tar êdî dibû War û bajarê Tarê bû bû Warê Evînê. Wî germahiya bexteweriyê di nav dil û hişên xwe de hest kir û ket xeweke xweş û aram.